



**ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**DI SALÊN 1980-2000AN DE LI TIRKÎYEYÊ REWŞA ZIMAN Û EDEBÎYATA
KURDÎ Û TÊKILÎYA WAN LI GEL TEVGERÊN CIVAKÎ YÊN KURDAN**

TEZA LÎSANS A BİLIND

Mulazim ÖZCAN

WAN-2018

**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**1980-2000 YILLARINDA TÜRKİYE'DE KÜRTÇE DİL VE EDEBİYATININ
DURUMU VE KÜRT TOPLUMSAL HAREKETLERLE İLİŞKİSİ**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Mulazım ÖZCAN

14950001058

DANIŞMAN

Doç. Dr. Kemal EROL

VAN-2018

PEJIRANDIN Û PESENDKIRIN

JI RÊVEBERIYA ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ YA ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ RE

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

Serok :.....

Endam :

Endam :

Endam :

Endam :

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn, yên endamên perwerdeyê yên navborî ne.

Îmze

.....

Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav

Rêveberê Enstîtûyê

Mohr

ETİK BEYAN

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi,
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu

bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Mulazım ÖZCAN
Şubat 2018

**DI SALÊN 1980-2000AN DE LI TIRKÎYEYÊ REWŞA ZIMAN Û
EDEBÎYATA KURDÎ Û TÊKILÎYA WAN LI GEL TEVGERÊN CIVAKÎ
YÊN KURDAN**

KURTE

Kar û xebatên nûjen ên rewşenbîrîya Kurdî di salên destpêkê yên sedsala 20an de dest pê kirine. Ev xebatên li ser ziman, edebîyat, çand û hunera Kurdî yên li bakur û Tirkîyeyê ên sedsala 20an mirov dikare wekî sê serdeman destnîşan bike. Yekem ji serê sedsala 20an heta belavbûna dewleta Osmanî, duyem ji salên 1960an heta salên 1980yan, sêyem jî ji salên 1980 heta salên 2000an. Çarçoveya vê mijarê bi taybetî serdema 1980-2000an xebatên ziman û çanda Kurdî yên li bakur û Tirkîyeyê ne, lê belê ji bo ku esasê mijarê baş bê fêmkirin bi giştî hemû berhem û xebatên sedsala 20an dihewîne.

Li ser pêşketinên fikr û daxwazên neteweperwerî û avabûna netewedewletên nû li cîhanê, Kurd jî dikevin nav lêgerîneke sîyasî û neteweyî. Di sala 1898an de cara pêşîn rojnameyeke Kurdî bi navê *Kurdistan* ji aliyê Kurdan ve tê derxistin. Piştî Meşrûtîyeta IIyan gelek dem û dezgehên sîyasî û çandî ji aliyê Kurdan ve li Stenbolê tên avakirin. Xebat û berhemên nûjen yên çand û hunera Kurdî jî di vê demê de di gel lêgerînên Kurdan ên sîyasî dest pê dikin.

Helbet ev pêvajoyê zêde nadomîne. Piştî ku dewleta Osmanî têk diçe pergala rewşa Kurdan jî yekcar ser û bin dibe. Ew rewşenbîr û sîyasetmedarên ku bi giştî li Stanbolê, kom bibûn derbasî Sûrîye û Iraqê dibin. Ew xebatên ku li Stenbolê rawestîyabûn careke din li navendên wekî Şam, Bexda û Silêmanîyê tên destpêkirin. Li Şamê li derdora kovara *Hawarê*, li Silêmanîyê jî li derdora kovara *Jiyannewe* û *Zarî Kurdistan* du gavên bingehîn yên çand û edebîyata Kurdî tên avêtin û gelek xebatên hêja tên kirin.

Li bakur û Tirkîyeyê jî destpêka damezrandina komarê de zexteke giran li ser Kurdan tê meşandin. Heta salên 1960an tu xebat û çalakîyeke nûjen ya çandî û hunerî ji aliyê Kurdan ve nikare bê kirin. Ji sala 1965an şûn de di nav xwendayên Kurd de lêgerînek dest pê dike û hin xebat û çalakî tên bipêşxistin. Di sala 1971an de derbeya leşgerî çêdibe ev xebatên Kurdan bi giştî tên rawestandin.

Di vê serdemê de ji aliyê xebatên çandî û rewşenbîrîyê de mirov ji xeynê çend nimûneyan rastî tiştek nayê.

Di salên navbera 1975 û 1980an de gelek weşanên wekî kovar û rojname ji aliyên van kom û tevgeran ve tên derxistin. Di van weşanan de hin nivîs û berhemên çandî edebî jî derdiçin û her wekî din jî hin berhemên edebîyata Kurdî jî di van salan de di bergeha van xebat û lebatan de tên çapkirin.

Piştî derbeya leşgerî ya sala 1980yan li ser ziman û çanda Kurdî qedexe û zexteke giran tê meşandin. Di vê pêvajoyê de heta sala 1991an li nav sînorên Tirkîyeyê tu berhem an jî weşanek Kurdî nikare bê derxistin. Ji sala 1991an û pê ve hin guherînên sîyasî û qanûnî pêk tên, hebûna Kurdan bi rengekî tê qebûlkirin û li Tirkîyeyê pêvajoyeke nû dest pê dibe.

Di vê qonaxê de heta ku rewşa sîyaseta Tirkîyê hinek diguhere û qedexeya li ser Kurdî tê rakirin bi awayekî legal çend kovar ji aliyê Kurdan ve tên derxistin.

Di vê serdemê de ji sala 1992yan pê ve pêşî li Stenbolê hin sazîyên çand û hunera Kurdî tên avakirin. Di berdewama pêvajoyê de gelek xebat û çalakîyên Kurdan ên çandî, hunerî û sîyasî tên bi pêşxistin. Piştî salên 2000an û şûnde êdî li gelek deveran sazî vedibin û weşanên Kurdî zêdetir dibin û televîzyonên Kurdî vedibin û gelek komên, şano û mûzîka Kurdî derdikevin.

Lê di gel hemû xebat û pêşketinan rewşa ziman û çanda Kurdî li bakur û Tirkîyeyê hê jî dîyar nîn e û çand û zimanê Kurdî ji aliyê qanûnî û sîyasî ve hê jî xwedîyê statûyek nîn e.

Peyvên Sereke :

Sedsala 20an, Kurd, Bakur, Tirkîye, Kurdî, Ziman, Weşan, Çapkirin, Berhem, Sazî, Sîyaseta Kurdî

1980-2000 YILLARINDA TÜRKİYE'DE KÜRTÇE DİL VE EDEBİYATININ DURUMU VE KÜRT TOPLUMSAL HAREKETLERLE İLİŞKİSİ

ÖZET

Kürt modern aydınlanma süreci ve çalışmaları 20. yüzyılın başlarında başlamıştır. Bu aydınlanma sürecinde kuzeyde ve Türkiye’de dil, kültür ve edebiyatla ilgili yapılan çalışmaları üç dönem olarak belirlemek mümkündür. Birinci dönemi 20. yüzyılın başından Osmanlı İmparatorluğu’nun dağılmasına kadar, ikinci dönemi 1960 yılından 1980 yılına kadar, üçüncü dönemi de 1980 yılından 2000’li yıllara kadar.

Bu çalışmanın çerçevesi özellikle 1980-2000 dönemidir. Fakat konunun anlam ve içeriğinin daha iyi anlaşılması için genelde 20. yüzyılda ortaya çıkmış bütün çalışma ve eserlerini kapsamaktadır.

Dünyada gelişen ulusal talepler ve kurulan ulusal devletler sürecinde Kürtler de siyasal ve ulusal bir arayış içine girerler. İlk defa 1898 yılında Kürtler tarafından *Kürdistan* isimli bir Kürtçe gazete çıkarılır. II. Meşrutiyet’ten sonra bir çok siyasal ve kültürel kurum kuruluş Kürtler tarafından açılır.

Kürtlerin ilk modern kültür ve sanat çalışmaları ve eserleri de bu dönemde bu siyasal ve ulusal arayışlarıyla ortaya çıkmaya başlar. Ancak bu süreç fazla devam etmez. Osmanlı Devletinin yıkılışıyla birlikte Kürtlerin de zaten iyi olmayan durumları ve düzenleri alt üst olur. İstanbul’da toplanmış olan bu Kürt aydın ve siyasetçileri de büyük çoğunluğu Suriye ve Irak’a geçerler. İstanbul’da ortadan kaldırılan çalışmalar Şam, Bağdat ve Süleymaniye gibi merkezlerde yeniden başlar.

Kuzeyde ve Türkiye’de Cumhuriyetin kuruluşundan itibaren Kürtler üzerinde ağır baskılar yürütülür. 1960 yıllarına gelinceye kadar Kürtler tarafından modern anlamda hiçbir kültürel ve sanatsal çalışma ve etkinlik yapılamaz. 1965’lerden sonra Kürt okumuşları ve aydınları içinde bir arayış süreci başlar, çalışmaları gelişir. 1971’de Türkiye’de askeri darbe olur ve Kürtlerin bu çaba ve çalışmaları tekrar durmak zorunda kalır. Bu süreçte de birkaç numune dışında Kürtler adına herhangi bir çalışmayla karşılaşmak mümkün değildir.

1975-1980 yılları arasında birçok Kürt siyasi grup ve hareketler ortaya çıkar ve birçok dergi ve gazete bu Kürt grup ve hareketler tarafından çıkarılır. Bu yayınlarda kimi zaman bazı Kürtçe yazı ve eserler de yayınlanır ve ayrıca bu çalışmalarla beraber Kürt edebiyatının bazı eserleri de yayınlanır.

1980 askeri darbesinden sonra Kürt dil ve kültürü üzerinde ağır bir baskı ve yasaklamalar yürütülür. Bu süreçte 1991 yılına kadar Türkiye sınırları içerisinde hiçbir Kürtçe yayının yayınlanmasına izin verilmez. 1991 yılından sonra bazı siyasal ve kanuni değişimlerin gerçekleşmesiyle beraber Türkiye’de Kürt varlığı da bir biçimde kabul edilmiş olur. Bundan sonra Türkiye’de yeni bir süreç başlar.

Bu yıllarda Türkiye siyasetinin biraz demokratikleşme yolunda değişmesiyle birlikte Kürtçe üzerindeki yasağın kalkmasına kadar Kürtler tarafından birkaç dergi çıkarılır. Bu süreçte 1992 yılından itibaren önce İstanbul’da olmak üzere bazı Kürt kültürel ve sanatsal ve siyasi kurumlar legal bir şekilde kurulur. Yine bu süreçte Kürtler tarafından birçok kültürel, sanatsal ve siyasal çalışma geliştirilir. 2000’li yıllardan itibaren artık birçok yerde Kürt kurum ve kuruluşları kurulur, Kürtçe televizyonlar açılır ve Kürtçe basın yayında önemli bir artış gösterir.

Ancak tüm bu çalışma ve gelişmelerle beraber Kürtçe dil ve kültürünün durumu ve akibeti henüz Türkiye’de belirgin değildir ve Kürtçe kanuni açıdan halen de bir statüye ve güvenceye sahip değildir.

Anahtar Kelimeler :

20. Yüzyıl, Kürtler , Türkiye’de Kürtler, Kürtçe, Dil, Basın. Yayın, Eserler, Kurumlar, Kürt Siyaseti.

**THE SITUATION OF KURDISH LANGUAGE AND LITERATURE AND ITS
RELATIONS WITH KURDISH SOCIAL MOVEMENTS IN TURKEY
BETWEEN 1980-2000**

ABSTRACT

The modern process of Kurdish enlightenment and studies towards it has been started at twentieth century. In this process, both in north and in Turkey there has been studies about language, culture and literature which can possibly be identified as three different periods. The first period is from the beginning of twentieth century until the collapse of Ottoman, the second period is from 1960 to 1980 and the third one is from 1980 to 2000.

The main point of this study is especially 1980-2000 period. However, in order to provide an understanding about the content of the subject, all the works that has been emerged in the twentieth century are included. In the period of the developments of national demands and established national states, Kurds have also started to search their political and national rights. First in 1989, a newspaper named Kurdistan has been published by Kurds, it was written all in Kurdish. After the II. Constitutionalism, a lot of political and cultural institutions have been established by Kurdish people. The first study of modern culture and arts of Kurds has started in this period in which Kurdish people were in search of their political and national rights. However this period did not last much. Along with the Ottoman collapse, the situation of Kurdish people has been worsened. Most of the Kurdish politicians that are gathered in Istanbul have moved to Syria and Iraq. Those studies that were removed from Istanbul, has been started again in Sam, Baghdad and Sulaymaniyah. Since the establishment of Republic, the heavy pressure on Kurdish people have risen both in north and in Turkey. Until the year of 1860, Kurdish people could not set up any activity or modern work in terms of culture and art. After the year of 1965, a search process has been started by Kurdish liberals, and their works developed. In 1971 a military coup happened and Kurdish people become forced to stop the

campaign again. Besides a few samples, it is impossible to encounter Kurdish arts or works from that period.

In the years of 1975-1980, a lot of Kurdish political groups and movements arised and a lot of magazines and newspapers have been written by these Kurdish groups and movements. In this publications there has been some Kurdish arts and works published too and along with this works, some arts of Kurdish literature have also been published.

After the military coup in 1980, Kurdish language and culture has been forbidden as well as a heavy pressure has been adapted to it. In this process until the year of 1991, there has not been any permission of Kurdish publication within the borders of Turkey.

After the 1991 there has been some changes in terms of politics and law. Along with that, the existence of Kurdish people has been accepted by the Turkish government. After this, a new process has been started. In these years Turkish policy has been changed which resulted in the forbids in Kurdish language removed and Kurdish people have again started with Kurdish magazines.

In this process, after the year of 1922 there has been first in Istanbul cultural, political and art institutions legally established. Again in this process there has been a lot of cultural, art and political works developed by Kurdish people. After the year of 2000, Kurdish institutions arised everywhere and Kurdish television and media started to show up and become important part of the publication. However despite all the works and improvements that has been done in Turkey the situation of Kurdish people are still not clear. In addition to that, Kurdish language has still not got its statue and security from the angle of legal. Today this process barely continues in Turkey.

Key Words: 20th century, The Kurds, The Kurds in Turkey, Kurdish Language, Press. Publications, Works, Institutions, Kurdish Politics.

SPASNAME

Di pêvajoya vê xebata lîsansa bilind de rasterast an jî ne rasterast, alîkarîya gelek kesan giheşte min, bi taybetî jî gelek alîkarîya şêwirmend û mamosteyên me giheşte min. Ji ber vê yekê jî ez di serî de gelek sipasîya şêwirmendê xwe Doç. Dr. Kemal EROL dikim ku di seranserê vê xebatê de alîkarîya min kir û demeke dirêj sebr û tehemula min kir heta ku ez xebata xwe tamam bikim. Her wisan ez bi giştî spasîya hemû xebatkar û rêveberên Enstîtuya Zimanên Zindî Ya Zanîngeha Wanê dikim ku xizmeta zimanê Kurdî dikin da ku zindî bimîne. Û bi taybetî jî ez spasîya mamosteyên Enstîtuya Zimanê Zindî Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ, Yrd. Doç. Nesim SÖNMEZ û Mamoste Hikmettin ATTI û Hacı YILMAZ dikim ku di ber me de gelek ked dan û alîkarîya min kirin. Dîsa ez spasîya birêz Şerefettin ERYILMAZ dikim ku di vê xebatê de wekî madî û manewî gelek piştgirîya min kir. Û ez spasîya wan hemû kesan jî dikim ku di vê pêvajoyê de alîkarî dane min.

Mulazım ÖZCAN

NAVEROK

PEJIRANDIN Û PESENDKIRIN	II
ETİK BEYAN.....	III
KURTE	IV
ÖZET.....	VI
ABSTRACT	VIII
SPASNAME.....	X
NAVEROK	XI
KURTEBÊJE	XVI
PÊŞGOTIN	1
DESTPÊK	4
PÊVAJOYA DÎROKÎ YA XEBATÊN REWŞENBÎRÎYA KURDÎ.....	7
1.1. Rewşa Mijarê.....	7
1.2. Armanç û Girîngîya Meseleyê	9
1.3. Hevoka Meseleyê.....	9
BEŞ II.....	10
ZIMAN Û EDEBÎYATA KURDÎ.....	10
2.1. Erdnîgarîya Kurdî	10
2.2. Gelheya Kurd	11
2.3. Zimanê Kurdî.....	13
2.3.1. Zaravayên Kurdî.....	13
2.3.2. Li Gorî Erdnîgarîyê Belavîya Zaravayên Kurdî.....	14
2.4. Pêvajoya Nivsîkî Ya Ziman û Edebîyata Kurdî.....	14
2.5. Alfabeyên Ku Kurdan Bi Kar Anîne.....	16
2.6. Destpêka Xebatên Weşangerî û Çapemenîya Kurdî.....	17

2.7. Xebat û Berhemên Rewşenbîrîya Kurdî Yên Dema Osmanîyan.....	18
2. 8. Tevger û Saziyên Kurdî.....	19
2.9. Rojname û Kovarên Kurdî.....	21
2.10. Berhem û Pirtûkên Kurdî	23
2. 11. Xebat û Berhemên Edebî û Hunerî	24
3.1. SERDEMA 1923-1960 REWŞA XEBATÊN REWŞENBÎRÎ YÊN KURDÎ..	25
3.1.1. Rewşa Sîyasî ya Kurdî Li Tirkîyeyê.....	25
3.1.2. Di Serdema 1923-1960an de Rewşa Xebatên Rewşenbîrî Yên Kurdî	27
3.2. Serdema 1960-1980 Rewşa Xebatên Rewşenbîrî yên Kurdî	29
3.2.1. Rewşa Sîyasî	29
3.2.2. Xebatên Li Ser Çand û Edebîyata Kurdî Yên Pêşîn Ên vê Qonaxê	33
3.3. Berhemên Ziman û Edebî Ên Vê Demê û Naveroka Wan	36
3.3.1. <i>Kürtçe Sözlük</i> -Mûsa Anter.....	36
3.3.2. <i>Birîna Reş</i> -Mûsa Anter	36
3.3.3. <i>Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer</i> -Kemal Badıllı	36
3.3.4. <i>Kürtçe Alfabe</i> - M. Emîn Bozarslan	37
3.3.5. <i>Mem û Zîn</i> -Ehmedê Xanî.....	37
3.3.6. <i>Meyro</i> -M. Emîn Bozarslan	37
3.3.7. <i>Zimanê Kurdî</i> - Kamuran Bedirxan.....	37
3.3.8. <i>Şivanê Kurd</i> -Ereb Şemo	37
3.3.9. <i>Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer</i> -Kamuran Alî Bedirxan.....	38
3.3.10. <i>Kürtçe Türkçe Zözlük</i> - Yûsiv Zîyayettîn Paşa.....	38
3.3.11. <i>Kuflîkên Çîya</i> -Eskerê Boyîk.....	38
3.3.12. <i>Li Bandeva Sipêde</i> -Rojen Barnas	38
3.4. Kovar û Rojnameyên Kurdî û Ên Ku Cih Dane Ziman û Çanda Kurdî Ên vê Qonaxê	40
3.4.1. <i>Dicle-Firat</i>	40

3.4.2. <i>Hêvîya Welat</i>	40
3.4.3. <i>Deng</i>	40
3.4.4. <i>Roja Newê</i>	40
3.4.5. <i>Yeni Akış</i>	41
3.4.6. <i>Rizgarî</i>	41
3.4.7. <i>Roja Welat</i>	42
3.4.8. <i>Tîrêjî</i>	42
4.1. SERDEMA SALÊN 1980-2000	45
4.1.1. <i>Rewşa Sîyasî û Hiqûqî</i>	45
4.2 . <i>Xebat û Weşanên Kurdan Ên Rewşenbîrî</i>	46
4.2.1. <i>Xebatên Ziman û Çanda Kurdî Yên Li Ewropayê</i>	47
4.2.2. <i>Xebatên Ziman û Çanda Kurdî Yên li Bakur û Tirkîyeyê</i>	49
4.2.3. <i>Kovar û Rojname</i>	49
4.2.4 <i>Kovar û Rojnameyên Kurdan Ên Qonaxa Pêşîn Ên Serdema 1980-2000ê</i>	50
4.2.4.1. <i>Medya Güneşî</i>	50
4.2.4.2 <i>Toplumsal Diriliş</i>	51
4.2.4.3. <i>Özgür Gelecek</i>	51
4.2.4.4. <i>Vatan Güneşi</i>	52
4.2.4.5. <i>Deng</i>	52
4.2.4..6. <i>Halk Gerçeği</i>	53
4.2.4.7. <i>Yeni Ülke</i>	53
4.2.4.8. <i>Özgür Gündem</i>	54
4.2.4.9. <i>Özgür Halk</i>	55
4.2.4.10. <i>Newroz</i>	55
4.2.4.11. <i>Govend</i>	55
4.2.5. <i>Kovar û Rojnameyên Kurdan Ên Qonaxa Piştî Ku Qedexya Li Ser Kurdî Radibe û Nimûneyên Pêşîn Ên Kovar û Rojnameyên Xwerû Bi Kurdî</i>	56

4.2.5.1 <i>Rojname</i>	56
4.2.5.2. <i>Rewşen</i>	57
4.2.5.3. <i>Welat</i>	60
4.2.5.4. <i>Nûbihar</i>	61
4.2.5.5 <i>Tewlo</i>	63
4.2.5.6. <i>Zend</i>	64
4.2.5.7. <i>Pelîn</i>	65
4.2.5.8. <i>Pîne</i>	66
4.2.6. Hin Kovar û Rojnameyên Din Ên Wê Serdemê Ku Cih Dane Kurdî.	67
4.2.6.1. <i>Newroz Ateşî</i>	67
4.2.6.2. <i>Azadî</i>	67
4.2.6.3. <i>Dengê Azadî</i>	67
4.2.6.4. <i>Ronahî</i>	68
4.2.6.5. <i>Roj</i>	68
4.2.6.6. <i>Hêvî</i>	68
4.2.6.7. <i>Roja Teze</i>	68
4.2.7. Sazî û Navendên Çandî û Hunerî Ên Vê Serdemê	68
4.2.7.1. Navenda Çanda Mezopotamya	69
4.2.7.2. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê	71
4.2.7.3. Kürt Kültür ve Araştırma Vakfı/Kürt-Kav	73
4.2.7.4. Halk Kültürü Araştırma Derneği	75
4.2.7.5. Halk Kültür Derneği	76
4.2.7.6. Stran Kültür Merkezi	76
4.2.7.7. Med Kom	76
4.2.7.8. Çapxane û Weşanxaneyên Kurdî	77
4.2.8. Li Bakur Huner û Edebîyata Kurdî Ya Nûjen	79
4.2.8.1. Kurteçîroka Kurdî Li Bakur	83

4.2.8.2. Helbesta Kurdî Ya Nûjen Li Bakur	85
4.2.8.3. Romana Kurdî Li Bakur	87
4.2.8.4. Muzîka Kurdî Ya Nûjen Li Bakur	87
4.2.9. Şanoya Kurdî.....	89
4.2.9.1. Şanoya Kurdî Li Başûr	90
4.2.9.2. Şanoya Kurdî Li Rojhilat	91
4.2.9.3. Şanoya Kurdî Li Rojava.....	91
4.2.9.4. Şanoya Kurdî Li Ermenistan û Gurcistanê	91
4.2.9.5. Şanoya Kurdî Li Bakur û Tirkîyeyê.....	92
ENCAM.....	94
KURTEJIYAN	98
ÇAVKANÎ.....	99

KURTEBÊJE

AWİB	: Arşîva Weqfa İsmail Beşikçi
AZF	: Arşîva Zana Farqînî
Êdn	: Ên din
h.b.	: Heman berhem
hwd.	: Her wekî din.
Kürt-Kav	: Kürt Kültür ve Araştırmalar Vakfı
mrn.	: Mirin
MKM	: Mezopotamya Kültür Merkezi
NÇM	: Navenda Çanda Mezopotamya
r.	: Rûpel
ss	: Sedsal
Weş.	: Weşan
Yay.	: Yayın

PÊŞGOTIN

Xebatên rewşenbîrîya Kurdî di gel ku ji serê Sedsala 20an ve dest pê kirinbin jî lê belê hê jî xudan zemîneke normal nîn e û hê jî neketîye ser rêgeha xwe ya resen. Ev jî bûye sedem ku hê jî nasnameyeke temam ji bo ziman, huner û edebîyata Kurdî çênebe. Ji ber vê yekê jî pêwîstî heye ku di gel sedem û encamên wê ev rewş bê lêkolînkirin û bê ronîkirin. Ji ber ku gelek bûutên vê mijarê hebûn û bergeh û qada wê di çarçoveya fireh de xebateke piralî û gelek dûr û dirêj dixwest, me bergeha xebatê bi beşa Kurdên bakur hişt. Ji bo ku qe ne be ev xebat ji beşeke mijarê re karibe bibe bersiv, me bergeha wê bi beşa bakur û Tirkîyeyê pêvajoya Sedsala 20an û bi taybetî jî bi qonaxa wê ya dawîyê sinordar hişt.

Bi vê armancê me xwest ku bi giştî xebat û hewldanên rewşenbîrîya Kurdî ya serdema nûjen û bi taybetî jî xebatên serdema salên 1980 û 2000ê yên li bakur û Tirkîyê bi nêrîneke zanistî di ber çavan re bê derbaskirin û rewş û pêşketinên rewşenbîrîya Kurdî ya wê qonaxê bê zelalkirin. Her wisa armac ew bû ku faktorên li ser pêşketinên çandî û rewşenbîrî bîn tesbîtîkirin û di vê çarçoveyê de nirxandinek zanistî li ser vê serdemê bê kirin.

Wekî ku tê zanîn hema hema di tu demên dîrokê de xebatên bi zimanê Kurdî li ser zemîneke asayî nehatine kirin. Mirov dikare bibêje ku di hemû demên dîrokê de zimanê Kurdî di bin sîber û serdestîya zimanekî din de maye. Ji ber vê yekê jî Kurdîyeke yegirtî û rê û rêzikên nivîskî zêde nekarîye pêk bê. Her çî ku di hin serdeman de li hin herêman di bin desthilatdarîya mîrîtîyên Kurdan de hin kar û xebatên rewşenbîrîya Kurdî pêk hatibin û hin berhemên Kurdî derketibin jî berdewamîya wan zêde çênebûye. Her carê bi rewşa sîyasî re rewşa rewşenbîrî û xebat û berhemên Kurdî jî guherîye. Dema ku rewşa sîyasî û îdarî ya mîrîtîyên Kurdan hinek pêş ketîye û desthiladariya wan hinek xurt bûye xebatên rewşenbîrî bi pêş ketine û berhemên Kurdî jî derketine. Lê dema ku rewşa sîyasî û îdarî zeyîf bûye xebatên Kurdî jî rawestîyane. Bi sedsalan rewşa ziman û rewşenbîrîya Kurdî bi vî rengî di nava hat û çûnek de hatîye heta sedsala bîstan. Lê di destpêka sedsala bîstan de rewşa Kurdan ji gelek alîyan ve guherî û ser û binbûnên mezin li ser Kurdan pêk hatin. Li erdnîgarîya Kurdan dewletên nû hatin damezrandin û Kurd bi tevahî ketin nav pêvajoyeke tevlihev û aloz. Di vê serdemê de hin derfet û

destkeftîyên ku hebûn jî ji holê rabûn û xebatên rewşenbîrîya Kurdî jî demeke dirêj bê mecal û bê pergala ma. Di vê pêvajoyê de xebatên ziman û rewşenbîrîya Kurdî jî hema bêje bi temamî rawestîyan.

Lê belê li gundan bi taybetî jî li herêmên dûrê navendên bajaran civakeke Kurdî û jiyaneke Kurdî bi hemû rengên û dengê xwe berdewam bû. Di gel ku dewletê dixwest zimanê Tirkî li her derê welêt bike zimanê tekane yê jiyana civakî jî ev mumkun nebû û nekarî ku pêk bê. Vê yekê hişt ku heta nîvê sedsala bîstan jî li gund û bajarokên Kurdan zimanê Kurdî li ser zemîna xwe ya siruştî zindî bimîne û ji aliyê çand û folklorê de heta radeyek dewlemendîya xwe biparêze. Paşê piştî salên 1950yan û şûn de ku dibistan û radyo, televîzyon û her wisa dan û standinên kapîtalî li her deverê belav bûn ev rewş guherî û ziman û folklorê Kurdî jî bi vê qonaxê re her ku çû zemîna xwe ya resen winda kir. Ev pêvajoyê ji avakirina Komara Tirkîyê heta salên 1970 kêmkir zêde bi vî rengî hat.

Piştî salên 1970 û bi taybetî jî piştî salên 1980 û pê ve heta salên 2000ê hem rewşa zimanê Kurdî û hem jî rewşa xebatên ziman û rewşenbîrîya Kurdî kete qonaxeke nû. Mijara vê xebatê jî ev qonax e.

Em ê bi vê xebatê hewl bidin ku cavdêriyek li ser vê qonaxê bikin û xebatên rewşenbîrî yê nê serdemê di çarçoveyê zanistî de binirxînin. Rewşa xebat û berhemên çand û hunera Kurdî û têkilîya van ya li gel rewşa civakî û siyasî dahûrînin.

Ji bo ku ev xebat pêk bê pêwîstî bi raçavkirineke dorfireh hebû. Diviyabû ku seranserê sedsala 20an di ber çavan re bihata derbaskirin. Pîlansazî ev bû di nava salek de ev xebat temam bibe. Lê belê ji ber ku sererast arşîveke Kurdî yan jî pirtûkxaneyê Kurdî li ber dest tinebû û belgeyên ku pêwîstî pê hebûn jî gelek belawela û li cîyên cuda cuda bûn karê me hîn zehmettir bû û dem dirêjtir bû.

Di vê xebatê de me ji arşîvên hin sazîyên Kurdan yê wekî Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê û Weqfa Îsmâil Beşikçî li Stenbolê, xebatên Enstîtûya Zimanên Zindî û ji arşîvên hin rewşenbîrên Kurd sûd wergirt. Her wisa wekî lixwegirîyê vê xebatê arşîveke min bi xwe jî hebû ku gelek karê me siviktir kir. Me carina ji kesên şahidên serdemê jî sûd wergirt. Lê di gel vê yekê jî ji ber ku bergeha xebatê fireh bû dikare gelek aliyên vê xebatê kêmkir mabin.

Me vê xebatê di gel hevkarî û tevkarîya şewirmend û mamosteyên Enstîtûya Zimanên Zindî hin carin ali malê carina jî li zanîngehê meşand. Lê carina jî me zemînên hin sazîyan jî bikar anî.



DESTPÊK

Her gelek li gorî xwe çîrok û dîrokeke wî û ziman û çandê wî ya xweser heye. Her wisa her gelek dîrokekeke wî ya çandî, edebî û rewşenbîrîyê jî heye. Lê belê li gorî şert û mercên erdnîgarîya ku gelan jîyana xwe lê domandine pêvajoya pêşketina edebî û rewşenbîrî di reng û demên cuda de pêk hatîye. Hin faktor bûne sedem ku li nav hin qewman pêvajoya rewşenbîrîyê zû û li nav hin qewman jî dereng dest pê kirîye. Vê yekê jî hiştîye ku hin gel ji gelek alîyan ve bi pêş bikevin û gelek qewmên din bixin bin bandora xwe.

Ew şert û mercên ku Kurd di nav de jiyane hiştîye ku pêvajoya xebat û lebatên rewşenbîrî hinek dereng dest pê bike. Ev qonaxa weşan û çapemenîyê ku li welatên Ewropa hê di serê sedsala XVIIan de dest pê kirîye li welatên Rojhilat gelek dereng çend sedsal li dû wan dest pê kirîye. Ev pêvajoya ku li welatên Ewropayê yên wekî Hollanda, Fransa, Almanya, Îngilîzistan, Îtalya, Swêdê, Amerîka di sedsala 17an de dest pê dike. Li Tirkîyê jî ev qonaxa weşan û rojnamegerîyê çend sedsal piştê welatên Ewropayê cara pêşîn di nivê sedsala 19an de dest pê dike. Her wisa li nav Kurdan jî ev pêvajo di dawîya sedsala 19an de dest pê dike (Kaya, 2010: 34-70) Helbet her çî ku pêvajoya xebatên rewşenbîrî li nav Kurdan pirr dereng dest pê kiribe jî lê bingeha rewşenbîrîyê li nav Kurdan jî gelek berê dest pê kirîye. Hê di sedsalên 10-11an de pêvajoya fikir û edebîyatê dest pê dike û heta serdema nûjen ji alîyê şair û fikirmendên Kurd ve gelek berhemên edebî tînin nivîsîn. (Temo, 2007: LXII) Lê ji ber rewşa Kurdan ya civakî û konevanî ev xebat û berhemên rewşenbîrî gelek dereng hatine belavkirin û gelek dereng xelk ji wan haydar bûye. Paşê bi serdema nûjen re êdî ev kelepora rewşenbîrîya Kurdî hêdî hêdî derdikeve holê.

Lê belê dema ku mirov behsa kar û xebatên rewşenbîrîya Kurdî ya serdema nûjen bike, divê ku mirov pêşî berê xwe bide tevger û hewldanên sîyasî yên Kurdî. Lewra bêyî ku mirov liv û xebatên tevgera sîyasî ya Kurd bibîne mirov nikare bigihîje tehlîleke rast ya berhem û xebatên rewşenbîrîya Kurdî. Eger ku em serdema klasîk ya xebatên rewşenbîrîya Kurdî li alîyek bihêlin em dê bibînin ku hemû hewldanên rewşenbîrî di gel xebatên sîyasî dest pê kirine. Helbet rola medreseyên Kurdistanê ya di pêvajoya xebat û pêşketinên rewşenbîrî de jî nikare bê înkarkirin. Û di gel vê roleke berhem û xebatên serdema klasîk û edebiyata devkî ya Kurdî heye lê

divê ku ev di nav çarçoveyeke din de bîn nixandî. Lê piştê ku fikra neteweperwerî li dinyayê bi pêş dikeve û li ser Kurdan jî tesîra wê encam dide -ku ev jî rastê serê sedsala 20an tê-, hingî xebatên rewşnabîrî yekser di gel xebatên sîyasî derdikevin holê û ev xebat êdî bi giştî bi sehek û helwestên sîyasî tînin kirin. Ji ber wê jî mirov zêde rastê xebat û berhemên xweser ên zimanî, hunerî û edebî nayê. Ev rewş bi taybetî li bakurê Kurdistanê û li Tirkiyayê heta salên 2000ê jî kêmkirî bi vî rengî berdewam dike.

Mijara me serdema berîya salên 2000an e ku destpêka wê qonaxê digihîje heta destpêka salên 1960an. Ev tevgera ku di salên 1960'ê de gavên wê yê pêşî tînin avêtin di salên 70yan de bi wicûd dibe. Ev tevger di salên 1970yan de wekî tevgera lêgerînên sîyasî bi pêş dikeve, lê di dawîya salên 1970yan de êdî ji aliyê ziman, huner û edebîyatê ve jî dikeve nav lêgerînekê. Di encama wê lêgerînê de hin xebatên hunerî û edebî derdikevin. Lê ev qonaxa van xebatên Kurdî jî bi derbeya leşgerî ya 12 Êlûnê 1980yan re hate rawestandî. Di nav van deh salên piştî derbeyê de li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê mirov dikare bibêje ku tu xebatek çandî û edebî ya Kurdî pêk nehatîye.

Tevgera sîyasî ya Kurd heta ku tê salên 1980 di serî de bi giştî ji du çavkaniyan ava xwe hildaye. Yek ji van çavkaniyan tevgera çepên Tirk e ku ev bi taybetî di TÎP û FKF/Dev-Gençê¹ de berbiçav bûye, ya din jî tevgera sîyasî ya Kurd ya pêşîn e ku di dema pêvajoya belavbûna Împaratoriya Osmanî de derketiye meydanê û paşê jî li Başûrê Kurdistanê bi tevgera barzanî wicûd dîtiye.

Eger ku mirov bi çend gotinan behsa serkanîya tevgera Kurd ya dewra Osmanîyan bike, ji aliyek ve kokê wê digihîje mîrekî û medreseyên Kurdistanê ji aliyê din ve jî digihîje bingeha rewşnabîrîya Kurd ya ku di serê sedsala 20an de li Stenbolê ava bibû. Ev jî aliyek bi rengek xwe wekî isyan û serhildanan dide der di gel gelek faktorên civakî, çandî, ayînî, aborî yan jî sîyasî heta tê di tevgera Barzanî ve derdikeve. Bi rengekî din jî li derdora brokrasiya dewletê û zanîngeh û çapameniyê, tevgera rewşnabîrîya Kurd e ku ew jî wekî destpêk li Stenbolê aj dide û berhemên xwe yê pêşîn tîne wicûdê. Paşê jî dîsa ev pêvajoyê bi rengekî dewam dike.

¹ TÎP(Türkiye İşçi Partisi), FKF/Dev-Genç(Fikir Kulupları Federasyonu/Devrimci Gençlik), tevgerên sosyalîst ên Tirkiyeyê ne. Ev tevger piştî salên 1960an û şûn de ji aliyê ciwanên Tirk ve ku bi giştî xwendekarên zanîngehan bûn ve hatine birê xistin û serê pêşîn ciwanên Kurd jî li gel wan tevgerîyane.

Piştî derbeya leşgerî ya 1980 di destpêka salên 1990an de xebatên li ser çand û zimanê Kurdî careke din dîsa bi giştî li Stenbolê dest pê dîke û gelek ber û berhemên ziman û çandî encam didin. Ew berhem û weşanên ku li ber destê me hene vê yekê bi vî rengî nîşanî me didin. Em jî dê bala xwe bidin van berhem û weşanên vê pêvajoyê û rewşa ziman û edebîyata Kurdî binirxînin.

Armanc ew e ku Sedsala 20an heta radeyek ji aliyê kar û barên rewşenbîrîya Kurdî de bê ronî kirin da ku di serdemên pêş de faydeke bide xebatên çand û zimanê Kurdî. Ji ber ku eger kesek ji raborîya xwe haydar nebe dahatîya xwe jî nikare li ser bîngeheke saxlem ava bike.

Me di vê xebatê de zêdetir ji berhemên çapkirî sûd wergirt. Hin caran me serî li hin kesan da û me ji zanînen wan sûd wergirt. Ji ber ku her çend li ser serdemên serê Sedsala 20an û serdemên piştî wê hinek xebat û lêkolîn hatibûn kirin jî lê belê li ser serdema dawîyê ya bakur û Tirkîyeyê zêde xebat û çavdêriyeke berbiçav nehatibûn kirin, bi taybeti me xwest ku ev serdem jî bê nirxandin. Ji ber ku em jî şahid û çavdêrekî vê serdemê bûn me ev babet bijart.

BEŞ : I

PÊVAJOYA DÎROKÎ YA XEBATÊN REWŞENBÎRÎYA KURDÎ

1.1. Rewşa Mijarê

Bingeha pêvajoya rewşenbîrîya Kurdî kevn e. Ev pêvajo wekî bingeh mirov dikare bibêje ku xwe digihîne heta sedsalên 15-16an. Ev serdema ku berhemên edebîyata Kurdî ya klasîk pêk hatîye, dikare wekî bingeha rewşenbîrîya Kurdî bê qebûl kirin. Lê ji ber ku mijara me serdema nûjen e emê berê xwe bidin xebat û berhemên vê qonaxê.

Ji ber ku xebat û berhemên pêşîn ên rewşenbîrîya Kurdî ya qonaxa nûjen –ku ev qonax li Stenbolê dest pê kiribû- bi mijara me re têkildar in, divê em bi kurtebêjîyekê berê xwe bidinê û vê pêvajoyê hinek rave bikin. Gava pêşîn ya vê hewldanê rojnameya *Kurdistan*² e ku herçend ji ber sedemên siyasî li Stenbolê nehatibe çapkirin jî bingeha wê digihîje Stenbolê. Paşê piştî Meşrûtiyeta II'em(1908) ku rê li pêşiya hinek azadiyan vedibe li Stenbolê bi pêşengîya rewşenbîrên Kurd gelek xwebatên siyasî û rewşenbîrî dest pê dikin û gelek komele tînan avakirin, gelek rojname û kovar tînan belav kirin. Nimûneyên pêşîn ên edebîyat û çanda Kurdî yê nûjen jî di vê serdemê de derdikevin meydanê.

Di nîvê sedsala 19an de piştî ku êdî statûyên mîrîtiyên Kurdan ji aliyê dewleta Osmanî ve ji aholê tînan rakirin gelek binemalên mîrek û malmezînan Kurdan ji Kurdistanê tînan koçberkirin. Ji nîvê sedsala 19an pê ve êdî her ku diçe li Kurdistanê alozî zêde rû didin û bingehên ilm û zanîna jî her ku diçe kêmtir dibin. Heta ku tê serê sedsala 20an ev rewş hîn aloztir dibe. Ji ber van sedeman û her wisa ji ber ku Stenbol navenda dewleta Osmanî ye û navenda kar û xebatên rewşenbîrî ye, di serê sedsala 20an de gelek kesayetîyên rewşenbîr û siyasî tînan li Stenbolê bi cih dibin. Piştî ku fikrên neteweperwerî li dinê belav dibin û gelek netewedewlet tînan damezrandin ev yek li ser rewşenbîr û siyasîmedarên Kurd jî bandor dibe. Di vê qonaxê de ev fikrên ku ji Ewropayê li dinê belav dibûn pêşî ew şexsiyet û rewşenbîrên Kurd ku li

² *Kurdistan* rojnameya pêşîn ya Kurdî ye. Hejmara pêşîn di 22'ê Nîsana 1898an de li paytexta Misirê, Qahîreyê hatîye çapkirin û belavkirin.

Stenbolê dijîn jê bandor dibînin û dikevin nav lêgerînekê. Bi Meşrûtiyeta Ilyem re ku hinek rê li pêşiya azadiyan vedibin. Ev siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd jî bi lez û bez dest bi kar û barên siyasi û rewşenbîrî dikin.

Ji sala 1909 heta sala 1920an gelek xebat û hewldanên rewşenbîrî tên kirin. Navenda van xebatan jî bi giştî Stenbol bû. Lê di salên dawî yê Dewleta Osmanî de ji ber aloziya siyasi û tevlêhevîyên Şerê Cihanê yê Yekem rewş xirab dibe û tu zemînek ku karên rewşenbîrî û xebatên çand û edebiyata Kurdî lê bîr meşandin li Stenbolê namîne.

Piştî damezrandina Komara Tirkîyê rewşa xebatên li ser Kurdî hîn bêtir xirab dibe û heta salên 1960an li bakur tu derfetek jo bo xebatên Kurdî çapkirina Kurdî nîn e. Di vê serdemê de gelek siyasetmedar, nivîskar û rewşenbîrên Kurd neçar dimînin ku ji Tirkîyeyê derkevin û xwe li derê cihê cihê bigirin. Rewşenbîrên Kurd piştî ku ji nav sînorên Tirkîyeya nû derdîçin ên ji Başûrê Kurdistanê bi giştî diçin xwe li herêma Başûr û Iraqê digirin ku di bin hukmê Îngilîzîstanê de bû. Ên ji bakur jî bi pirranî diçin xwe li Sûriye û Libnanê digirin ku ev dever jî di bin hukmê Fransayê de bûn.

Di vê dema ku li bakur û Tirkîyeyê xebatên Kurdî di bin zexteke giran de bû heta salên 1950yan xebatên rewşenbîriya Kurdî yê ku hatin kirin bi giştî li navendên wekî Şam, Silêmanî, Bexdayê û Beyrûdê hatin kirin. Her wisa di vê serdemê ji salên 1930 pê ve xebatên rewşenbîrî li nav Kurdên Ermenistana Sovyetê jî dest pê dikin. Di vê pêvajoyê de hejmarek kovar û rojname li van navendan hatin derxistin û gelek xebat li ser ziman, çand û edebiyata Kurdî hatin kirin. Di vê qonaxê de xebatên ku di kovarên wekî *Hawar* ([AWÎB], 1933-1951, Şam), *Ronahî* ([AWÎB], 1942-1945, Şam), *Roja Nû* ([AWÎB] 1943-1946, Beyrût) de derketin xebatên gelek hêja bûn ji bo çand û zimanê Kurdî. Her wisa xebatên ku bi rêya kovarên wekî *Jiyane*, 1923-1936, *Zarî Kurdistan*, 1926-1932, *Gelawêj*, 1932-1939 hatin kirin di warê ziman û edebiyata Kurdî de gavên gelek girîng in (Uzun, 2003: 38). Disa di vê pêvajoyê de li Ermenistana Sovyetê jî bi weşandina rojnameya *Rêya Teze* 1930 re gelek xebatên hêja ên li ser ziman, çand û edebiyata Kurdî hatine kirin (Uzun, 2003: 48). Romana Kurdî ya pêşîn, bingeha xebatên li ser rêziman û îmlaya Kurdî di vê qonaxê de tê kirin. Ji salên piştî 1960an pê ve hin guherînan biçûk pêk tên lê di warê xebatên

Kurdî de zêde tiştêk berbiçav dernakeve holê. Lê mirov wekî destpêk hin hewldanan dikare bibîne.

1.2. Armanç û Girîngîya Meseleyê

Bi vê xebatê armanca me ew e ku em di ronîya bingeh û çavkaniyên pêşketina ziman û edebîyata Kurdî ya serdema nûjen de rewşa qonaxê girîng ya rewşenbîrî û edebîyatê bibînin, da ku em karibin di çarçoveyêkê rasteqîn û zanistî de rewşa ziman û edebîyata Kurdî binirxînin. Ev nirxandin girîng e, ji ber ku eger em nekarin çavdêriyê baş li ser rabirdûya ziman û edebîyata Kurdî bikin em ê nekarin bigihîjin rastîya rewşa îro jî. Ji berku piştî bi dehan sal li nav Kurdên bakur û Tirkîyeyê ew tevgera rewşenbîrî çend caran hatibû rawestandî û di vê qonaxê de careke din dest pê dike. Di vê çarçoveyê de em ê berê xwe bidin xebat û berhemên vê serdemê û herwisa hinek jî di gel têkilîyên xebatên ziman û edebî rewşa sîyasî ya wê qonaxê di ber çavan re derbas bikin. Di ronîya xebatên bi vî rengî de dikare berî lê veke ku xebatên li ser çand û hunera Kurdî tenê di nav helwesteke sîyasî de teng nemîne û di nav zemîna gel de bi hemû rengên xwe bikemile.

1.3. Hevoka Meseleyê

Bi giştî di sedsala 20an de û bi taybetî di salên 1980 heta salên 2000'î li Tirkîye û li bakurê Kurdistanê rewşa tevgera rewşenbîrîya Kurdî û ziman û edebîyata Kurdî çawa bûye û faktorên ku tesîr li ser kirine çî bûne?

BEŞ II

ZIMAN Û EDEBÎYATA KURDÎ

Ji bo ku em karibin çarçoveyeke temam di derbarî xebat û berhemên çanda rewşenbîriya Kurdî de pêk bînin pêwîst e ku em hindek berê xwe bidin erdnîgarî, civak û zimanê Kurdî jî. Ji ber vê yekê, berê ku em derbasê mijara xebata xwe ya esasî bibin em ê pêşî di çarçoveyeke giştî de hindek qala erdnîgarî, civak û zimanê Kurdî bikin. Da ku em bikarin tevahîya resmê bibînin.

2.1. Erdnîgarîya Kurdî

Navê qewmên Kurd ji serdemên gelek kevn de di belgeyên dîrokî de derbas dibe. Welatê Kurdistan û erdnîgarîya Kurdistan ji sedsalên serdema navîn pê ve ji aliyê gelek dîroknivîs û gerokan ve hatîye îşaret kirin. Erdnîgarîya ku bi giştî Kurd lê niştecî ne ji dema belavbûna ereban ve qala wê û qala Kurdistan tê kirin. Wisa tê zanî ku cara pêşîn ji aliyê hukumdarê Selçûkî Siltan Sencer(mrn. 1157) ve qala navê Kurdistan û welatê Kurdistan hatîye kirin. Li gorî wî ev welat di navbera Ezerbeycan û Loristanê de Hemedan, Dînewer, Kirmanşah, Sine û ji rojhilatê zagrosan heta rojavayê Şehrezor, Xuftîyan û Zapê dirêj dibe. Dîrokzanê ereb Hamdullah-el Mustwfi(mrn. 1349) di kitêba xwe ya bi navê Nuzhat-al Kulub de li ser welatên Kurdistan behsa 16 Eyaletan dike. Şerefxanê Bedlîsî(1597), di *Şerefnameya* xwe de Loristanê jî di nav welatê Kurdistan de qebûl dike. Ewlîya Çelebî(mirin, 1682), jî di wê demê de ji Erzurom, Wan, Hekarî, Dîyarbekir, Cizîr, Amedîye, Mûsil, Şehrîzor heta Erdelanê welatê Kurdistan wekî 9 eyaletan dîyar dike (Minorsky û êdn,1996: 13-14). Helbet di sînorên erdnîgarîya Kurdistan de her sedsal li gorî şert û mercan hin guherîn pêk hatine.

Erdnîgarîya Kurdistan heta sedsala 20an, hilweşîna Îparatorîya Osmanî du beş bû. Beşek di nav sînorên dewleta Sefewî de bû beşek jî di nav sînorên Dewleta Osamanî de bû. Piştê şerê Cîhanê yê Yekem ku li herêmê dewleta Iraq û Sûriye jî hatin damezrandin erdnîgarîya Kurdistan bû çar beş û di nav dewletên Îran, Tirkîye,

Iraq û Sûrîyeyê de hate dabeşkirin. Her wisa beşek biçûk ji Kurdan jî piştî vê dabeşbûnê di nav sînorên Yekîtiya Sovyetan de man.

Îro ji aliyê gelek diroknaş û lêkolîneran ve erdnîgarîya Kurdan tê destnîşankirin. Di gel ku di navbera destnîşankirinên wan de hin ferq hene jî lê ji aliyê bingeha esasî ve bi giştî yek e.

Wekî mînak, Thomas Boîs di lêkolîna xwe li bin navê “*Kurd û Welatê Wan*” de erdnîgarîya Kurdan -bi referansa Trotte (1878)- wiha destnîşan dike. “Erda ku Kurd lê nişteciîne sînorê wê yê bakur xeta Dîvrîgî-Erzurum-Qers e. Li rojava di ser Ezirgan, Meletî ve digihêje bakur rojavayê Sûrîyeyê Çîyayê Kurd. Li bakurê Sûrîyeyê di ser Cerablûs, Dirbesî û Amûdê ve digihêje Qamîşlo, Li Iraqê di ser Mûsil, Şengal, Dihok û Aqrê ve digihêje Kerkûk û Silêmanî. Li rojhilat di nav sînorên Îranê de jî di ser Mako, Ormîye, Mehabad, Sine û Seqiz re digihêje Kirmanşa. Bi giştî rûbera wê bi qasî 392.000 kîlometreyên çargoşe ye” (Minorsky û êdn.,1996: 15-16).

Mehrdad R. Îzady, jî dibêje ku erdnîgarîya Kurdan ji Kendava Basrayê di ser Zagrosan ve, ji sînorên Qafqasyayê wekî V'yek berevajî digihêje Deryaya Spî. Rûbera wê bi qasî 500.000 kîlometreyên çargoşe ye (Izady, 2004: 21).

Lê belê li dervayê vê erdnîgarîyê beşek Kurdan jî ji sedsalên berê ve li Xorasana Îranê û li Anatolyaya Navîn dijîn. Li roja me ya îro êdî Kurd li gelek welatên dinê belav bûne û bi giranî jî gelek Kurd li welatên Ewropayê dijîn.

2.2. Gelheya Kurd

Gelheya Kurdan tu car bi aweyekî zelal û sererast nehatîye tesbît kirin. Lê hin lêkolîneran di derbarî gelheya Kurdan de li gorî serjîmarên dewletên desthilatdarên Kurdan ku di hin tarîxan de pêk anîne encamek derxistine. Em jî dê li gorî tesbîta van lêkolîneran hin agahîyan bidin.

Îro Kurd di gel erdnîgarîya xwe ya qedîmî li gelek herêm û welatên cuda cuda dijîn. Bi taybetî li herêmên rojavayên Tirkîyeyê îro hejmarek mezin Kurd dijîn. Her wisa bi sedhezaran Kurd koçê welatên Ewropayê jî bûne.

Li gorî hin pêşbînîyan gelheya Kurdan di sala 1980an de wiha tê texmîkirin:

Tablo. 1 Texmînên kê-m-zêde yên gelheya Kurd li gorî sala 1980 (Pour, 2005:71).

Tirkîye.....	8.455.000 - 10.500.000
Îran.....	3.701.000 - 6.200.000
Iraq.....	3.105.000 - 3.600.000
Sûriye.....	734.000 - 800.000
Yekîtiya Sovyetan.....	265.000 - 350.000
Libnan.....	60.000 - 100.000

Tevahî.....: 16.320.000 - 21.550.000

Di derbarî gelheya Kurdan ya di sala 1980yan de Mehrdad R. Izady van reqeman dide (Izady, 2004: 223).

Tirkîye.....	9.970.000
Îran.....	4.370.000
Iraq.....	2.810.000
Sûriye.....	820.000
Y. Sovyetan.....	280.000

Tevahî.....: 18.250.000

2.3. Zimanê Kurdî

Ji ber ku mijara xebata me mijara zimanê Kurdî nîn e, em ê bi dorfirehî li ser babeta ziman ranewestin. Lê belê ji ber ku têkilîya xebata me bi xebatên bi zimanê Kurdî re heye emê bi aweyekî kurt behsa zimanê Kurdî û pêvajoya wî ya nivîskî bikin û derbasî ser mijara xwe ya esasî bibin.

Li gorî lêkolînên zimanzanan zimanê ku li cîhanê tî axaftin li ser 3 komên bingehîn, wekî koma zimanên Hindn-Ewropa, koma zimanên Ural-Altay û koma zimanên Hamî-Samî dabeş dikin (Aksan, 2007: 110).

Zimanzan Zimanê Kurdî di nav zimanên Hind-Ewropa de, di bin binbeşa zimanên Îranî de didin nîşan (Tan, 2011: 22-23).

Zimanên Kurdî li ser erdnîgarîyeke gelek fireh tê axaftin û ji gelek zarava û devokan pêk tê. Ji ber ku ev babet mijara xebateke cihê ye emê tenê bi kurtî behsa zaravayên Kurdî bikin.

2.3.1. Zaravayên Kurdî

Mijara xebata me hemû zaravayên Kurdî dihewîne. Ji ber vê yekê em ê bi kurtasî li ser zaravayên Kurdî jî hin agahîyan bidin.

Li ser dabeş kirin û navlêkirina zaravayên Kurdî ji demên berê ve hin nîqaş hene. Lê lêkolînerên ku li ser zimanê Kurdî xebat kirine bi giştî zimanê Kurdî li ser pênc zaravayan rave dikin. Ji Şerefxanê Bedlîsî bigir heta Ewliya Çelebî, heta tê digihîje Zîya Gokalp û gelek ji lêkolînerên Ewropî ên wekî, G. Garvili, Peter Lerch, E. B. Saane (Kaya, 2010: 57). Di vê derheqê de di gel ku lihevkirineke zelal pêk nehatibe jî zimanzanên Kurd bi giştî zaravayên Kurdî yê sereke wekî pênc zaravayan diyar dikin. Wekî tê diyarkirin zaravayên Kurdî ev in: Kurmancîya jorîn, Kurmancîya jêrîn(Soranî), Goranî (Hewremanî), Kirmanckî (Dimilî/Zazakî), Lorî (Tan, 2011: 28).

2.3.2. Li Gorî Erdnîgarîyê Belavîya Zaravayên Kurdî

Kurd herî zêde bi kurmançîya jorîn diaxivin. Kêm zêde ji sedan pêncîyê Kurdan bi kurmançîya jorîn diaxivin. Beşek mezin ji Kurdan jî bi kurmançîya jêrîn diaxivin. Beşên din jî bi goranî(hewremanî, kirmanckî(dimilî/zazakî) û lorî diaxivin. Beşek mezin ji Kurdên bakur û Tirkîyeyê, hemû Kurdên Sûrîyê, beşek gîrîng ji Kurdên başûr û Iraqê û beşek ji Kurdên rojhilat û Îranê bi kurmançîya jorîn diaxivin. Beşek mezin ji Kurdên başûr û Kurdên rojhilat û Îranê kurmançîya jêrîn diaxivin. Goranî beşek ji Kurdên aşûr û beşek jî ji Kurdên rojhilat diaxivin. Kirmanckî li nav Kurdên Tirkîye û li hin herêmên bakur bi piranî li bajarên wekî Dersîm, Xarpêt(Elazığ), Çewlig(Bingöl), li hin navçeyên Diyarbekirê û hin deverên Semsûr(Adiyaman), Mûş, Bedlîs, Riha(Urfa) û Erzurumê tê axaftin (Izady, 2004: 306-307).

2.4. Pêvajoya Nivîskî Ya Ziman û Edebîyata Kurdî

Berê ku em bînin ser dabaşa nîqaş û guft û goyên li ser ziman û edebîyata Kurdî û pêvajoya wî ya dîrokî rastîyeke din ya dîrokî heye ku pêwîst e mirov rewşa ziman û edebîyata Kurdî di çarçoveya wê rastîyê de li ber çavan bigire û binirxîne. Ev rastî jî bê guman têkilîya rewşa ziman û edebîyatê ya bi desthilatdarîya sîyasî ye. Dema ku em li dîroka edebîyata nivîskî ya Kurdan dinêrin, dîyar dibe ku piştî Îslamê di dema desthilatdarîya dewletên erebî de heta ku dewletên herêmî yên Kurdî tînin avakirin nêzî 600-700 salan tu berhemeke nivîskî ya Kurdî dernakeve. Piştî ku li hin herêmên Kurdan rewşa sîyasî ya Kurdan diguhere û hin hukûmet û mîrîtîyên Kurdan derdikevin hingî berhêmên ziman û edebîyata Kurdî derdikevin. Ev rewş jî bo farisan jî bi heman rengî ye. Di gel ku zimanê farisî bi sedsalan zimanê dewletê bûye jî di serdema desthilatdarîya dewletên erebî yên Emewî û Ebasî de bi qasî 600-700 salan bi zimanê farisî jî tu berhemek nayê nivîsîn (Adak, 2013: 141-142). Vê rewşê hê 300 sal berê Ehmedê Xanî destnîşan kirîye û gazinên xwe bi serok û sermîyanên Kurdan de kirîye.

“Ger dê hebûya me padîşahêh

La ‘îq bidiya Xwidê kulahek

Hasil bibûya ji bo wî tacek

Elbete dibû me jî rewacek

Ger dê wî nezer bida me carek

Îksîrê tevecuha mubarek

Ev qewl hemû dikirine eş'ar

Ev pol-i hemû dibûne dînar

Ilm û huner û kemal û îzan

Şi'r û xezel û kîtab û dîwan

Ew cîns bibûya li bal wî mamûl

Ew neqd bibûya li nik wî meqbûl

Min dê elema kelamê mewzûn

Alî bikira, li banê gerdûn” (Xanî, 1995: 180-190).

Ji xwe di vê pêvajoya destpêkê de edebîyata Kurdî bi giştî li sê navendên desthilatdarîyên hukûmetên Kurdî derdikeve. Ev navend jî mirov dikare wekî navendên hukûmetên Kurdî yê Erdelan, Botan û Baban destnîşan bike. Ji ber ku bi giştî şair û edîbên edebîyata Kurdî li hawirdorê van navendan giheştine û berhem dane.

Her çend dîroka belgeyên nivîskî yê Kurdî zêde kevn nebe jî dîsa pêvajoya nivîskî ya ziman û edebîyata Kurdî digihîje heta hezar sal berê roja me ya îro. Hinek lêkolîner û zimanzan dîroka nivîskî ya zimanê Kurdî digihînin heta sedsalên berê zayînê. Helbet li ser hin zimanên Îranî jî her nîqaş û guft û go berdewam bûne ku ka kîjan ziman Kurdî bûye yan Kurdî nebûye.

Hin lêkolînerên ku li ser dîrok, ziman û edebîyata Kurdî xebat kirine zimanê Avestayî, zimanê Medî û zimanê Pehlewani/Pehlewî –ku wekî jêderka zimanê Kurdî tî nîşandan (Izady, 2004: 300-301). jî wekî zimanên Kurdî didin nîşan û pirtûka

dînê Zerdeşt Avesta û hin kitêb û nivîsarên Pehlewanî jî wekî berhemên pêşîn ên nivîskî yên bi zimanê Kurdî didin nîşan (Sağnıç, 2002: 34-36).

Li gorî belgeyên ku hatine bi dest xistin, belgeyên nivîskî yên bi Kurdîya îro nimûneyên wê yên pêşîn di sedala 8-9an de bi zaravayên goranî û lorî hatine nivîsîn. Berhemên şairên wekî Behlûlê Dana, Babe Rax û Baba Tahirê Hemedanî û hwd. Berhemên pêşîn ên nivîskî yên Kurdî tên qebûl kirin (Temo, 2007:50-51). Berhemên nivîskî yên pêşîn ku bi kurmancîya jorîn hatine nivîsîn jî hin helbestên Evdilsêmen Babek û kitêbên pîroz ên dînê Êzdîtîyê Misheba Reş û Kîtabê Cilwe ne. Ev berhemên ku di sedsalên 10-11an de hatine nivîsîn wekî berhemên pêşîn tên qebûl kirin (Temo, 2007: 50-51). Lê di gel ku behsa navên gelek şairên berê Elî Herîrî tê kirin jî lê ji ber ku helbestên wan helbestvanan nehatine peydakirin û tesbîtkirin, gelek nivîskar û lêkolîner Elî Herîrî(ss. XVII) wekî şairê sereke ê pêşîn ê edebîyata klasîk a Kurdî –bi taybetî kurmancîya jorîn- didin nîşan (Adak, 2013: 181).

Lê belê hinek nivîskar û lêkolîner dîroka nivîskî ya zimanê Kurdî digihînin heta sedsalên berîya zayînê. Feqî Huseyn Sağnıç, ji kitêba Enwer Mayî ya bi navê Elekrad Fî Behdînan neqil dike ku helbesteke Kurdî ku li ser kevîrek hetîye nivîsîn hatîye dîtin. Wiha hatîye dîyarkirin ku ev helbest berê zayînê di salên 330yan de ji aliyê Şairekî Kurd ve hatîye nivîsîn ku navê wî “Boraboz” bûye. Her wiha dîsa Feqî Huseyn, ji Dr. Seîd Xanî Kurdistanî neqil kirîye ku helbestek li ser çemrek nivîsandî li şikefteke li nêzikî Silêmanî hatîye dîtin ku 1500 sal berê roja me hatîye nivîsîn (Sağnıç, 2002: 44). Her wisa Selîm Temo jî di pirtûka xwe ya bi navê “*Kürt Şiiri Antolojisi*”(Antolojîya Helbestên Kurdî) de neqil dike ku hin nivîsar û helbestên Kurdî giheştine roja me ku di sedsalên berê zayînê de hatine nivîsîn (Temo, 2007: 46-48).

2.5. Alfabe yên Ku Kurdan Bi Kar Anîne

Li gorî çavkanîyan di nav pêvajoya dîrokê de ji destpêka peydabûna tîpan pê ve gelek alfabe ji aliyê bav û kalên Kurdan ve hatine bikaranîn. Her çend bi van hemû alfabe yên ku qala wan tê kirin berhemên Kurdî îro li ber dest tunebin jî lê belê li erdnîgarîya ku Kurd ji qedîm de lê dijîn ev alfabe hatine bikaranîn û ji aliyê hin lêkolîneran ve tê qebûl kirin ku ev alfabe ji aliyê Kurdan ve hatine bikaranîn. Lê belê di sedsala dawî de sê alfabe ji aliyê Kurdan ve hatine bikaranîn. Ew jî alfabe yên

Erebî, Latîni û Kirîli ne. Niha jî bi giştî alfabeyên Latîni û Erebî tèn bikaranîn, lê kirîli jî hê ji aliyê hinek Kurdên Sovyeta berê ve tê bikaranîn.

Alfabeyên ku di zimanê Kurdî de hatine bikaranîn wekî li jêr hatine nîşandan :

1. Xetên Mîxî : Medan 6 tîpên din li vê alfabeyê zêde kirine û ji 36 tîpan derketîye 42 tîpan.
 2. Alfabeya Avestayî : Li gorî çavkanîyan ev alfabe ji 44 tîpan pêk hatîye, ji rastê ber bi çepê ve hatîye nivîsîn. Berê Zayînê hatîye bikaranîn.
 3. Alfabeya Pehlewî : Ev alfabe ji 24 tîpan pêk hatîye û ji rastê ber bi çepê ve hatîye nivîsîn.
 4. Alfabeya Masî Soratî : Ev alfabe ji 37 tîpan pêk hatîye û piştî zayînî hatîye bi kar anîn.
 5. Alfabeya Êzdî : Ev alfabe din av êzdîyan de hatîye bikaranî. Ev alfabe ji 31 tîpan pêk tê. Kitêba pîroz ya dîne Êzdîtîyê bi vê alfabeyê hatîye nivîsîn.³
 6. Alfabeya Erebî : Ev alfabe piştî ku Kurd dibin misilman pê ve hatîye bikaranîn. Di pêvajoya nivîskî ya Kurdî de herî zêde ev alfabe hatîye bikaranî û niha jî bi giranî tê bikaranîn.
 7. Alfabeya Latîni : Ji salên 1930 pê ve piştî kovara Hawarê ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve tê sazîkirin û dibe alfabeya sereke ya Kurdî.
 8. Alfabeya Kirîli : Alfabeya krîli piştî avabûna Yekîtiya Sovyetan ji aliyê Kurdên din av welatên yekîtiyê ve tê bikaranîn (Sağrıç, 2002: 25-28).
- Her wiha tê zanîn ku bi alfabeya Ermenî jî hin tiştên bi Kurdî hatine nivîsîn.

2.6. Destpêka Xebatên Weşangerî û Çapemenîya Kurdî

Ji ber rewşa Kurdan ya siyâsî û civakî xebatên weşangerî û çapemenîyê li nav Kurdan gelek dereng dest pê kirine. Cara pêşîn pirtûka ku li ser zimanê Kurdî hatîye çapkirin pirtûka *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda* (Gramer û Ferhenga Zimanê Kurdî) ye ku ji aliyê Maurizio Garzonîyê Îtalyanî ve hatîye nivîsîn û di sala 1787an de li Romayê hatîye çap kirin (Serfiraz, 2015: 28).

³ Hin îdea hene ku tenê kitêbên pîroz ên dîne Êzdîtîyê wekî *Mişefa Reş* û *Kitabî Cilwe* bi vê alfabeyê hatine nivîsîn ku ew jî wekî alfabeke şîfre bûye da ku ev kitêb bi rêya wê bên parastin. (B. Maximilian 1913: 1-10)

Nivîs û berhemên Kurdî heta serê sedsala 20an bi giştî destxetên menzûm bûn. Di gel ku di nav van berhemên Kurdî de yê ku bi alfabeyên Êzdî, Ermenî û Suryanî jî hebin jî lê bi giştî bi alfabeya Erebî hatibûn nivîsîn.

Çapemenî û berhemên çapkirî di standartbûna ziman û di pêşketina xebat û tevgerên rewşenbîrî de roleke girîng dilîzin. Ji ber ku çapemenî û çapxane di nav Kurdan de tunebûye xebat û berhemên Kurdî jî pirr dereng hatine çapkirin û belavkirin. Heta salên destpêka Sedsala 20an tu çapxane yan jî weşanxaneyek aîde Kurdan tinebû. Çapxane û weşanxaneyên ku hebûn yan aîde dewletê bûn yan jî aîde mîsyonerên Ewropî bûn. Ji ber wê jî çend kitêbên ku di vê qonaxê de bi Kurdî hatine çapkirin ji aliyê van kes yan jî dezgehên ve hatine çapkirin.

Kitêba yekem ku bi Kurdî hatiye çapkirin Wegera Încîlê ye ku di sala 1861an de bi alfabeya Ermenî li Stenbolê hatiye çapkirin (Malmîsanij, 2006: 33-35). Tevgera sîyasî ya neteweyî ya Kurdî li gorî gelên di nav Dewleta Osmanî de bûn dereng dest pê kirîye. Ji ber wê jî xebatên ziman û çand û çapemenîyê jî li nav Kurdan dereng dest pê kirine. Piştî Rojnameya *Kurdistan* hin rewşenbîrên Kurd li Stenbolê dikevin nav lêgerînekê. Ji bo çapemenî û belivkirina zimanê Kurdî hin gavên avêtin. M. Malmîsanij destnîşan kirîye ku di sala 1908an de Kurdîzade Ehmed Remîzê Licêyî, Xelîl Xeyalîyê Motkî û li gel hin hevalên xwe li Stenbolê çapxaneyekê Kurdî vekirine û kitêbên bi Kurdî û yê li ser Kurdan çap kirine. Her wisa di vê qonaxê de ji aliyê Xelîl Xeyalîyê Motkî ve alfabeyek jî ji bo Kurdî tê amade kirin û tê çapkirin.

Lê li Kurdistanê cara pêşîn ji aliyê Ekrem Cemîl Paşa ve li Dîyarbekirê Çapxaneyek tê kirrîn û rojnameya *Gazî* tê çapkirin. Her wiha M. Malmîsanij destnîşan dike ku di vê qonaxê de heta sala 1923yan bi qasî 23 kitêbên Kurdî yê bi elfabeya erebî hatine çapkirin (Malmîsanij, 2006: 33-43).

2.7. Xebat û Berhemên Rewşenbîrîya Kurdî Yê Dema Osmanîyan

Heta Şerê Cîhanê Yê Yekem beşek Kurdan di nav sînorê Îranê de bûn, lê pirranîya Kurdan di nav sînorên Dewleta Osmanî de dijîn. Ji ber wê yekê jî tevger û xebatên pêşîn ên Kurdan bi giştî li paytexta Dewleta Osmanî li Stenbolê pêk hatin.

Tevger û komeleyên pêşîn, kitêb û rojname û kovarên pêşîn her di nav sînorên Dewleta Osmanî de derketin.

Piştî ku fikrên neteweperwerî li nav milletên Împaratora Osmanî pêş dikevin Kurd jî jê tesîr dibînin. Serê pêşîn qismek girîng ji neteweperwerên Kurd di nav Dewleta Osmanî de li rêya çareserkirina pirsgirêka Kurdan digerin. Hinek ji van sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd li gel neteweperwerên Tirk tev digerin û hindek ji wan jî di avakirina Îtîhat û Teraqî de cih digirin o heta demek li gel Îtîhat Teraqîyê tev digerin. Li gorî hin nivîskaran wekî îdea tê behs kirin ku rojnameya pêşîn ya Kurdî “*Kurdistan*” jî weşana vê tevgerê bûye. Fetullah Kaya, di kitêba xwe ya bi navê *Kürt Basını* de ji Ferhat Pîrbal neqil dike ku, hevkarîyeke girîng di navbera rojnameya *Oamanli* û rojnameya *Kurdistan* de hebûye ku rojnameya *Osmanli* weşana rêxistina Îtîhat Teraqî bûye. Her wisa dîyar dike ku rojnameya *Kurdistan* û rojnameya *Osmanli* di heman wextan de û li heman cîyan hatine çapkirin û di weşanên xwe de propogandaya hevdu jî kirine. Û dîsa di heman kitêbê de behs dike ku her çend ku avakarê rojnameyê Mîqdat Mîthat Bedirxan bûye û hejmarên pêşîn zêdetir li ser pêşxistina hişmendîya Kurdayetîyê bûne jî lê piştî hejmara 5’em rojnameyê yek ji weşanger û rêveberê eslî yê *Kurdistan* Abdurehman Bedirxan li ser navê Kurdan tevî kongreya Jontirkan ya li Parîsê bûye û yek ji endamên çalak yê Îtîhat Teraqîyê bûye (Kaya, 2010:75-78). Her wisa Mesûd Serfîraz di kitêba xwe ya *Kurd, Kitêb Çapxane* de diyar dike ku têkilîyeke xurt di navbera weşangerên rornameya *Kurdistan* û tevgera Jonturkan de heye û heta sedema nedewamkirina rojnameya *Kurdistan* jî parçebûna tevgera Jontirkan e (Sarfîraz, 2015: 38). Lê paşê, her wekî ku tê zanîn Îtîhat Teraqî bû tevgera tirkperest û di gel neteweyên din ên Osmanî dijayetîya Kurdan jî kirin.

2. 8. Tevger û Saziyên Kurdî

Tevgera sîyasî û rewşenbîrî ya Kurdî piştî demeke dirêj ya tevgerînekê, bi taybetî jî di encama vebûn û veguherînên Meşrûtiyeta IIyan de encam dide û Kurd xwe bi rê dixin û gelek sazî û dezgehên sîyasî û çandî ava dikin.

Piştî Meşrûtiyeta IIyan ku hin rê li ber xebatên rewşenbîrî vedibin; di vê pêvajoyê de ew rewşenbîr û sîyasetmedarên Kurd ku ji ber gelek sedemên cuda cuda

li Stenbolê kom bibûn û ji ber sedemên sîyasî hinek ji wan ji Stenbolê jî sirgûn bibûn welatên din piştî Meşrûtiyeta IIyan carek din wedigerin Stenbolê û gelek sazî û dezgehên Kurdî ava dikdin û gelek xebatên reşwşenbîrî wekî kovar û rojname dertînin. Bingeha van xebat û berhemên vê roja me jî bi giştî li vê serdemê tîn avêtin.

Garo Sasunî, vê girseya polîtîk ku bingeha xebatên neteweyî û rewşenbîrî avakirine wekî sê çînen cuda rave dike;

1 – Yên ji binemalên Beg, Şêx û Axayên Kurd: Ev qisim di bin sîya Dewleta Osmanî de li ser Kurdan xwedî îmkan û hêz bûn û bi giştî bi Sîsteman Osmanî ve girêdayî bûn.

2 – Memûr û Efserên Kurd: Ev qisim bi giştî bibûn tirk û kesên pir sadiqên rejimê bûn û zêde problemeke wan bi rejimê re tinebû.

3 – Rewşenbîrên Kurd ên fikirazad: Ev qisim Kurd fikra serxwebûna Kurdan belav dikirin û ji aliyê rejimê ve jî gelek caran dihatin sirgûnkirin (Sasuni, 1992: 150).

Ev ravekirina Garo Sasunî mirov dikare di çarçoveya giştî de wekî tehlîleke di cih de qebûl bike. Ji xwe dema ku mirov berê xwe bide van xebat û weşanên vê qonaxê mirov rastê vê rastîyê tê.

Di vê serdemê de komeleya pêşîn ku ji aliyê van rewşenbîr û sîyasetmedarên Kurd ve hatiye avakirin Kurdistan Azm-i Kavi Cemiyeti(Komeleya Vîna Xurt a Kurdistan)/1900 ye. Piştî vê komeleyê dema ku Meşrûtiyeta II. tê îlan kirin gele komeleyên din jî tîn ava kirin.

Komeleyên ku wê serdemê hatine avakirin ev in:

- 1 - Kurdistan Azm-i Kavi Cemiyeti(Komeleya Vîna Xurt a Kurdistan) /1900
- 2 - Osmanlı Kürd İttihad ve Terakki Cemiyeti(Komeleya Kurdên Osmanî ya Yekîti û Pêşketinê)/1908
- 3 - Kurd Teavün ve Terakki Cemiyeti(Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurd)/1908
- 4 – Kürd Neşri-i Maarif Cemiyeti(Komeleya Weşan û Zanîna Kurdî)/1910
- 5 – Kürdistan Teşrik-i Mesai Cemiyeti(Komeleya Hevkarîya Xebatên Kurdistan)/1912
- 6 – Kurdistan Muhibban Cemiyeti(Komeleya Hezkirîyên Kurdistan)/1912

- 7 – Kürd Talebe Cemiyeti Hêvî(Komeleya Hêvî ya Telebeyên Kurd)/1912
- 8 – Kürdistan Teali Cemiyeti(Komeleya Bilindbûna/Pêşketina Kurd)/1918
- 9 - Kürd Teşkilatî İctimaiye Cemiyyeti(Komeleya Rêxistina Civakî ya Kurdan)/1919
- 10- Kürd Kadınları Tealî Cemîyetî(Komeleya Bilindkirina Jinên Kurd)/1919 (Temel, 2015: 28-29).

Di vê qonaxê de kesayetên wekî, Mîqdat Bedirxan, Ebdurehman Bedirxan, Muftîzade Reşîd Begê Mûşî, Qeymeqam Cemîlbeğê Dîyarbekirî, Emîn Alî Bedirxan, Ferîq Şerîf Paşa, Şêx Ebdulqadir(Nehrî), Xelîl Xeyalî, Memduh Selîm Beg, Ekrem Cemîl Paşa, Ebdullah Cevdet, Kemal Fevzî, Emîn Alî Bedirxan, Mewlewîzade Rif'et, Qedrî Cemîl Paşa, Tewfîqê Silêmanî(Pîremerd), û hwd. di nav xebatên rêxistinî û weşanan de cih girtine (Serfiraz, 2015: 39-42, 62). Kesên sereke yên ku di avakirina van komeleyan de cih girtine em dibînin ku kesayetên rewşenbîr û sîyasî yên ji wan binemal û çînen cuda cuda yên Kurdan in.

2.9. Rojname û Kovarên Kurdî

Di vê serdema ku gelek sazî û dezgeh ji aliyê Kurdan ve bi armancên sîyasî li Stenbolê tînin avakirin de, her wisa gelek rojname û kovar jî tînin çapkirin û belavkirin.

Wisa tê zanîn ku ev rojname, kovar yan jî kitêbên ku di dewra Osmanî de hatine çapkirin û belavkirin bi giştî jî yan yekser ji aliyê wan sazî rêxistinên ku me li jor dîyar kirin ve yan jî bi alîkarîya wan hatine çapkirin û belavkirin.

Rojname û Kovarên ku wê serdemê hatine derxistin ev in:

- 1 – *Kurdistan*(Rojname)/1898-1902
- 2 – *Şark ve Kurdistan*(Şerq û Kurdistan-Rojname)/1908
- 3 – *Kurdistan*(Rojname)/1908-1909
- 4 – *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesî* (Rojnameya Alîkarî û Pêşketina Kurd)/1908-1909
- 5 – *Rojî Kurd*(Kovar)/1913
- 6 – *Hetawî Kurd*(Kovar)/1913-1914

- 7 – *Yekbûn*(Kovar)/1913
- 8 – *Serbestî*(Kovar)/1908 -1913
- 9 – *Jîn*(Kovar)/1918-1919
- 10 – *Kurdistan*(Kovar)/1919

Ji xeynî van kovar û rojnameyên ku li Stenbolê tên belav kirin di wê serdemê de li hin navendên din ên di nav sînorên Osmanî de jî hin kovar û rojnameyên Kurdî derketine (Kaya, 2010: 105-114).

Wekî mînak;

- 1 – *Peyman*(Rojname), Dîyarbekir -1909
- 2 - *Amîdî Sevda*(Rojname), Dîyarbekir-1909
- 3 – *Bangî Kurd*(Kovar), Bexda - 1914
- 4 – *Gazî*(Rojname), Dîyarbekir – 1919
- 3 – *Bangî Kurd*(Rojname), Silêmanî - 1922

Ev kovar û rojnameyên ku di vê serdemê de hatine çapkirin û belavkirin, hema bigir hemû jî yan yekser organên fermî yên komeleyan in, yan jî ji aliyê damezrîner û rêveberê komeleyan ve armancên siyasî hatine derxistin lê cih dane hin berhem û mijarên çandî û edebî jî.

Wekî mînak, me li jor têkilîya rojnameya “*Kurdistan*” li gel tevgera Jonturk û Îttîhat Teraqîyê dîyar kiribû. Her wisa tê zanîn ku *Rojnameya Alîkarî û Pêşketina Kurd (Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi)* organa fermî ya Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurd(Kürd Teavûv ve Terakki Cemîyeti) e. *Rojî Kurd, Hetawî Kurd* û *Yekbûn* jî tê zanîn ku ji aliyê Komeleya Xendekarên Kurd Hêvî(Kürd Telebe Cemiyeti Hêvî) ve tên derxistin (Kaya, 2010: 105-114).

Rojnameya Şerq û Kurdistan(Şark ve Kürdistan Gazetesi), Ev rojname piştî rojnameya “*Kurdistan*” rojnameya pêşîn e ku ji aliyê Kurdan ve tê derxistin. Di gel ku baş ne dîyar e ka organa kîjan komele yan jî tevgerê ye û baş nayê zanîn ka çend hejmar derketiye û nivîsên Kurdî jî tê de hatine weşandin yan na, lê ji xwedî û nivîskarên rojnameyê dîyar dibe ku ew jî weşana van sazî û dezgehane e. Kesên wekî Ehmed Şerîfê Hersekî(Hrtsekli Ahmet Şerîf), Bedrîyê Meletîyê(Malatyalı Bedrî), Îsmailê Hersekî(Hersekli İsmail) xwedî û nivîskarên rojnameyê ne. Herwisa kesên

wekî Seîdê Kurdî(Nûrsî) jî di vê rojnameyê de gotar nivîsîne. Rojnameya “*Kurdistan*” (1908-1909) jî ku paşê bi vî navî hin rojname û kovarên din jî derketine, xwedî û avakarê wê Sureya Bedirxan e. Sureya Bedirxan jî dîsa yek ji wê bereya rewşenbîr û siyasetmedarên wê demê ye.

Di vê qonaxê de yek ji weşanên herî girîng kovara “*Jîn*” e. Ev kovar ji aliyê avakarên Komalaya Bilindkirina/Pêşketina Kurdistanê(Kürd Te’ali Cemiyeyi) ve wekî organa komeleyê tê derxistin. Berpirsyar û yek ji nivîskarên sereke yên kovara “*Jîn*”ê Hemzeyê Miksî ye ku ew di heman demê de yek ji avakarên Komeleya Bilindbûna Kurdistanê(Kürd Tealî Cemiyetî) bûye. Her wisa ji aliyê avakarên Komeleya Bilindbûna Kurdistanê ve Komeleya Kurd ya Ji Bo Zanîn û Weşanan(Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti) tê avakirin û li gorî agahiyên hin lêkolînerên wekî Malmîsanij û Mehmûd Lewendî weşana “*Jîn*”ê vê komeleyê hildaye ser xwe (Malmîsanij û Lewendî, 1992: 65-68).

2.10. Berhem û Pirtûkên Kurdî

Di vê serdemê de hejmara pirtûk û berhemên Kurdî yên ku derketine pir kêmtir in. Wekî ku me li jor jî dîyar kiribû di vê serdemê de heta sala 1923yan bi qasî ku hatine tesbîtkirin tenê 23 kitêbên Kurdî hatine çapkirin. Ev kitêb jî bi giştî bi alfabeya erebî ne

Eger ku em kitêba Maurizio Garzonîyê Îtalyanî ya bi navê “*Della Lingua Kurda(Gramer û Ferhengê Zimanê Kurdî)*” ku li ser zimanê Kurdî nivîsîye û di sala 1787an de li Îtalyayê çapkirîye danin aliyekî, kitêba yekem ku bi Kurdî hatîye çapkirin Wergera Încîlê ye ku di sala 1861an de bi alfabeya Ermenî li Stenbolê hatîye çapkirin (Malmîsanij û Lewendî, 1992: 33-35).

Ji xeynî van cara pêşîn bi alfabeya erebî di sala 1844an de li Stenbolê kitêbeke Kurdî hatîye çapkirin. Ev kitêb ya Mewlana Xalidê Neqşîbendî ye ku ev jî bi temamî Kurdî nîne, ji menzûmeyên erebî û farisî pêk tînin hinek ji wan jî Kurdî ne. Piştê salên 1908an heta dawîya damezrandina Komara Tirkîyê bi qasî 20 kitêbên Kurdî tînin çapkirin. Di sala 1909an de ji aliyê Xelîl Xeyalî ve alfabeke ji herfên erebî ji bo Kurdî bi navê *Elîfbaya Kurmancî* tê çapkirin. Her wisa di sala 1919an de *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî tê çapkirin Bi kurtasî eger ku mirov bêje, di serdema

Osmanîyan de bi alfabeyên cuda bi temamî 30 kitêbên Kurdî hatine çapkirin (Malmîsanij û Lewendî, 1992: 33-43).

2. 11. Xebat û Berhemên Edebî û Hunerî

Dema ku em bala xwe didin van sazî û weşanên Kurdan meriv dibîne ku ev bi giştî di çarçoveya fikr û armancên sîyasî de û ji aliyê kesayetî û rewşenbîrên sîyasî ve hatine pêkanîn. Lê di heman demê de bi wan sazî û weşanan re hewldanên xebatên edebî û çandî jî dest pê kirine û hin berhem derketine. Em dibînin ku kurteçîroka pêşîn, şanoya pêşîn û materyalên perwerdehîya Kurdî ên pêşîn di vê demê de tên çapkirin.

Kurteçîroka pêşîn ya Kurdî di vê serdemê de ji aliyê Fuat Temo ve hatiye nivîsîn û di hejmarê 2'yem ya *Rojî Kurd* de hatiye çapkirin (*Rojî Kurd-1913*, (2013), Stenbol: 155). Şanoya pêşîn ya Kurdî *Memê Alan* jî di vê serdemê de ji aliyê Evdîrehîm Rehmîyê Hekarî ve hatiye nivîsîn û di hejmarên 15-16 yên kovara *Jînê* de hatiye weşandin (*Jîn*, (1988), Uppsala: 16-16). Her wisan hindê helbestên şairên Kurd jî di van kovar û rojnameyan de hatine weşandin.

Di vê serdemê de di gel ku hejmarek kovar û rojname hatine çapkirin jî lê mirov zêde rastî pirtûkên Kurdî nayê. Di nav pirtûkên ku wê demê hatine çapkirin de jî berhemên edebî û hunerî pir kêman in.

Di vê demê de tenê 1-2 pirtûkên edebî yên Kurdî tên çapkirin ku ya gîring jî *Mem û Zîna* Ehmedê Xaniyê ku di sala 1919an de ji aliyê Komeleya Kurdan a Belavkirina Zanî û Weşanan (Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti) ve bi pêşengîya Hemzeyê Miksî hatiye amadekirin û çapkirin (Xanî, 1995: 92-93). Yek jî berhemên edebî ku wê demê hatiye çapkirin jî kitêba helbestan *Gazîya Welat* e ku ji aliyê Ebdurehîm Rehmîyê Hekarî ve hatiye nivîsîn (Serfiraz, 2015: 153-158).

BEŞ III

DAMEZRANDINA KOMARA TIRKÎYEYÊ Û REWŞA KURDÎ

3.1. SERDEMA 1923-960 REWŞA XEBATÊN REWŞENBÎRÎ YÊN KURDÎ

3.1.1. Rewşa Sîyasî ya Kurdî Li Tirkîyeyê

Li dû belavbûna dewleta Osmanî li herêmê dewletên nû ava dibin. Heta wê demê Kurd di nav sînorên Osmanî û Îranê de bûn, piştî hingê Kurd di nav sînorên Tirkîye, Iraq, Îran û Sûrîyeyê de dabeş dibin. Piraniya Kurdan di nav sînorê Tirkîyeyê de dimînin. Ev herçar dewlet jî li gorî xwe sîyaseteke taybet li ser Kurdan didin meşandin.

Piştî ku Împaratoriya Osmanî belav dibe rewşa Kurdan gelek xirabtir dibe. Di dema Osmanîyan de li ser zimanê Kurdî bi giştî qedexe tunebûye. Di gel ku çend rojname û kovarên ku di wê demê de hatine weşandin hatibin qedexekirin jî lê ji ber naveroka wan ya sîyasî bûye (Malmîsanij, 2006: 33-43).

Piştî damezrandina Komara Tirkîyeyê pê ve, dewleta Tirkîyeyê bi taybetî li ser Kurdan sîyaseta ku wekî “jenosîda ziman” (linguistic genocide) tê bi nav kirin meşandîye.

Li ser vê yekê Amîr Hassanpour wiha şîrove dike:

“Komara Tirkîyeyê ya ku kete şûna dewleta Osmanî bi şikleke gelek navendîparêz li ser etnîsîteya Tirk wekî netewedewlet hate damezrandin. Li beranber zexta navendîkirin û Tirkkirinê di navbera salên 1925 heta salên 1938an de rêzek serhildanên Kurdan çêbûn û ev serhildan bi tundî hatin perçiqandin.

Ji ber ku li vî welatî Kurd koma herî mezin ya ku ne Tirk bûn, sîyaseta dewletê ew bû ku di nav demeke dirêj de Kurdan bihelîne. Ji bo ku dewlet vê sîyaseta xwe pêk bîne jî di nav salên 1920 heta salên 1940an de li gelek deran piştî her serhildanek li ser Kurdan jenosîd pêk anîn û bi sedhezaran Kurd bi darê zorê ji Kurdistanê derxistin û li herêmên ku Tirk lê dijîn belav kirin û

koçberên ku ji aliyê Ewropayê anîn li herêmên Kurdistan bi cih kirin” (Pour, 2005: 229-230).

Di vê serdemê de zimanê Kurdî bi temamî tê qedexekirin. Di 3 Adar 1924an de weşanên Kurdî tîn qedexekirin. Di sala 1925an jî qanûna Plana Îslaheta Şerqê(Şark İslahat Planı) tê derxistin û navê bajarên ku Kurd lê dijîn tîn dîyarkirin û li wan bajaran axaftina Kurdî tê qedexekirin.(Malmîsanij, 2006: 13) Ji bo ku Kurd mecbûr bin Tirkî bi axivîn sîyaseteke taybet tê bi pêş xistin ku di jîyana rojane de jî Kurd mecbûr bin ku bi Tirkî bi axivîn. Li cih û dezgehên dewletê pêkanîna vê pratîkê hêsan bû. Salên pêşîn ji bo ku ev qedexeya ziman pêk bê karmendan wezîfedar dikin. Mesela, tê zanîn ku dema gundîyan mal dianîn li bazarê difirotin eger ku bi Kurdî bi axivîna serê peyvê 5 quruş –ku ev çax bihayê mîyekê 50 quruş bûye- ceza lê dihat birrîn. Li dibistanan qedexa bû ku xwendekarên Kurd bi Kurdî bi axivîn û paşê jî li ser vê sîyaseta asîmîlasyonê li herêmên Kurdistan dibistaqên mecanî hatin avakirin da ku zarok ji malbatên wan bîrên dîrxistin û bîrên pişaftin. Her wisa hebûna Kurdistan bi temamî hat înkarkirin, tezeke nû ya dîroka Tirkan hat pêşxistin û di sala 1935an de bi navê “Güneş-Dil Teorisi”(Taorîya Roj-Ziman) teorîyekê hat pejirandin. Li gorî vê teorîyê Kurd wekî Tirkên çîyê, zimanê Kurdî jî wekî ku berhevokeke ji hin zimanên derdor pêkhatî hate pênasekirin (Pour, 2005: 230-231). Ji bo ku Kurd li xwe û li nasnameya xwe hişyar nebin di nav stratejîyêke dorfireh de gelek teknîk û rêbaz tîn bikaranîn. Li gel qedexeya axaftina Kurdî li ser materyalên nivîskî û hemû materyalên tomarkirinê yê bi Kurdî jî qedexeyek gelek diwar tê meşandin.

Ev sîyaseta Tirkîyeyê heta salên 1960an kêr zêde bi vî rengî berdewam dike. Di vê serdemê de rewşa Kurdistan li parçeyên di bin hukmê dewletên din de jî baş nîne. Tenê li Iraqê rewşa Kurdistan hinek cuda ye. Heta sala 1932 Iraq wekî fermî di bin desthilatdariya Îngilîzistanê de dimîne. Di vê demê de Îngilîz li gorî berjewendîyê xwe serê pêşîn rê didin zimanê Kurdî ku pêş bikeve. Lê paşê ev sîyaset diguhere û sîyaseta asîmîlasyonê tê meşandin. Lê piştî ku mafê kêmteweyên li Iraqê di qanûna bingehîn ya Iraqê de tê pejirandin hindêk derfetên pêşketinê ji bo Kurdî pêk tîn. Ji ber vê yekê jî li parçeya Iraqê xebatên Kurdî bêyî ku rawestin heta roja îro dewam dikin.

Li Îranê û –eger ku em serdema Komara Kurd ya Mehabadê lê nekin- li Sûriyeyê jî rewşa sîyaseta li ser Kurdî kêm zêde wekî sîyaseta Tirkîyeyê ye. Lê belê ji ber ku ev babet li dervayê mijara me ye em ê li ser ranewestin.

3.1.2. Di Serdema 1923-1960an de Rewşa Xebatên Rewşenbîrî Yên Kurdî

Di vê serdemê de gelek sîyametmedar, nivîskar û rewşenbîrên Kurd neçar dimînin ku ji Tirkîyeyê derkevin û xwe li derên cihê cihê bigirin. Rewşenbîrên Kurd piştî ku ji nav sînorên Tirkîyeya nû derdiçin ên ji Başûrê Kurdistanê bi giştî diçin xwe li herêma Başûr û Iraqê digirin ku di bin hukmê Îngilîzîstanê de bû. Ên ji bakur jî bi pirranî diçin xwe li Sûriye û Libnanê digirin ku ev dever jî di bin hukmê Fransayê de bû.

Di vê dema ku li bakur û Tirkîyeyê xebatên Kurdî di bin zexteke giran de bû heta salên 1950yan xebatên rewşenbîrîya Kurdî yên ku hatin kirin bi giştî li navendên wekî Şam, Silêmanî, Bexdayê û Beyrûdê hatin kirin. Di vê pêvajoyê de hejmarek kovar û rojname li van navendan hatin derxistin û gelek xebat li ser ziman, çand û edebîyata Kurdî hatin kirin. Di vê qonaxê de xebatên ku di kovarên wekî *Hawar*/1933-1951⁴, *Ronahî*/1942-1945⁵, *Roja Nû*/1943-1946⁶ de derketin xebatên gelek hêja bûn ji bo çand û zimanê Kurdî. Her wisa xebatên ku bi rêya kovarên wekî *Jiyane*/1923-1936, *Zarî Kurdistan*/1926-1932, *Gelawêj*/1932-1939 hatin kirin di warê ziman û edebîyata Kurdî de gavên gelek giring in (Uzun, 2003: 38). Disa di vê pêvajoyê de li Ermenistana Sovyetê jî bi weşandina rojnameya *Rêya Teze* (Destpêk 1930), re gelek xebatên hêja ên li ser ziman, çand û edebîyata Kurdî hatine kirin (Uzun, 2003: 48). Romana Kurdî ya pêşîn, bingeha xebatên li ser rêziman û îmlaya Kurdî bi giştî di vê qonaxê de tîr destpêkirin.

Li bakur û Tirkîyeyê ev tevgera rewşenbîrî ya ku serê sedsalê li Stenbolê dest pê kiribû piştî belavbûna dewleta Osmanî û avakirina Komara Tirkîyayê di encama gelek alozî, pevçûn û tîkçûnan de bi temamî ji holê rabû û heta salên 1970an ji bilî hin hewldan û gavên salên 1960an li bakur û Tirkîyayê mirov tu tevgera Kurdan ya

⁴Kovara *Hawarê*, ku di navbera salên 1933-1951ande hatibû weşandin ji aliyê Weşanên Nûdemê ve li Stockholmê di sala 1998an de hetîye çapkirin..

⁵*Ronahî*, 1942-1945, Şam (Ji Kopyaya Arşîva Weqfa Îsmail Beşikçi, Stenbol).

⁶*Roja Nû*, 1942-1946, Beyrût, (Ji Kopyaya Arşîva Weqfa Îsmail Beşikçi, Stenbol).

çandî an jî rewşenbîrî ku wicûd dîtibe nabîne. Di gel ku di vê serdemê de li başûr û Iraqê û li Sûriye û Lubnanê hindê xebat û berhemên rewşenbîrî hatibin pêkanîn jî lê di vê serdemê de li bakurê Kurdistan û Tirkîyê bi zimanê Kurdî hema bigir tu berhemek dernakeve û tu weşanek pêk nayê. Bi taybetî qedexeyeke giran li ser zimanê Kurdî tê meşandin. Eger rêzek jî Kurdî di weşanek de derkeve ev dikare bibe sedema lêpîrsîn an jî girtinê.

Di vê qonaxê de Mûsa Anter di rojnameya *Îlerî Yurtê* de -ku ev rojname ji aliyê Mûsa Anter ve li Dîyarbekirê bi zimanê Tirkî hatîye derxistin- dema ku cih dide hin rêzikên Kurdî ev di çapemenîya Tirkîyê de dibe rojev û sedema lêpîrsînê. Lê piştî ku Mûsa Anter di hejmara *Îlerî Yurtê* ya ku di mêjoya 31.08.1959an hat weşandin de cih dide helbesteke Kurdî “*Qimil*” hingî çapemenîya Tirkîyê reaksiyoneke mezin nîşan dide û li ser vê di heqê Mûsa Anter de doz tê vekirin. Ev yek li nav xwendekarên Kurd jî dengê mezin vedide û gelek xwendekar piştgirîya xwe bi Mûsa Anter re didin nîşan (Anter, 1991, 142-145). Ev mesele her ku diçe di çapemenîyê de tê mazinkirin û piştî gelek rûdan û mehkemeyan Mûsa Anter û berpirsyarê karê nivîsan Canîp Yildirim tînin girtin (Temel, 2015, 54-60). Di gel ku di vê helbesta bi navê “*Qimil*” de tu naverokeke şîyasî tune ye jî dîsa jî ji ber ku Kurdî ye helwesteke tund tê nîşandan. Ev jî rewşa şîyasî ya wê serdemê û rewşa zemîna kar û barên li ser Kurdî gelek zelal rave dike. Ji bo ku mesele baştir bê fêmkirin em beşek ji vê helbestê li jêr bidin.

*“Bi çîya ketin lo apo, çîya melûl bûn rebeno
Ceh seridîn lo apo, genim hûr bûn evdalo
Qimil hatî lo apo, bi refa ye rebeno
Xwar genimî lo apo, hiştî giya rebeno
Hat qimil lo apo, ji zozana lo apo
Xwar genimê me xêzana lo apo”*

3.2. Serdema 1960-1980 Rewşa Xebatên Rewşenbîrî yê Kurdî

3.2.1. Rewşa Sîyasî

Di salê 1960an de di gel ku hindê guherîn li Tirkîyeyê pêk tên û hin hewldanên rewşenbîrî yê Kurdî çêdibin jî lê zêde tiştek berbiçav dernakevin holê. Lê pişt re di encama hin guherîn û pêşketinên li Tirkîyeyê de di salên 1970'de gelek tevgerên Kurd yê sîyasî û xebatên rewşenbîrî derketin meydanê û pêvajoyeke nû dest pê kir. Lê belê ji bo ku mirov bikare asasê pêşketinên salên 70yan rave bike divê ku mirov berê xwe bide deh salên berî 70 û dîsa rewşê li gel rewşa sîyasî binirxîne.

Salên 1960an ji du aliyên ve gelek girîng in. Ji ber ku ji aliyek ve di wan salan de li Tirkîyê nîqaş û guftogoyên sîyasî di gel tevgerên girseyî pêş dikevin, li aliyê din jî di zemîna legal û gelemperî de cara pêşîn pêvajoya pêkhatina tevgera Kurd li bakur careke din di van salan de dest pê dike.

Ev pêvajoyê bi derbeya leşgerî ya sala 1960an dest pê dike. Piştî ku deh salan hukumeta Menderes Tirkîyê îdare dike 27'ê Gulana 1960an derbeya leşgerî pêk tê û sala 1961'ê qanûneke bingehîn ya nû tê çêkirin û dikeve meryetê. Ji ber ku ev qanûn hinek rêyên demokratîk û derfetên avakirina sendîkayan li pêşîya civakê vedike di van salan de cara pêşîn tevgerên sîvîl derdikevin ser qada legal û saziyên xwe ava dikin. Cara pêşîn partiyeye sosyalîst bi navê Partîya Karkerên Tirkîyeyê (Türkiye İşçi Partisi/TİP) di sala 1961'ê de tê damezrandin. Ev partîya ku ji aliyê serokên 15 sendîkayan ve tê avakirin di demeke kurt de destekeke girseyî digire. Piştî demek di nav TİP'ê de guft û go dest pê dikin û di encama vê de rengên cihê ên tevgerên sosyalîst derdikevin û rêxistinên xwe ava dikin (Temel, 2015: 146).

Di vê pêvajoya nû de ji aliyek ve tevgerên sosyalîst derdikevin meydanê, ji aliyek din de jî çavkaniyên lîteratora sosyalîst tên wergerandin û sînorên azadîyê hinek fireh dibin. Lê ji aliyê Kurdan ve rewş bi heman rengê nîn e. Di van salan de mirov dikare bêje ku zexta li ser Kurdan zêdetir dibe. Piştî derbeya leşgerî ya 1960an kiriyara cuntayê ya pêşîn ew e ku 350-500 (li gori hin çavkaniyan 385) kesên li pêş ên ji axa û malnezinên Kurdan digirin dibin kampeke li Sêwazê û paşê jî 55 kes ji wan sîrgûnê bajarên rojavayê Tirkîyeyê dikin (Temel, 2015: 102).

Her wisa Lijneya Yekîtiya Neteweyî (Millî Birlik Komitesi) ku derbeyê pêkanîye, piştî derbeyê efûyek derdixe lê ew rewşenbîrên Kurd yên ku di demên dawî yên hukumeta Partîya Demokrat ya Adnan Menderes (Demokrat Parti/DP) de hatine girtin û bi navê 49an tînan zanîn li dervayê vê efûyê tînan hiştin. (Sala 1959an parlamenterê Nîgdeyê Asim Eren li ser bûyerên ku di Nîsana 1959an de li Kerkûkê qewimîne di axaftina xwe ya li meclisê de bang li meclisê dike û dibêje ku Kurd li Iraqê Tirkmenên hemnîjadên me dikujin, divê heyfa wan ji Kurdên Tirkiyê bê sitandin. Ev yek ji aliyê xwendekarên Kurd ên zanîngehê ve bi nerazîbûn tê pêşwazîkirin. Li ser vê yekê 77 xwendekar bi şandina tîlgrafan vê yekê protesto dikin. Ku ev çalakî di hejmara rojnameya *Milliyet*, 12 Nisan 1959: 2 de tê weşandin. Li ser vê di Berfanbara 1959an de di gel hin ji wan xwendekarên ku beşdarê protestoyê bûne 50 rewşenbîrên Kurd tînan girtin. Ji ber ku yek ji xwendekarên girtî dimire 49 kes girtî dimînin ev bûyer wekî bûyera 49an nav lê tê kirin. Paşê ev bûyer di pêvajoya avabûna tevgera Kurd de wekî xaleke girîng tê nîrxandin (Temel, 2015: 61).

Dîsa yek ji biryarên pêşîn ên vê lijneyê jî li Tirkî veguherandina navên Kurdî yên gund û bajarên Kurdistanê bû (Akkaya, 2013: 32). Di vê serdemê de divê ku mirov behs bike ku hêj ew derfet tunebûn ku behsa meseleya Kurdan bê kirin û xebatên Kurdî bînin derxistin. Lê tenê dikariya behsa paşvamayîna rojhilat bê kirin. Bi rêya gotin û parastina pêşketina rojhilat dikariya bala Kurdan bê kişandin û dengên Kurdan bînin girtin.

Piştî derbeya leşgerî ku Partîya Demokrat (DP) tê girtin di serî de wezîrê tendurustiyê Yûsûf Azîzoglu û hin kesayetiyên girîng yên Kurd di nav Partîya Nû ya Tirkiyeyê (Yeni Türkiye Partisi/YTP) cih digirin. Ev partî ji ber ku li ser paşvamayîna û pîrsgirêkên aborî ên rojhilat disekinî û hewldanên wan ên ji bo xizmetbirina rojhilat hebû di hîlbiyartina 1961 de ji Kurdan destekeke mezin girt û li tevahiya Tirkiyeyê %13.7 deng girt û di 16 bajarên Kurdan de bû partîya yekem. Ji ber vê rewşê ev partî ji aliyê hinek derdorên ve wekî partiyeke Kurdan hat dîtin. Lê belê li gorî hin kesan jî YTP terafdarê nasnameyeke Kurdî nebûye; tam berevajiyê wê terafdarê entegrasyona Kurdan ya bi civaka Tirk ve û herwisa jî terafdarê wê asîmîlasyonê bûye ku bi dilxwazî kûr dibû (Akkaya, 2013: 34).

Ji aliyek ve jî her ku diçû hejmara xwendekarên Kurd zêde dibû. Di gel vê jî hejmara sîyetmedar û rewşenbîrên Kurd jî zêde dibû. Her wisan jî hewldanên lêgerînên sîyasî û çandî jî zêde dibûn. Di van salan de di encama van lêgerînan de hinek komên sîyasî pêk tên û ger di zemîna legal de ger jî di zemîna îlegal de hinek gavên rêxistinî tên avêtin. Di vê demê de gava pêşîn ji aliyê wan rewşenbîr û sîyasetmedarên ku bi rengekî peywendîyên wan bi Partîya Demokratî Kurdîstan/PDK'ya Iraqê(Barzanî) re hebû ve tê avêtin û di sala 1961' de li Bakurê Kurdîstanê wekî nûnerîyeke PDK'ya Iraqê tê avakirin û li devera Botan dest bi xebatên rêxistinî tên kirin. Lê piştê demeke kurt ev nûnerî ji aliyê PDKI' ve tê betalkirin. Paşê hewladên serbixwe ên sîyasetmedarên Kurd ên bakur didomin. Pişt re di sala 1965an de ji aliyê sîyasetmedarên wekî Saîd Elçî, Faîk Bucak Ömer Turhan û hin kesên din ve bi awayekî ilegal Partîya Demokrat a Kurdîstan ya Tirkîyê(PDKT) hate avakirin (Temel, 2015: 160).

Li aliyê Metropolên Tirkîyê jî ew sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd ku bêtir di bin tesîra fikrên sosyalîstî de mabûn bi çepgirên Tirk re tev gerîyan û di nav Partîya Karkerên Tirkîyê(Türkiye İşçi Partisi/TİP) de cih girtin (Temel, 2015: 160).

Ev Kurdên ku di nav TİP'ê de cih digirin ji bo ku xwe bir ê bixin li bajarên Kurdan xebatên xwe bi pêş dixin. Serê pêşîn li ser navê têkoşîna li hember feqîrî û bêkarîyê xwe eşkere dikin û di sala 1967an de di bin xebatên sîyasî yên TİP'ê de li hin bajarên Kurdan mîtîng tên li darxistin û daxwazîya pêşxistina rojhilat tê kirin. Di hin axaftinan de jî bi awayekî endîrek pîrsa Kurdî jî tînin rojevê. Di vê demê de mîtînga pêşîn di 13 Tebax 1967an de li Farqînê(Sîlvan) tê li dar xistin. Paşê li du wê di heman salê de li pey hev, mîtîngên Dîyarbekir, Siwêrek(Siverek),Batman, Dersim(Tunceli), Agirî(Ağrı) û li Enqereyê tê li darxistin û ev mîtîng di salên din de jî heta salên 1971-72 li bajarên cuda yên Kurdan tên birêvebirin. Herwisa li gelek bajaran şevên sîyasî û çandî jî tên li dar xistin. Di vê pêvajoyê de li bajarên Kurdan tevgera qumendo jî tê destpêkirin û li gelek gund û bajaran qumendo cerdê dikin li ser Kurdan gelek zext û pêkutê pêk tên. Li ser van yekan nerazîbûna Kurdan jî her ku diçe zêdetir dibe.

Paşê di vê pêvajoyê de her ku diçe nîqaşên fikrî di navbera van sîyasetmedarên Kurd de zêde dibin û di nav çend salan de hêdî hêdî rengên cuda yê sîyaseta Kurdan xwe didin der (Temel, 2015: 196-217).

Bi aweyek ku mirov bibêje, di vê pêvajoyê de kesên li der û dorê medreseyan Kurdistanê xwe nêzîkî PDKT'yê dikin û ewên der û dorê zanîngehan jî ji ber ku li gel çepgirên Tirkîyê fikrên sosyalîstî nas kiribûn bêtir bi TÎP'ê re tev digerin. Lê belê ji ber ku ew Kurdên çepgir û sosyalîst zêde nikarin xwe di nav çepgirên Tirk de îfade bikin lêgerîna wan her didome. Paşê piştî çend teşebûsên cihê di encam de di sala 1969an de li Enqereyê pişt re jî li Stenbolê û dû re jî li hin bajar û navçeyên Kurdistanê bi navê Ocaxên Şorişger ên Çandî ên Rojhilat(Devrici Doğu Kültür Ocakları/DDKO) komele tên vekirin. Di vê pêvajoyê de gelek komeleyên xwendekaran jî bi mebestên hevkarî an jî çandî ji aliyê xwendekarên Kurd ên zanîngehan ve tên vekirin. Lê DDKO di ser van hemû komeleyan re bi armanceke sîyasî û neteweperwerî tê avakirin. Nîyet ew e ku wekî konfederasyonek bê birêxistin lê ev armanc zêde bi ser nakeve.

Di vê demê de ji aliyê hin kesan ve hin nivîs û helbestên ku bi aweyekî sergirtî amace bi pirsgirêkên Kurdan didan bi Tirkî tên nivîsîn û di civîn û çalakîyan de dihatin xwendin. Li çend cîyan jî şano tên pêşkêşkirin (Temel, 2015: 198-227).

Paşê wekî bûlteneke ji aliyê DDKO'yê ve weşaneke mehane jî tê weşandin. DDKO hêj ku zêde nebibû bingeheke rêxistinî bi derbeya leşgerî ya 12'yê Adarê 1971'ê re tê girtin û endamên wê tên girtin û mehkemekirin û gelek sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd tên girtin.

Piştî sala 1974an dema ku ew sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd ji hepisxaneyan derdikevin li Tirkîyeyê rewşa sîyasî hinek aramtir e. Di vê qonaxê de ev rewşenbîr û sîyasetmedarên Kurd dest pê dikin komeleyên bi rengî DDKO'yê ava dikin. Paşê di bin banê van komeleyan de, di qonaxên pêş de tevger û partiyên sîyasî ên legal û îlegal derdikevin meydanê.

Di vê pêvajoyê de komeleya pêşîn di sala 1974an de li Îzmîrê di bin navê "İzmir Doğu Yardımlaşma ve Kültür Derneği/İz-DYKD"(Komeleya Çandî û Alîkarîya Rojhilat) de tê avakirin. Paşê hema li pey wê di heman salê de li Enqereyê komeleya "Devrimci Demokratik Kültür Derneği/DDKD"(Komeleya Şoreşger û Demoratîk ya Çandî) tê avakirin. Paşê li ser fikr û helwestên cuda komên nû

derdikevin û kom û komeleyên wekî DHKD, Komal-Rizgarî, Ala Rizgarî, Kawa derdikevin. Heta derbeya leşgerî ya sala 1980yan gelek komên din jî derdikevin û hinek ji van koman tevgerên xwe mezin dikin, legal û îlegal xebatên xwe bi pêş dixin û hinek ji wan jî bi aweyekî îlegal xwe wekî partî bi rê dixin.

Di vê qonaxê de dema ku em bala xwe didinê ji xwe xebatên çandî û edebî yên Kurdî jî hemû ji aliyê van kom û tevgerên sîyasî ve tên pêkanîn (Temel, 2005: 196, 293-312).

3.2.2. Xebatên Li Ser Çand û Edebîyata Kurdî Yên Pêşîn Ên vê Qonaxê

Di vê serdemê de ji aliyê xebatên çandî û rewşenbîrîyê de mirov ji xeynî çend nimûneyan rastî tiştek nayê. Wekî ku me li jor jî behsa wê kiribû, di sala 1959an de rojnameyek bi navê *Îlerî Yurt* ji aliyê Mûsa Aanter ve bi zimanê Tirkî tê weşandin, ji ber ku di rojnameyê de çend rêzikên bi Kurdî dertên li ser wê di heqê nivîskarê wan rêzikan Mûsa Anter de doz tê vekirin. Yanî di vê pêvajoyê piştê komarê de demeke dirêj, tu derfet û zemînek ji bo xebatên Kurdî nîn e.

Ji sala 1923 heta sala 1965an li Tirkîye û bakurê Kurdistanê tenê du pirtûkên Kurdî karî bî çapkirin ku ew jî pirtûkên dînî yên bi alfabeya erebî bûn. Piştî bêdengîya 40 salan cara ewil di sala 1965an de ji aliyê Mûsa Anter ve pirtûka pîyesê ya *Birîna Reş* ku di hepisxaneyê de nivîsîbû tê çapkirin. Di heman salê de pirtûkeke Kurdî ya li ser gramerê jî ku ji aliyê Kemal Badilli ve hatibû nivîsîn hate çapkirin. Pişt re heta sala 1970 tu pirtûkeke Kurdî dernakeve. Sala 1970yan 3 pirtûkên din jî tên çapkirin. Lê piştî ku di sala 1971an de derbeya leşgerî çêdibe heta sala 1975an tu pirtûkeke bi Kurdî dernakeve (Malmîsanij, 2006: 44-47).

Piştî derbeya 1971an li ser girtin û mehkemekirina rewşenbîr û sîyasetmedaran çend sal xebat û lebatên sîyasî û rewşenbîrî rawestîyane. Piştî çend salan ku ew girtîyên doza DDKO'yê derdikevin û rewş hinek aram dibe ev xwendekar, rewşenbîr û sîyasetmedarên Kurd ji sala 1974 pê ve bi lez û bez dikeven nav hewldanên rêxistinî û hin komên sîyasî derdikevin meydanê. Di vê serdemê de ger legal û ger jî îlegal hin komele û tevgerên sîyasî û çandî tên birêxistin û dest bi kovar û weşanên sîyasî û çandî tê kirin. Di vê serdemê de hin komên ku bi armanca partîbûnê bi rê ketibûn, hin kovaran wekî *Özgürlük Yolu* (Rêya Azadî), *Rizgarî*,

Kawa, Pêşeng Ji Bo Şoreş, Xebat Bona Yekbûn û hwd. derxistin û hin komeleyan wekî, DDKD, DHKD, ASK-DER û hwd. ava kirin û paşê bi van navan hatin naskirin (Temel, 2015: 298, 299).

Ev tevger û komeleyên sîyasî piştî ku xwe bi rê dixin û hinek bi hêz dibin, li gel xebatên wan ên sîyasî di warên çandî û edebî de jî hin xebat û hewldan derdikevin meydanê. Di van salan de di gel hejmarek kovarên teorîk û sîyasî hin xebatên çandî, hunerî û edebî jî hatin kirin. Her yek ji van tevger û komên sîyasî weşaneke wan ya sîyasî û teorîk hebû. Carina di van weşanên wanên teorîk de hin babetên çandî û edebî û hin nimûneyên Kurdî jî derdiketin. Lê piştî demekê êdî hewldanên taybet ên li ser çand û edebîyatê jî dest pê kirin.

Di sala 1975an de ji aliyê alîgirên koma Rizgarîyê ve bi armanca danasîna çand û dîroka Kurdî weşanxaneyê Komal tê avakirin û hin xebatên çandî û lêkolîni tîrêjî çapkirin. Di salên navbera 1975 û 1980an de gelek weşanên wekî kovar û rojname ji aliyên van kom û tevgeran ve tîrêjî derxistin. Hinek ji wan weşanan ev in. Rojnameya *Roja Welat*, di gel kovara *Özgürlük Yolu*⁷ ji aliyê koma Özgürlük Yolu (Rêya Azadîyê) yê ve, tê derxistin. Ji aliyê alîgirên koma DDKD'ê ve *Pêşeng Bo Şoreş* û kovara *Tîrêj*⁸ tê derxistin, ji aliyê koma Kawa ve *Kawa û Dengê Kawa*⁹ ji aliyê koma Rizgarî ve *Rizgarî*¹⁰ ji aliyê koma Ala Rizgarî ve *Ala Rizgarî*¹¹ ji aliyê Partîya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyê ve *Xebat û Xebat Ji Bo Rizgariya Kurdistan*¹² û her wisan gelek weşanên din jî tîrêjî weşandin. Di van weşanan de hin nivîs û berhemên çandî edebî jî derdixin û her wekî din jî hin berhemên edebîyata Kurdî jî di van salan de di bergehê van xebat û lebatan de tîrêjî çapkirin (Malmîsanîj û Lewendî, 1992: 274).

Di van salan de di nav xebatên weşan û çapemenî de bi taybetî kovar ciheke pîr girîng digirin. Hema hema temamiya van kovar û rojnameyan naveroka wan zêdetirîn li ser babetên sîyasî û teorîk bûn. Lê eger em ji aliyê çandî û edebî ve bala xwe bidinê di van salên navbera 1970-1980an li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyê cara

⁷ Weşana Tevgera bi navê “Özgürlük Yolu”yê (Rêya Azadî) ye ku paşê ev tevger xwe wekî Partîya Sosyalîst ya Kurdistanê birêxistîye.

⁸ Ev herdu kovar ji aliyê rêxistinê DDKD'yê ve tîrêjî weşandin. *Pêşeng* organa sîyasî ye lê *Tîrêj* kovareke çand û edebî ye.

⁹ *Kawa û Dengê Kawa*, kovarên rêxistinê Kawa ne.

¹⁰ *Rizgarî* organa rêxistinê Rizgarîyê ye.

¹¹ Kovara *Ala Rizgarî* organa tevgera Ala Rizgarî ye.

¹² *Xebat Ji Bo Rizgariya Kurdistan* organa PDKT'yê ye.

ewil kovara *Tîrêj* wekî destpêk ceribandineke girîng e. Kovara *Tîrêj* di sala 1979an de li Îzmîrê dest bi weşanê kirîye. Di van salan de ev kovara pêşîn e ku hemû bi Kurdî û wekî kovareke çandî hunerî hatîye weşandin. Di vê kovarê de di gel zaravayê kurmancî hin nivîsarên bi zaravayê dimilî jî derketine. Lê piştî derbeya leşgerî ya 1980 êdî nikare bê derxistin, tenê 4 hejmarên wê derdikevin. 3 hejmarên wê li Îzmîrê hejmarek wê jî li Stockholmê tê çapkirin (Malmîsanîj û Lewendî, 1992: 274). Di vê kovarê de gelek nivîsarên çandî, helbest û kurteçîrok derdikevin. Mirov dikare bêje ku di vê serdemê de helwesta modern ya çandî û edebî cara pêşîn bi vê kovarê re xwe dide der.

Di van salan de dîsa bi pêşengîya hin sîyasetmedar û rewşenbîrên li zemîna wan kom û tevgerên sîyasî çend weşanxaneyên wekî Komal, Koral, Özgürlük Yolu, Yöntem, Kawa û Pêkanîn jî hatin avakirin û gelek pirtûk jî hatin çapkirin. Di gel gelek pirtûkên li ser meseleya Kurdî yên bi zimanê Tirkî, hin pirtûkên Kurdî jî hatin çapkirin.

Heta sala 1965an ji xeynî 2-3 pirtûkên Kurdî yên bi tîpên erebî tu pirtûkeke Kurdî li bakurê Kurdistanê û li Tirkîyê nehatîye çapkirin. Cara pêşîn di sala 1965an de pirtûka "*Birîna Reş*" ya Musa Anter tê çapkirin. Di vê navberê de heta sala 1975an mirov di warê Kurdî de hema bigir rastî tiştek nayê. Paşê piştî 1975an di gel pêşketina xebatên sîyasî gelek pirtûkên li ser mesela Kurdî û çendek pirtûkên çandî û edebî yên Kurdî jî derdikevin. Di vê serdemê de ji aliyê hin tevgerên Kurdî ve çend weşanxane jî tên vekirin û bi giştî bi zimanê Tirkî gelek pirtûkên li ser Kurdan tên çapkirin. Bi qasî ku tê zanîn di vê serdemê de heta salên 1980yan li Tirkîyeyê bi piranî ji aliyê weşanxaneya tevgera Rizgarî û Özgürlük Yolu(Rêya Azadî)'yê ve bi qasî 55 pirtûkên Tirkî ên li ser Kurdan û meseleya Kurdan tên çapkirin.

Pirtûkên Kurdî ên wekî *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer* (Rêzimana Kurdî ya Bi Şîroveya Tirkî) ya Kemal Badilli, *Kürtçe Alfabe* (Alfabeya Kurdî) , *Mem û Zîn* ya Ehmedê Xanî, *Şivanê Kurd* ya Erebe Şemo(Ji Kurdên Qafkasan e, nivîskarê romana pêşîn ya Kurdî ye), *Meyro* ya M. Emîn Bozarşan, *Kulîlkên Çiya* ya Eskerê Boyîk (Ji Kurdên Qafkasan e), *Li Bandeva Spêde* ya Rojen Barnas di vê serdemê de tên çapkirin (Temel, 2015: 360-365).

Wekî ku me li jor jî dîyar kiribû di vê serdemê de ew rewşenbîr û helbestvan û wêjevanên wê serdemê ji nav van liv û tevgerên sîyasî derdikevin. Heryek ji wan

yan di heman demê de endamê tevgereke sîyasî ye yan jî nîzîkî tevgerek e û pê re tev digere. Ji xwe berhemên wan jî bi giştî ji aliyê weşanxaneyên van tevgeran ve tîn çapkirin. Ji ber vê rewşê jî wekî çandekê xebatên li ser zimanê Kurdî an jî edebîyata Kurdî zêde pêş nakeve. Heta ku derbeya leşgerî ya 1980 pêk tê ev rewş wiha ye. Piştî derbeya leşgerî ya 12 Êlûna 1980yan ev hemû xebatên sîyasî û çandî û edebî yên Kurdan tîn qedexekirin û demeke dirêj ji xeynî hin hewldanên takekesî yên bi dizî tiştêk li meydanê namîne heta salên 1990an.

3.3. Berhemên Ziman û Edebî Ên Vê Demê û Naveroka Wan

3.3.1. *Kürtçe Sözlük*-Mûsa Anter

Ev ferhenga Tirkî-Kurdî ya bi navê *Kürtçe Sözlük*(Ferhenga Kurdî) ji aliyê Musa Anter ve hatîye amadekirin û di sala 1963an de hatîye çapkirin (Temel, 2015: 360-365).

3.3.2. *Birîna Reş*-Mûsa Anter

Ev berhem ji pîyesa bi navê *Birîna Reş* pêk hatîye. Pirtûk ji aliyê Mûsa Anter ve di hatîye nivîsîn, cara pêşîn di sala 1965an de hatîye çapkirin (Temel, 2015: 360-365). Mûsa Anter vê berhemê di girtîxaneyê de nivîsîye. Li gorî gotina Mûsa Anter wî li ser daxwaza hevrêyên xwe di şevêk de ev berhem nivîsî ye (Anter, (1991) Stockholm: 191). Naveroka pîyesê li ser êş û derdên Kurdan ên wekî feqîrî, nexweşî û cehaletê ye.

3.3.3. *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer* -Kemal Badilli

Ev pirtûk bi navê *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*(Rêzimana Kurdî ya Bi Şîroveya Tirkî) li ser rêzimana Kurdî ye. Ji aliyê Kemal Badilli ve hatîye nivîsîn û di sala 1965an cara pêşîn hatîye çapkirin. Kemal Badilli hewl daye ku gramera zimanê Kurdî bi Tirkî şîrove bike (Temel, (2015), İstanbul: 360-365).

3.3.4. *Kürtçe Alfabe* - M. Emîn Bozarşlan

Ev pirtûka bi navê *Kürtçe Alfabe*(Alfabeya Kurdî) alfabeya Kurdî bi şîroveya Tirkî dide nasîn. Ji aliyê M. Emîn Bozarşlan ve hatîye amade kirin di sala 1968an de hatîye çapkirin (Temel, 360-365).

3.3.5. *Mem û Zîn-Ehmedê Xanî*

Ev berhema Ehmedê Xanî ku di sedsala 17an de hatîye nivîsîn cara pêşîn bi herfên latînî li Tirkîyê ji aliyê Mehmet Emîn Bozarşlan ve di sala 1968an de hatîye çapkirin (Temel, 360-365). Ev berhema Ehmedê Xanî di nava edebîyata klasîk a Kurdî de wekî şaheserek tê zanîn. Ehmedê Xanî vê berhema xwe li ser destana gelêrî ya Kurdî *Memê Alan* bi şêweya mesnewî honandîye. Ehmedê Xanî di gel evîna Mem û Zîn li ser gelek babetan fikr û şîretên xwe jî di vê berhemê de derbirrî ye.

3.3.6. *Meyro-M. Emîn Bozarşlan*

Meyro pirtûkeke kurteçîrokane e ku ji aliyê Memet Emîn Bozarşlan ve hatîye nivîsîn û cara pêşîn di sala 1968an de hatîye çapkirin (Temel, 360-365). Girîngîya vê berhemê ew e ku di vê qonaxê de bi van nimûneyan re careke din derî li xebatên edebîyata Kurdî ya nûjen vedibe û xebatên çanda Kurdî bi pêş dikeve (Temel, 360-365).

3.3.7. *Zimanê Kurdî- Kamuran Bedirşan*

Ev pirtûka li ser ziman û gramera kurmancî di sala 1976an de li Tirkîyeyê hatîye çapkirin. Kitêb ji aliyê Kamuran Bedirşan ve hetîye amadekirin.(Temel, 360-365).

3.3.8. *Şivanê Kurd-Ereb Şemo*

Ev romana ku ji aliyê Ereş Şemo ve hatîye nivîsîn cara pêşîn di sala 1932an de li Ermenistanê hatîye çapkirin. Ev berhema Ereş Şemo ya bi navê *Şivanê*

Kurd(Paşê bi navê *Şivanê Kurmanca* hatîye çapkirin ku navê rastî wisan e.) di nav edebîyata Kurdî ya nûjen de ciheke wê ya girîng heye. Ji ber ku ev roman yekemîn romana Kurdî ye. Naveroka romanê hinek vekî biyografyaya nivîskarê romanê ye. Ev pirtûk di sala 1977an de hatîye çapkirin (Temel, 360-365).

3.3.9. *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer* -Kamuran Alî Bedirxan

Ev pirtûka ku bi navê *Türkçe İzahlı Kürtçe Gremer*(Gramera Kurdî Bi Şîroveya Tirkî) derketîye gramera kurmancî ku bi Tirkî şîrove dike. Kitêb ji aliyê Kamuran Alî Bedirxan ve hatîye nivîsîn di 1978an de hatîye çapkirin (Temel, 360-365).

3.3.10. *Kürtçe Türkçe Sözlük* - Yûsiv Zîyayettîn Paşa

Ev kitêba ku bi navê *Kürtçe-Türkçe Sözlük*(Ferhenga Kurdî-Tirkî) jî ferhengeke Kurdî-tirkî ye. Ji aliyê Yûsiv Zîyayettîn Paşa ve hatîye amadekirin. Di sala 1978an de careke din hatîye çapkirin (Temel, 360-365).

3.3.11. *Kulîlkên Çîya-Eskerê Boyîk*

Ev pirtûka helbestan ya Eskerê Boyîk e. Ew ji Kurdên Kafkasan e. Pirtûk di sala 1979an de li Tirkîyeyê careke din hatîye çapkirin (Temel, 360-365).

3.3.12. *Li Bandeva Sipêde-Rojen Barnas*

Ev pirtûka helbestên nûjen ya bi navê *Li Bandeva Sipêde*, ji aliyê Rojen Barnas ve hatîye nivîsîn di sala 1979an de hatîye çapkirin (Temel, 360-365). Ev berhema Rojen Barnas di vê qonaxê de yek ji berhemên girîng yên helbesta nûjen a Kurdî ye. Ji helbestên vê pirtûkê beşek ji helbesteke Rojen Barnas li jêr e.

*“MIN NAVÊ XWE KOLA LI BIRCÊN DIYARBEKIR
gava ku stêrk*

*li esmana stûxwar,
gava ku ney û bilûr û tembûr
û dehol û zirne sar bûn
û cobar
nedixuşîn di nivînên xwe de seranser
sosin û beybûn û rihan
ne d'pişkivîn di bûtikê de
tarîyên giran
tûj û kûr
bi zûrezûr û bi orîneke jakaw
bê fikar, bê paxaw diheliştî dikumiştî li ser welatê min
bi giyanek pola
min navê xwe kola
min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
wek babelîsk
wek moraz
wek bagerek gurr
min enîya têkoşînê
min di enîyek de şer kir li hember xwînxwara
bi dilawerî
bi bîr û bawerî
min têkoşîn û berberî kir
û min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
ez welatparêz im
ez mirovperwer im
ez li ber bircên Diyarbekira rengîn
Şêx Seîdê Kal im
Bijîşk Fuad im
ez Bavê Tûjo me lo
şoreşger im
min navê xwe kola li bircên Diyarbekir
(...) (Barnas, (1979). İzmir: 144).*

3.4. Kovar û Rojnameyên Kurdî û Ên Ku Cih Dane Ziman û Çanda Kurdî Ên vê Qonaxê

3.4.1. *Dicle-Firat*

Ev kovar di sala 1962yan de ji aliyê rewşenbîrên Kurd yê wekî Mûsa Anter û Edîp Karahan ve li Stenbolê tê weşandin. Di vê qonaxê de bi vê kovarê di warê xebatên rewşenbîriya Kurdî de gaveke girîng tê avêtin. Di kovarê de gelek rewşenbîrên wekî Mûsa Anter, Edîp Karahan, Saîd Kirmizitoprak, Saîd Elçî, Huseyîn Sağniç, Yaşar Kaya û hwd. bi Kurdî û bi Tirkî gelek nivîsên polîtîk, çandî û edebî nivîsîne (Malmîsanij û Lewendî, (1992). Ankara: 135).

3.4.2. *Hêvîya Welat*

Ev kovar di sala 1963yan li Enqereyê bi Kurdî sê hejmar derdikeve. Cih dide hin nivîsên Kurdî (Kaya, (2010). İstanbul: 187).

3.4.3. *Deng*

Ev kovar cara pêşîn di sala 1963yan de tê weşandin tenê du hejmar derdikeve û ji alî dewletê ve tê girtin. Ev kovarê di gel ku naveroka wê bi giştî sîyasî bûye lê cih daye hinek helbest û nivîsên Kurdî, di wê wextê de gelek balê kişandîye ser xwe. Bi taybetî helbesta Kurdî ya parlamenterê Ruhayê Kemal Badıllı ya bi navê “*Şivên Ra*” gelek balê dikişîne (Temel, 337-339).

3.4.4. *Roja Newê*

Ev kovar di sala 1963yan de li Enqereyê dest bi weşanê dike, tenê hejmarek dikare bê weşandin. Wekî ku tê dîtin navê kovarê kirnackî ye. Ji vê jî tê zanîn ku di vê kovarê de nivîsarên kirmanckî(zazakî) jî li gel nivîsarên kurmanckî tîne weşan. Ji aliyê weşana zaravayê kirmanckî de her çend tenê hejmarek jî derketibe ciheke girîng ê vê kovarê heye (Temel, 360-365).

3.4.5. *Yeni Akış*

Kovara *Yeni Akış*(Herikîna Nû) ji alîyê koma Kurd ya di nav partîya TÎP(Türkiye İşçi Partisi)'ê de di sala 1966an de tê derxistin. Kovar bi zimanê Tirkî ye lê ji ber ku çend helbestên bi Kurdî tê de tên çap kirin di nav Kurdan de deng vedide. Bi taybetî helbesta Abdurrahman Alaca, “*Rev*” ya ku bi nasnavê Edo Dêran tê weşandin gelek bala derdorên sîyasî yên Kurd dikişîne. Ji bo ku ev helbest wekî nimûneyeke xebatên edebî ên nûjen ya wê serdemê ye hêja ye ku em beşek vê helbestê bidin.

“REV
Ser me de girtin
Berbangeke kûr
Em du bira bûn
Emê bi destê vala
Stêrêk hildiweşîyan
Dikê sibê hê di xew de bûn
Em du bira bûn
Ketibûn pey belengazîya xwe
Derketibûn serê çîyan
Çîya ne bêbext bûn
Mîna cendirma” (Temel, 342)

3.4.6. *Rizgarî*

Ev kovara ku naveroka wê bi giranî sîyasî bûye bi Tirkî tê weşandin. Kovar wekî organa tevgera “*Rizgarîyê*” ye. Bi giştî naveroka wê sîyasî ye, lê di hin hejmaran de cih dide hin nivîs û helbestên Kurdî jî. Sala 1976an dest bi weşanê dike heta sala 1980yan 9 hejmar û li gel hin pêvekan tê derxistin (Temel, 349).

3.4.7. Roja Welat

Ev rojnameya ku 1977an dest bi weşanê kiriye cih daye nivîsarên Kurdî. Wekî rojnameyeke sîyasî û çandî 15 rojan carek derdikeve. Bi qasî 12 hejmar tê weşandin (Temel, 350).

3.4.8. *Tîrêj*

Div ê pêvajoyê de ev kovar li Tirkîyê kovara pêşîn e ku bi aweyeke legal bi temamî Kurdî û çandî û edebî derketiye. Di nav weşan û çapemenîya Kurdî ya vê qonaxê de li Tirkîyê û li bakur ciheke pirr taybet ya vê kovarê heye. Ji ber ku kovar û weşanên vê serdemê bi giştî Tirkî ne û naveroka wan jî li ser babetên sîyasî ne. Lê li Tirkîyê û bakur cara pêşîn kovareke ku wekî çandî û edebî tê derxistin kovara *Tîrêj* e. Ji ber vê yekê girîngîya vê kovarê jî bo çand û edeba Kurdî gelek e. Ev kovar di sala 1979an de dest bi weşanê dike û du hejmar li Tirkîyeyê tê weşandin. Paşê piştî derbeya 12'yê Êlûnê li Swêdê jî du hejmarên din tê weşandin (Temel, 356-357).

Di kovara *Tîrêj* de di gel helbest û berhemên zargotina Kurdî berhemên wekî kurteçîrok jî tîrêj weşandin ku di vê serdemê de ev nimûneyên pêşîn ên Kurdên bakur in. Ji ber vê jî ji aliyê pêvajoya nû ya edebîyata Kurdî ve ev nimûne girîng in.

Naveroka Kovara *Tîrêj* ji van sernavên jêrê pêk tê:

Raberkirinî:

-Vexwendin/Serxas Arda

-Te Vî Zimanî Ji Ku Derê Anî (Serborîyek)/Filît Totanî

Helbestên Rojen Barnas:

-Ez Mendalekî Çar Salî me Mamo

-Melayê Şîretkir

-Jîndarî

-Bibişire

-Kuda Diçin (Çîrok)/M. Şefîq

-Car Zane Zêr Zane Zor Zane/Ferîdûn Salar

Helbestên Mem Ronga :

-Bihar Pêşîyê Te Li Helbestan

-Derîname

Ji Nazim Du Helbest :

-Ayê

-Stranên Me

-Estaneka Mêşna (Çîrok)/Sebahattin Ali

Zargotin :

-Şîretî Kalî (Çîroka Gelî)

-Şerê Xalita (Straneka Ji Wêşeya Gelêrî)

-Lawij

-Zazakî Dir Vatey Verînam

Ferhengok :

-Kurdî-Tirkî

-Zazakî(Dimilî)-Tirkî

Ji bo ku mijar zelaltir bê dîtin em beşek ji kurteçîroka Filît Totanî ya bi navê “*Te Vî Zimanî Ji Ku Derê Anî?*” wekî ku çawa di kovarê de hatîye weşandin bêyî ku dest bidinê li jêr bidin.

“ ...*Te Vî Zimani Ji Ku Derê Anî?*”

Mevaneki min hebu. Dîviya pê re biçim Diyarbekrê. Her çiqas pe re çuyina min di ali îşê wi de, we tu bikêri wi ne hata ji le disa ji bo qinyata dile wi dîviya pe re biçim. Me xatir xwest û em ji malê derketm. Zaroyan li pey me av rêtin, dilen me ket cih. Pîştî av retinê nema êdi tîfaq û teşqele ben sere me. Oxira me vedibû edi. Ez bişîrim. Mevane min, Mirxoyê Xano li min ziviri: «Here here... bave bave min tu ç'ma dê nekeni, zani ecti pîştî ve avreje tîfaq û teşqeleyên li pêş me puç bûn.,.

Bî axaftina Mirxo re denge selavdaneke ji pîşt me ve hat. Li hinc îtavadengi zivirim, Mole Mihemmed Eli...

- Rojbaş Mela! Çawani, qenci gelo?

- Hemdê bê hed bo rebbilalemin, em di intizara roja xwe de ne. Hema Xwedê ji imane û qurana azimuşşan mehrum neke. Ev exiyemc ki ye?

Mirxo xwe ra ne girt. Gote:

- Na bavo ez ne xi me, ez cibri me. Mm gotne ji ber Mirxo hilani:

- Mevanô min e.

- “Ya.. 'ser çavan. Gelo siheta te çawa ne exiyê min?

- Spas. Tu gazneke min nine ji ali xweşya min ve.

- «Elhemdülillah surome elhemdülillah. Rebbilalemin kesi neke bîn dare sihhetê. Nebi muine te be. Zani exi bê teqdira qehhar, tu ziruh mikare hereket bike. Enkebut doxi biteqdira qadirê mutlaq dikare bîlve. Saneki, bakimeki wısaye ku bê misal e, layezal e, (bı zanyari bışiri maşallah eqle meriv nagihije hikme zulcelal.” (Totanî, (1979). *Tîrêj*, (1), İzmir: 9).

BEŞ IV

DI SALÊN 1980-2000AN DE LI BAKUR Û TIRKÎYEYÊ REWŞA ZIMAN Û EDEBÎYATA KURDÎ Û TÊKILÎYA WAN LI GEL TEVGERÊN KURDAN

4.1. SERDEMA SALÊN 1980-2000

4.1.1. Rewşa Sîyasî û Hiqûqî

Piştî derbeya leşgerî ya sala 1980yan zemîna demokrasîyê bi tamamî ji holê tê rakirin. Li Tirkîyeyê hemû tevger û xebatên azadîxwaz û pêşverû tîrî tasvîyekirin. Ji aliyê Kurdan ve jî tu xebateke sîyasî û rewşenbîrî ya berbiçav li holê namîne. Li ser derbeyê hemû xebatên sîyasî û rewşenbîrî yê Kurdî tîrî qedexekirin û bi hezaran kesên sîyasetmedar û rewşenbîrî yan tîrî girtin, yan jî derdikevin dervayê welat. Ji aliyê rêveberên derbeyê ve qanûneke bingehîn tê amadekirin û di sala 1982yan de tê fermîkirin. Bi vê qanûnê ew maf û azadîyên ku di pêvajoya piştî salên 1960'ê pê ve bi dest ketibûn hemû bi carek ji holê hatin rakirin. Bi taybetî ji aliyê xebatên Kurdî ve bêtirî 10 salan tu derfetek namîne. Bi vê makeqanûnê di bin madeyên 26 û 28an de bi qanûna 19 Cotmeh 1983 dîrok û 2932 jimare bi taybetî Kurdî tê destnîşankirin û bi aweyekî qanûnî careke din tê qedexekirin. Di vê serdemê de ne tenê Kurdî û weşanên Kurdî her wisa gelek rojname, kovar û kitêbên Tirkî jî tîrî qedexekirin û berpirsyar û nivîskarên wan tîrî cezakirin (Kaya, (2010). İstanbul: 188). Di vê pêvajoyê de heta sala 1991'ê li nav sînorên Tirkîyeyê tu berhem an jî weşanek Kurdî nikare bê derxistin. Kurdên ku piştî derbeyê ji ber zextên sîyasî ji Tirkîyê derketibûn û bi taybetî xwe li welatên Ewropayê girtibûn gelek weşan û berhem derdixin.

Di sala 1991'e de piştî ku serokwezîrê wê demê Suleyman Demirel di mîtinga partîya xwe ya li Dîyarbekirê de got. “em realîteya Kurdan qebûl dikin” bi aweyekî hebûna Kurdan ku ji avabûna komarê pê ve hatibû înkarkirin êdî hate qebûlkirin û pêvajoyeke nû li Tirkîyeyê dest pê kir (Kaya, 196).

Di vê pêvajoyê de li herêma Kurdan gelek şer û pevçûn diqewimîn, li herêmê rewşa awarte hatibû îlankirin, herêm bi qanûnên taybet dihat birêvebirin. Her roj bi

dehan mirov dihatin girtin û kuştin. Ji ber vê yekê bi hezaran gund hatin valakirin û bi sedhezaran Kurd koçber bûn hatin li bajarên rojavayê Tirkîyeyê, ên wekî Stenbol, Mersîn, Edene, Îzmîr û hwd. bi cih bûn.

Di van deman de ji aliyek ve jî Kurd di nav tevger û lêgerîneke sîyasî de bûn. Di sala 1991'ê de ji aliyê rewşenbîr û sîyasetmedarên Kurd ve Partîya Keda Gel(Halkın Emek Partisi/HEP) hete avakirin û bi itîfaqa Partîya Gelperwer ya Sosyaldemokrat(Sosyaldemokrat Halkçı Partî/SHP) 11 parlamenterên Kurd ketin parlamentoyê. Li ser çend peyv axaftina bi Kurdî ya Leyla Zana ya di parlamentoyê de gelek rûdan û nîqaş bi pêş ketin û bi geşbûna guftûgoyên sîyasî re hin tabû şikestin û nasnameya Kurdî kete navenda rojevê û her wisa ew qanûna (jimareya 2932) ku Kurdî qedexe kiribû jî di sala 1991'ê de hat rakirin. Bi vê rewşa nû re di zemîna legal de xebatên Kurdan yê sîyasî û çandî zêde bûn. Di encama van pêşketinan de her çend dîsa bi rêya qanûnên li ser terore zext û astengiyên li ser Kurdî dewam kirin jî lê careke din sazî û dezgehên Kurdan yê çandî û hunerî hatin avakirin û bi zimanê Kurdî xebat dest pê kirin. Lê ji ber ku li herêmên Kurdan rewşa awarte hebû û dîsa sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd û girseyeke mezin ya Kurdan bi giştî li metropolên Tirkîyeyê û bi taybetî jî li Stenbolê berhev bibûn, ev xebat û lebatên Kurdî careke din wekî qonaxên berê xwe, disa bi taybetî li Stenbolê hatin pêkanîn (Kaya, 196-197).

4.2 . Xebat û Weşanên Kurdan Ên Rewşenbîrî

Helbet wekî qonaxên berê, di vê qonaxê de jî xebatên weşan û rewşenbîrîya Kurdî ji aliyê wan kesan ve hatine kirin ku yan ew di nav komeke sîyasî de bûne, yan jî li gel komeke sîyasî tev gerîyane. Her wisa ev xebat jî di destpêkê de wekî helwesteke sîyasî hatine destpêkirin û paşê li rengê çandî û edebî ve gerîyane. Dema mirov bala xwe dide rewşa berbiçav ya demê û her wiha avakarên van xebatan ev yek derdikeve holê.

Di vê serdemê de li Tirkîyeyê xebatên pêşîn ên zimanê Kurdî di salên 1990-1991'e de derdikevin. Piştî derbeya leşgerî ya 12 Êlûn 1980yan, heta salên 1990an Kurdên bakur li Tirkîyeyê tu derfetek ji bo xebatên Kurdî nabînin. Ew kesên sîyasetmedar û rewşenbîr ku bi hezaran piştî derbeya 12 Êlûnê wekî penaber

derdikevin welatên Ewropayê li wan welatan hin xebatên li ser çand û zimanê Kurdî didomînin. Helbet berê salên 1980yan jî li hin welatên Ewropayê xebatên li ser ziman û çanda Kurdî hene. Lê pistî ku hejmarek zêde Kurdên sîyasetmedar û nivîskar li wan deran kom dibin, xebatên ziman û çanda Kurdî jî zêde dibin. Di wê pêvajoyê de gelek berhem, kovar û rojnameyên Kurdî li wan welatan tên çapkirin û belavkirin. Helbet ji ber ku di wê serdemê de ev Kurdên sîyasî bêtir li welatên wekî Swêd û Almanya kom dibin ev xebatên çandî jî zêdetir li wan welatan pêk tên. Di gel weşana gelek kovar û rojnameyan ji aliyê hin koman ve hinek weşanxane û li hin navendên wekî Parîs, Berlîn û Stockholmê çend enstîtuyên Kurdî jî hatine avakirin. Ew berhem û weşanên ku di van salan de li Ewropayê dihatin çapkirin, qismek ji wan bi rêyên dizî diketin Tirkîyeyê û digehştin destên hin kesan. Lê bi pirranî haya xelkê ji wan xebatan çenedibû.

Ji ber ku têkilîyeke van xebatan bi mijara me re heye, em ê bi kurtasî behsa van xebatan bikin.

4.2.1. Xebatên Ziman û Çanda Kurdî Yên Li Ewropayê

Hê di salên 1970yan de li welatên Awrûpayê her ku diçû dîasporayeke Kurdan çêdibû. Lê belê piştî derbaya 12'yê Êlûnê hejmareke zêde ji Kurdên Tirkîyeyê li welatên Ewropa kom bûn. Ew xebatên ku berê derbeyê ji aliyê van koman ve li Tirkîyeyê hatibûn destpêkirin êdî bi awayekî li Ewropayê hatin domandin. Li gelek bajarên Ewropayê gelek sazî û dezgeyên karker û xwendevanan tên avakirin. Li gelek bajarên Ewropayê komeleyên çandî an jî civakî tên avakirin. Di sala 1982yan de li Parîsê Enstîtuya Kurdî tê vekirin. Paşê li Berlîn, Stockholmê jî enstîtuyên Kurdî tên vekirin. Her wisa gelek weşan û weşanxaneyên Kurdî jî tên avakirin û gelek weşan tên çapkirin.

Hinek ji wan weşanxaneyan ên çalak ev in: Roja Nû (Li Swêd), Jîna Nû (Li Swêd), Deng (Li Swêd), Komkar (Li Almanya), Ronahî (Li Swîsre) (Hassanpour, (2005). İstanbul: 341).

Her wisa ji aliyê van kom û dezgeyên li Ewropayê ve di vê serdemê de gelek kovar û rojnameyên legal an jî îlegal tên çapkirin û belavkirin. Gelek ji van weşanan jî du zimanî an jî sê zimanî dihatin derxistin. Hinek ji wan weşanan piştî demeke kurt

hatine rawestandin, lê hinek jî bi salan weşana wan domandîye. Di gel ku ev weşan zêdetir bi armancên sîyasî dihatin derxistin jî lê gelek ji wan cih didan hin xebatên çand û edebîyata Kurdî jî.

Ev kovar û rojname bi piranî di navera salên 1980-1991'ê de tî çapkirin û weşandin. Paşê hin ji wan weşanên xwe demek dirêj didomînin.

Hinek ji wan kovar û rojnameyên wê serdemê ev in:

Berbang: Kovara Federasyona Komeleyên Swêdê ye. Di salên 1982- 2011an de li Swêdê Kurdî-Tirkî derketîye.

Sexwebûn: Sala 1982- Li Almaniya dest bi weşanê kirîye, hê jî weşaja wê didome. Rojnameyeke sîyasî ye, Tirkî-Kurdî tê çapkirin.

Berxwedan: Di sala 1982yan de li Almaniya dest bi weşanê kirîye û bi Kurdî 154 hejmar derdikeve.

Dengê Yekîtî: Di sala 1983yan de li Almaniya derdikeve. Tirkî-Kurdî ye. 6 hejmar dom dîke.

Têkoşer: Tirkî-Kurdî-Flamenî 42 hejmar derdikeve.

Berbangê Kurdistan: Li Almaniya di sala 1985an de hejmarek derketîye.

Rizgarîya Welat: Li Almaniya di sala 1985an de dest bi weşanê kirîye. 10 hejmar derketîye.

Rewşen: Di sala 1986an de dest bi weşanê kirîye. 9 hejmar derketîye. Kovara Kurdî ya çandî edebî ye.

Mîrkut: Kovareke mîzahî ye. Di sala 1985an de li Swêdê dest bi weşanê kirîye.

Hêvîya Gel: Disala 1986an de li Almaniya dest bi weşanê kirîye. 43 hejmar derketîye.

Nîştîman: Di sala 1985an de li Swêdê dest bi weşanê kirîye. Kurdî-Tirkî 12 hejmar hatîye çapkirin.

Di gel van kovar û rojnameyan çî bi bi aweyeke legal, çî jî îlegal gelek kovar û rojnameyên din jî hatine derxistin. Li gorî ku Fetullah Kaya ji Lokman Polat neqil kirîye, di vê serdemê de bi piranî li welatên Ewropayê 40 kovar û rojname ji aliyê Kurdên bakur ve hatine derxistin (Kaya, 193-195).

4.2.2. Xebatên Ziman û Çanda Kurdî Yên li Bakur û Tirkîyeyê

Di serdema piştî derbeya 12'ê Êlûnê heta salên 1991 mirov li bakur û Tirkîyeyê hema bigir rastî tu weşaneke Kurdî nayê. Lê belê di vê navberê de piştî salên 1988an di hin kovarên ku ji aliyê Kurdan ve tên derxistin de hin nivîsên Kurdî tên weşandin û hin xebatên Kurdî ji aliyê girtiyên sîyasî ve li hepisxaneyan bi awayekî îlegal tên pêkanîn. Bi taybetî girtiyên sîyasî yên hepisxaneya Dîyarbekirê di navbera salên 1980-1988 de li ser babetên sîyasî gelek xebatên nivîskî pêk tînin, lê di nav van xebatan de cih didin nivîsên bi zimanê Kurdî babetên çandî jî. Çend kovaran derdixin ku yek ji wan kovaran jî bi temamî Kurdî ye. Li gorî Malmîsanij û Mehmûd Lewendî ku agahî didin, di salên 1983-1988 de li hepisxaneya Dîyarbekirê kovarên bi navê *Çandîya Berxwedan*, *Çirûska Jîyan*, *Berhem* ji aliyê girtiyên sîyasî ve tên derxistin ku yek ji van bi temamî Kurdî ye. Her wisa li hin hepisxaneyên din ên Tirkîyeyê jî hin xebatên bi Kurdî hatine kirin lê zêde agahiyên zelal di vî derbarê de tunene (Malmîsanij û Lewendî, 326).

Di vê qonaxê de heta ku rewşa sîyaseta Tirkîyê hinek diguhere û qedexeya li ser Kurdî tê rakirin bi awayekî legal çend kovar ji aliyê Kurdan ve tên derxistin ku ew jî hemû hejmarên wan tên berhevkirin û di derbarê xwedî û berpirsyarên wan de doz tên vekirin û gelek ceza tên birrîn. Eger em berê xwe bidin vê qonaxê wekî destpêk çend kovarên girîng ên destpêkê hene ku van cesaret daye ku Kurd bi rengekî legal careke din dest bi xebatên Kurdî bikin.

Di berdewamiya vê qonaxê de piştî derxistina hin kovar û rojnameyan Kurd hêdî hêdî dest pê dikin sazî û dezgehên çandî, hunerî û sîyasî, wekî komele, weşanxane, navendên çandê û heta partiyên sîyasî jî ava dikin.

4.2.3. Kovar û Rojname

Ev pêvajoyê mirov dikare wekî du qonaxan binirxîne. Yek jê ew qonaxa e ku kovar û rojnameyên ku ji aliyê Kurdan ve dihatin derxistin yan bi tenê navê wan Kurdî bû qet cih nedidan nivîsên Kurdî yan jî gelek hindik cî didan nivîsên Kurdî. Qonaxa din jî ew e ku êdî kovar û rojnameyê xwerû bi Kurdî derdikevin. Ev qonax

di dawîya 1991'ê de dest pê dîke û heta roja me ya îro jî her ku diçe berfireh û dewlemendtir dibe.

Helbet mijara me xebat û lebatên li ser ziman û çanda Kurdî ye. Lê ji ber ku ev kovar û rojnameyên destpêka vê qonaxê wekî pêşrewên qonaxa kovar û rojname û her wisa xebatên li ser çand û zimanê Kurdî ne, em ê hindek behsa van xebatan jî bikin.

Di vê qonaxê de jî dîsa ji aliyê hin kesayetî û komên sîyasî ve hin kovar û rojnameyên sîyasî tên derxistin. Lê di gel ku naveroka van kovaran bi giştî sîyasî ye û bi giştî jî Tirkî ne jî, lê di gelek ji van kovaran de nivîsên çandî û edebî yên Kurdî jî hatine weşandin.

Yek ji wan kovarên pêşîn yên vê qonaxê *Medya Güneşi* (Roja Medya) ye. Ev kovareke sîyasî ye, ji aliyê Kurdan ve bi awayekî legal, bi zimanê Tirkî tê dexistin lê di her hejmarê de cih dide nivîsên bi zimanê Kurdî jî. Di gel ku ev kovar û weşanên vê serdemê bi giştî Tirkî ne jî lê ji bo ku destpêka xebat û weşanên Kurdî yên vê qonaxê li ser bingeha van weşanan derdikeve meydana ji bo mijara me ev weşan girîng in. Ji ber wê yekê jî em ê berê xwe bidin weşanên Kurdan yên destpêka vê qonaxê.

4.2.4 Kovar û Rojnameyên Kurdan Ên Qonaxa Pêşîn Ên Serdema 1980-2000ê.

4.2.4.1. *Medya Güneşi*

Kovara *Medya Güneşi*(Roja Medya) di sala 1988an de li Stenbolê dest bi weşanê dîke.

Li bin navê vê kovarê bi Tirki weha hatiye nivîsîn: "*Aylık haber-incelemeyorum dergisi*" (Kovara mehaneya nûçe-lêkolîn-şîrovîyê).

Hejmara wê ya pêşîn di 1'ê Nîsana 1988an de derket. Nivîsên wê bi pirranî bi Tirkî li ser mijarên sîyasî ên pîrsgirêka Kurdî ne. Lê hema bigir ku di hemi hejmarên wê de nivîsên Kurdî jî hene. Xwedî û berpirsiyarê wê: Cemal Özçelik (Piştî hejmara 5. tenê xwedî ye.) Mudirê berpirsiyar: Yakup Karademir (Di hejmara 14. de mudirê berpirsiyar Salih Bal e.

Ji xwediyê kovara *Medya Güneşi* Cemal Özçelik re 12 Sal û 6 meh ceza tê birrîn. "12 hejmarên *Medya Güneşi* ku derketine hemû jî hatine qedexa kirin û di heqê berpirsiyarê kovarê de bi dehan mehkeme hatine vekirin (Malmîsanij û Lewendî, 329).

4.2.4.2 Toplumsal Diriliş

Kovara *Toplumsal Diriliş*(Vejîna Civakî) di sala 1988an de li Stenbolê dest bi weşanê kirîye.

Li bin navê kovarê wiha nivîsîye: "*Aylık siyasi, kültürel, felsefi yorum dergisi*"(Kovara mehane ya siyasi, kulturî û felsî ya şîroveyan e). Piraniya nivîsên wê li ser pirsên Tirkiyê û Kurdistanê ne. Nivîsên wê hemû bi Tirkî, bi giştî li ser meseleya Kurdî ne. Bi qasî 4-5 hejmar derdikeve.

Xwedî: Cemal Yalve . Gerîndeyê giştî yê berpirsiyar: Hasan Uşak e (Malmîsanij û Lewendî, 335).

4.2.4.3. Özgür Gelecek

Ev kovara bi navê *Özgür Gelecek*(Dahatîya Azad) di sala 1988an de li Enqereyê dest bi weşanê kirîye.

Li ser berga kovara *Özgür Gelecek*, dinivîse ku "kovara kulturî û siyasî" ye. Li ser hev heşt hejmarên vê kovarê derketine. Nivîsên wê hemî bi Tirkî, bi giştî li ser mijarên pirsgerêka Kurdî ne. Xwedî û gerîndeyê wê: Mehmet Bayrak, Gerîndeyê Berpirsiyarê karûbarên nivîsan: Bekir Kesen e.

Li ser xwedî û berpirsiyarê kovarê gelek tahde hatine kirin û ew gelek caran hatine girtin. Tenê ji bo her sê hejmarên pêşîn ên kovarê mehkemeyê der heqê Mehmet Bayrak, Bekir Kesen û hin nivîskarên kovarê de nêzî sed salan ceza xwestiye (Malmîsanij û Lewendî, 338).

4.2.4.4. *Vatan Güneşi*

Kovara *Vatan Güneşi*(Roja Welat) di sala 1989an de li Stenbolê dest bi weşanê kirîye.

Li ser berga vê kovarê di bin navê kovarê de dinivîse ku kovareke sîyasî û çandî ye. Nivîsên wê bi pirranî bi Tirkî ne Lê di hin hejmarên wê de cama nivîsên bi Kurdî jî hatine weşandin.

Xwedîyê kovarê li ser navê Fırat-Dicle Yayıncılık Ltd. Şti. Rıfat Sefah e û Gerînendeyê berpirsiyar yê karên nivîsan : Rıfat Eroglu ye (di hejmara 7. de Nalan Alıcı ye). Ev kovar jî hejmarên wê bi giştî hatine berhevkerin û di derheqê wê de doz hatine vekirin û gerînendeyê wê hatine girtin (Malmîsanij û Lewendî, 345).

4.2.4.5. *Deng*

Ev kovar di sala 1989an de li Stenbolê dest bi weşanê kirîye.

Li bin navê vê kovarê bi Tirkî hatiye nivîsin ku "*kovara mehane ya sîyasî çandî*" ye. Ev kovar ji alîyê berdewama gruba sîyasî ya ku berê derbeya 12 Êlûnê wekî "Özgürlük Yolu(Rêya Azadî) dihat zanîn ve tê derxistin. Nivîsên wê bi Tirkî û Kurdî (Kurmancî û Dimilî) ne. Heta Sibata 1992an 18 hejmarên wê derketine.

Di hejmara pêşin ya kovarê de, xwedîyê kovarê li ser navê Süreç Yayıncılık Ltd. Şti: Hikmet Çetin e, Gerînendeyê berpirsiyar ê karûbarê nivîsan: Kamil Ermiş e. Ev kovar jî wekî wan kovarên berê xwe rastê zexta dewletê tê û tê berhevkerin, di heqê gerînde û xebatkarê wê de doz tên vekirin û ceza tên birrîn (Malmîsanij û Lewendî, 351).

Ev kovar piştê ku tê girtin di şûna vê kovarê de bi navên wekî, *Azadî, Dengê Azadî û Ronahî* çend rojname û kovar tên weşandin.

Piştê salan careke din dest bi weşana kovara *Deng*'ê tê kirin û heta niha jî di gel ku bi aweyekî ne bi rêk û pêk peryodîk be jî di sala 2017an de bi hejmara 107an wekî kovareke sîyasî û çandî bi Tirkî-Kurdî weşana wê berdewam e (www.psk-reyaazadi.org, 12.10.2017).

4.2.4.6. *Halk Gerçeği*

Ev kovara *Halk Gerçeği*(Rastîya Gel) di sala 1990an de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Ev di wê demê rojnameya pêşîn e ku ji alî sîyasîyên Kurd ve –li gorî ku Malmîsanij û Lewendî dibêjin- di gel grubek Tirk hatîye derxistin. Ev rojname rojnameyeke "*hefteyî ya siyasi*" ye. Hemû nivîsên wê bi Tirki ne. Naveroka nivîsên wê bi giştî li ser meseleya sîyasî ya Kurdî ne.

Xwedîyê rojnameyê, İsmet Ateş, Gerînendeyê berpirsiyar ê karûbarê nivîsan, İsmail Safer e. Li ser hev neh hejmarên wê derdikevin. Ev rojname jî hemû hejmarên wê tîr berhevkerin û pişt re ji aliyê dewletê ve tê girtin û derheqê berpirsiyarên wê de gelek doz tîr vekirin û gelk ceza tê birrîn. Piştî ku ev rojname tê girtin ev rojname bi navê *Yeni Halk Gerçeği* (Rastîya Gel ya Nû) tê derxistin. Xwedî, İzzet Aslanbay e (Malmîsanij û Lewendî, 368).

4.2.4.7. *Yeni Ülke*

Ev rojnameya hefteyî ya bi navê *Yeni Ülke*(Welatê Nû) di sala 1990an de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Di bin navê wê de bi Tirki wiha hatîye nivîsîn: "*Pazar Gazetesi*" (Rojname yekşemiyê). Ev rojname jî hefteyî ye û nivîsên wê bi giştî Tirkî ne. Lê girîngîya vê rojnameyê ew e ku demeke dirêj weşana wê dewam kirîye û her wisan jî ev rojname dibe bingeh ku Kurd êdî dest pê dikin rojnameyeke rojane derdixin, çawa ku tê dîtin di hejmeta 12-13an ya sala 1992an de kampanyayeke hatîye vekirin kû ev rojname bibe rojnameyeke rojane. Û dîsa di vê qonaxê de rojnameyên xwerû bi Kurdî jî li ser van tecrûbeyan tîr derxistin.

Xwedîyê rojnameyê di destpêkê de, li ser navê IMC'yê Yusuf Serhat Bucak e. Berpirsiyarê giştî Günay Aslan e, gerînde Özkan Kiliç e. Paşê ev diguherin. Ev rojname jî rastî gelek zextan tê di nav salekê de li rojnameyê 55 doz tîr vekirin û 30 caran cezayê girtinê û 18 car jî cezayê berhevkerinê lê tîr birrîn (Malmîsanij û Lewendî, 372).

4.2.4.8. *Özgür Gündem*

Ev rojname bi navê *Özgür Gündem*(Rojeva Azad) di sala 1992an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Ev rojname di 13.05.1992yan de dest bi weşanê dike. Zimanê rojnameyê Tirkî ye. Lê girîngiya vê rojnameyê ew e ku rojnameya pêşîn e ku ji aliyê Kurdên bakur ve bi awayekî rojane hatîye derxistin. Her çî ku hinek îdea hene ku piştî weşana kovara *Jîn*'ê radiweste, disa bi navê '*Jîn*' rojnameyek rojane tê derxistin. Lê hejmara rojnameya '*Jîn*'ê ya ku hatîye peyda kirin li ser îbareya "rojnameya hefteyî" hatîye nivîsîn. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bibêje ku rojnameya rojane ya pêşîn ku ji aliyê Kurdên bakur ve hatîye derxistin rojnameya *Özgür Gündem*'ê ye.

Di destpêkê de xwedî û berpirsyarên rojnameyê wiha ne:

Gerîndeyê Weşanê yê Giştî: Ratıp Duran

Xediyê İmtiyazan, (Li ser navê Ülkem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti) : Yaşar Kaya

Heyeta Weşanê: Haluk Gerger, A. Başar Kafaoğlu, Taner Kutlay, Yavuz Şimşek, Hasan Bildirici,

Gerîndeyê Berpirsiyar: O. Işık Yurtçu

Divê ku mirov dîyar bike ku ev rojname serê pêşîn bi navê *Ülke* dest bi weşanê dike û paşê digel maceraya dûr û dirêj li ser girtin û cezayên giran çendîn caran nav diguherîne û ji roja 30 Gulan 1992yan pê ve jî bi awayekî rojane di bin navên *Özgür Gündem*, *Bakış*, *Demokrasi*, *Yedinci Gündem*, *Ülkede Gündem*, *2000'de Gündem*, *Yeni Gündem*, *Yeniden Özgür Gündem*, *Ülkede Özgür Gündem* û her wisa di bin gelek navên din de weşana xwe didomîne. Îro (2017) jî ev rojname bi navê *Özgür Gündem* -di gel ku carina ji ber cezayan di bin navên din de derkeve jî-hê jî wekî rojnameyê rojane weşana xwe didomîne (Uçar, D.).

4.2.4.9. Özgür Halk

Kovara *Özgür Halk*(Gelê Azad) di sala 1990an de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Li ser berga kovarê dinivîse ku "*kovara mehane ya siyasi û kulturî*" ye. Nivîsên wê bi Tirkî ne û bi pirranîya nivîsên wê teorîk û siyasî û gotarên dirêj in. Carina hin gotin û hevokên bi Kurdî jî tê de hatine weşandin.

Xwedî, (Di destpêkê de li ser navê Ses Basın Yayın Tic. Ltd.): Rıza Erdoğan e.

Gerîndeyê berpirsiyar: Rıza Erdoğan e. Mesûlê giştî: Hüseyin Aykol e.

Lê paşê ev kovar jî rastî gelek zext û pêkutîyên dewletê û di gel girtin û cezakirina berpirsiyarên wê gelek caran mesûl û xwedîyên wê guherîne (Malmîsanij û Lewendî, 390). Lê heta îro jî di gel ku gelek caran hatiye qedexekirin, hin caran bi navên din, hêj jî derdikeve.

4.2.4.10. Newroz

Ev kovar di sala 1991an de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Kovara *Newrozê* bi Tirkî û Kurdî -bi lehçeyên Kurmancî û Dimilî- ye. Li bin navê wê bi Tirkî weha hatiye nivîsîn: "*Aylik siyasi ve kültürel dergidir(Kovara mehane ya siyasi û kulturî ye)*". Li ser qapaxa hejmara pêşîn bi Kurdî weha hatiye nivîsîn: "*Ji bo azadîya gelê me, serhildan li her derê!*"

Xwedîyê kovarê li ser navê Newroz Yayıncılık : Hüseyin Alataş e, gerîndeyê berpirsiyar ê karûbarên nivîsan: Celal Albayrak e. Ev kovar jî wekî wan weşanên din ên Kurdan rastê zextên dewletê tê (Malmîsanij û Lewendî, 396).

4.2.4.11. Govend

Ev kovar di sala 1991an de li Diyarbekirê dest bi weşanê dike.

Govend di vê qonaxê de weşana Kurdî ya pêşîn e ku li bakurê Kurdistanê bi aweyekî legal tê çapkirin û belavkirin. Li ser berga kovarê di bin navê kovarê de bi Tirkî wiha hatiye nivîsîn: "*Kültürel ve Sanatsal Dergî*"(Kovara *Çandî û Hunerî*)

Ev kovar bi Kurdî û Tirkî ye. Li ser bergê nivîsî ye ku du mehan carek derdikeve.

Xwedîyê kovarê, Mazhar Kara ye. Gerîndeyê ji karên nivîsan berpirsyar Mûkerrem Ayyıldız e. Di naveroka kovarê de di gel nivîsên sîyasî nivîsên çandî edebî jî hene (Malmîsanij û Lewendî, 405).

4.2.5. Kovar û Rojnameyên Kurdan Ên Qonaxa Piştî Ku Qedexya Li Ser Kurdî Radibe û Nimûneyên Pêşîn Ên Kovar û Rojnameyên Xwerû Bi Kurdî.

Di vê qonaxê de heta salên 2000an ji aliyên çand, weşan û çapemenîya bi zimanê Kurdî de çend nimûneyên girîng hene, em ê bi taybetî li ser van rawestin. Helbet hinek ji van xebatên vê serdemê wekî sazî û dezge ne, hinek ji van jî kovar û rojname ne. Em ê li vir bala xwe bidin ser xebatên wekî kovar û rojnameyan bi taybet. Lê paşê emê di beşa sazî û dezgehan de bala xwe bidin ser wan xebatan jî.

Ji van xebatên vê qonaxê –eger ku em ceribandina *Rojname*'yê danin aliyek-yên ku dikare wekî bingeha avakirina kevneşopîyek li zimanê Kurdî bîn jimartin ev in: Kovara *Rewşen*'ê, rojnameya *Welat*, kovara *Nûbihar*, kovara *Zend*, kovara mîzahî *Pîne*.

4.2.5.1 *Rojname*

Ev rojname di sala 1991an de li Stenbolê derdikeve. Ev rojnameya ku bi navê *Rojname derketîye* tenê yek hejmarek wekî ceribandin tê derxistin û paşê êdî dernakeve. Lê ji aliyê ziman û çapemenîya Kurdî ve cîyeke wê yê girîng heye. Ji ber ku ev rojname rojnameya xwerû Kurdî ya pêşîn e ku li Tirkîyeyê tê çapkirin û belavkirin. Berê vê rojnameyê tenê kovara bi navê *Tîrêj* di sala 1979an de xwerû bi Kurdî çend hejmar derdikeve û wekî din jî di temamê dîroka çapemenîya Kurdî ya li Tirkîyeyê de heta sala 1992yan wekî kovar û rojname tu nimûneyek ku xwerû bi Kurdî hatibe derxistin tune.

Hejmara wê ya provayê di 29.12.1991an de derdikeve û hemû bi Kurdî (Kurmancî û Dimilî) ye. Ev hejmar bi alîkariya şîrketa Mezopotamya derketîye.

Xwedî li ser navê Weşanxaneyê Dozê: Ahmet Zekî Okçuoğlu ye. Berpirsyarê giştî : Eşref Okumş e.

Di naveroka rojnameyê de di gel nivîsên sîyasî hin nivîsên çandî jî hene (Malmîsanij û Lewendî, 401).

4.2.5.2. Rewşen

Ev kovar di sala 1992yan de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Berî ku mirov behsa kovara *Rewşen*'ê bike divê ku mirov behsa “Navenda Çanda Mezopotamya”yê bike, ku navê wê yê destpêkê wekî fermî bi Tirkî “Yukari Mezopotamya Kültür Merkezi”(Navenda Çanda Mezopotamya ya Jorîn) e. Paşê bi kurtasî wekî Mezopotamya Kültür Merkezi/MKM, yan jî bi Kurdî wekî Navenda çanda Mezopotamya/NÇM tê bi nav kirin û naskirin. Ji ber ku ev kovar wekî beşek ji xebatên vê sazîyê di bingeha “Navenda Çanda Mezopotamya”yê de tê derxistin. Lê belê ji ber ku emê di beşa sazîyan de li ser vê sazîyê rawestin em ê niha vê mijarê li vir bihêlin.

Kovara *Rewşen* mirov dikare bibêje ku di qonaxa dawî ya çand û hunera Kurdî de wekî mîladekê ye. Ji ber ku li bakur û Tirkîyeyê cara pêşîn bi vê kovarê re li ser çand, edebîyat û hunera Kurdî kevneşopîyek dest pê dike û bi vê kevneşopîyê re gelek xwendevan, nivîskar û helbestvan ji nivîsên nû derdikevin ser qada çand û hunera Kurdî. Di gel ku di hejmarên pêşîn ên vê kovarê de hinek nivîsên Tirkî û naveroka sîyasî hene jî lê piştî demekê kovar bi temamî dibe Kurdî û naveroka wê jî dibe mijarên çand, edebîyat û hunera Kurdî. Berê vê kovarê ji xeynî nimûneyek (kovara *Tirêj*) -ku me li jor amace pê da- hemû kovar û rojnameyên Kurdan ku li bakur û li Tirkîyeyê derketine jî bi giştî zimanê wan Tirkî ne û naverokên wan jî sîyasî ne û temenên wan jî pir kurt in. Lê belê *Rewşen* di temamê salên vê serdema dawîyê de bê navber hatîye derxistin û li seranserê bajarên bakur û Tirkîyayê hatîye belavkirin. Divê em dîyar bikin ku ji ber sedemên qanûnî ji sala 1997an pê ve navê kovarê wekî *Jiyana Rewşen* hatîye guherandin û paşê di sala 2002yan de dîsa ji ber heman sedeman navê kovarê wekî *Rewşen-Name* hetîye guherandin û heta van salên dawîyê nêzîkî 30 salan ev kovar di gel ku hinek caran navber ketibe weşana wê jî hatîye weşandin.

Ev kovar ji alîyê Navenda Çanda Mezopotamya ve li Stenbolê hatîye derxistin. Di beşa saziyan de em ê behsa vê sazîyê bikin.

Li bin navê vê kovarê bi Kurdî weha hatiye nivîsîn: "*Kovara çandê*". Li aliyê çepê navê wê, li gel sembola wê îbareya "*Navenda Çanda Mezopotamya*"yê heye. Di rûpela 2. de jî hatiye nivîsin ku "*Mehê careke tê weşandin*".

Di destpêkê de xwedîyê kovarê, Îbrahim Gürbüz e. Gerîndeyê berpisyar ya karên nivîsan: Edibe Şahin e û Birêvebirê karên weşanê, Hüseyin Kaytan e, Berpirsyarê Têkilîyên bi gel re: Îbrahim Genç (Îbrahîm Xort) e.

Her wisa di destpêkê de lijneyeke nivîs û weşandinê ya kovarê ku kesên wekî, Hasan Bildirici, Hüseyin Sağınç, Ali Temel, Abdurrahman Durre, Hüseyin Kaytan, Mehmet Gensiz û Îbrahim Genç tê de cih digirin heye. Paşê di nav xebatên kovarê de gelek ciwan cih digirin. Kesên wekî Kawa Nemir, Zahir Kayan, û hwd.

Kovar her çen di serî de bi helwesteke sîyasî tê derxistin jî lê naveroka wê bi giranî vedigere ser babetên çandî û edebî.

Gerîndeyê destpêkê ya karên nivîsan ya Rewşen'ê Edibe Şahin di vî derbarî de wiha dibêje: "*Piştî ku sazî(NÇM) hate avakirin, ji bo ku vê sazîyê di qada nivîsê de jî temam bike pêwîstî bi kovarek hebû. Li ser vê yekê guftûgo hatin kirin û biryar hat girtin ku kovareke bi vî rengî bê derxistin. Di destpêkê de me biryarda ku ji sedan 15 em cih bidin zimanê Tirkî*" (Tekoğlu, (2017), Belgefîlm, *Şûr û Qelem*).

Berpirsyarê kovarê Îbrahim Genç wiha diyar dike: "*Bi rêya vê kovarê gelek însan fêrî nivîsandina Kurdî bûn, gelek însan fêrî berhevkirina folklorê Kurdî bûn û gelek kes jî bi rêya vê kovarê bûn nivîskar û romannivîs*".

Xwedîyê kovarê Îbrahim Gürbüz jî diyar dike ku Rewşen di vî warî de kovara pêşîn ya legal e ku wekî kovareke bi zimanê Kurdî serlêdana wê ya fermî hatîye kirin û hatîye derxistin (Tekoğlu, h.b.).

Kovar di destpêkê de bi Kurdî (Kurmancî -Dimilî) û Tirkî ye. Paşê kovar bi temamî wekî kovareke xwerû bi Kurdî ya çandî, edebî û hunerî bi salan weşana xwe didomîne. Di kovarê de gelek nimûneyên ji berhemên şanoyê, helbestên Kurdî, wergerên ji edebîyata cîhanî, kurteçîrok, nivîsên li ser ziman û gramera Kurdî û berhevokên ji folklorê Kurdî tîne weşandin (*Rewşen*, [AWÏB]).

Di hejmara Rewşenê ya pêşîn de ev nivîsar û nivîskar hene:

Çima Rewşen?.....	4
Neden Rewşen?	6
Nasıl Bir Bilim, Sanat ve Kültür?	
REWŞEN	8
Parastina Zimane Kurdî	
Hogir EHMED	9
Kürt Enstitüsü Kurulurken	
Seyda BERÇEMÎ	11
Mir Bedirxan Destur Daye Zewicandina Kurd Ct Ermeniyan	
Faik BULUT	14
Röportaj : İsmail Beşikçi	
REWŞEN	18
Gele Kurd û Wejeya Kurdî	
Abdurrahman DÜRRE	21
Dersim Ser Çend Qesey	
Berhem	25
Tartışma: Kürtçe AlfabeNasıl Olmalıdır?	
İbrahim GENÇ	27
Qadi Muhammed	
Seyda BERÇEMÎ	29
Kürt Dili Üzerine	
Hüseyin KAYTAN	32
Niştimana Xwe Binase: Bedlis	
M. BOZAN	37
Din Dili Olarak Kürtçe	
Yaşar KAYA	40
Analiz : Kürtçede Kuzey - Güney Farklılaşması	
Hüseyin KAYTAN	; 42
Ziman, Çand û Gel	
Feqi Huseyn SAGNIÇ	44
Pişeya Gele Kurd	

YETKÎN	45
Falklor	
Îrfan ÖZTÜRK	46
Li Ser Peşveçûna Wêneyen Kurdî	
Fevzi BİLGE	47
Memyanê	48
Röportaj : Koma MEZRA BOTAN	
REWŞEN	49
Dersen Zimane Kurdi	
FARQÎNÎ	51

4.2.5.3. *Welat*

Ev rojname di sala 1992yan de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Welat, rojnameyeke hefteyî ye. bi Kurdî (Kurmancî û Dimilî) derdikeve. Li bin navê wê ev îbare heye: "*Rojnameya hefteyî*". Hejmara wê ya pêşîn wekî hefteyî di 22-28 Sibat 1992an de derket.

Piştî rojnameya "*Rojname*"yê. *Welat* rojnama duyemîn e ku li Tirkîyê xwerû bi Kurdî derdikeve.

Di destpêkê de xwedîyê rojnameyê li ser navê IMC Basın-Yayın: Zubeyir Aydar e.

Gerîndeyê weşanê yê giştî: Abdullah Keskin, Gerîndeyê karûbarên nûsan: Mazhar Günbat e.

Ji ber ku –me li jorê jî girîngîya vê rojnameyê destnîşan kiribû- ev rojname ji hemû rojnameyên berê xwe û heta piştê xwe cuda ye ku me pêwîstî pê dît ku em bi taybetî li ser vê rojnameyê hindek rawestin. Berî her tiştî ev rojname, eger ku em rojnameya *Rojname* ku wekî prova tenê hejmarek derket danin alîyek li temamîya dîroka çapemenîya Kurdan ya li bakur û Tirkîyeyê tenê mînakek e ku wekî rojname xwerû bi Kurdî û di gel hemû zektan, girtin, kuştin, berhevkirin û cezakirinan bi salan weşana xwe di bin navên *Welat*, *Welatê Me*, *Azadîya Welat*, *Rojeva Welat*, *Welat* de de heta sala 2006an wekî hefteyî domandîye û ji sala 2006an pê ve jî heta

dema me ya ku em tê de ne (2017) jî bi aweyekî rojane ev nêzikî 30 salan e weşana xwe didomîn e.

Navroka rojnameyê di gel nivîsên çandî û folklorî, bi giştî nûçeyên rojane û mijarên sîyasî ne. Ji xwe ji xwedî û nivîskarên rojnameyê jî dîyar e ku ev rojname jî ji aliyê sîyasetmedarên Kurd ve hatîye derxistin. Di rojnameyê de hin rewşenbîr û sîyasetmedarên wekî Musa Anter, Zübeyir Aydar, Yaşar Kaya, Abdullah Keskin, Hüseyin Deniz, İsmail Göldaş û hwd. gotar nivîsîne. Paşê bi gelek xebatkar û nivîskar û rojnamegerên din weşana xwe domandîye.

Naveroka hejmara pêşîn ya Welat wiha ye:

-Zimanê Kurdî Serbest e, Yan Qede ye?

-Jibo Jîyaneke Nuh

-Erdên Gundîyan Belavdikin

-Enstîtuya Kurdî Vedibe

-Jiyaneke Pak Vemirî

-Vebirrîn Ji Ne Çare ye

-Gundî Di Bin Aşitê de ne

-Meclisa Niştevanên Helsînkî: "Îhlalkirina Mafên Mirovan „Ji Berê” Bêhtir Dom Dike"

-Rojeva Welêt: Piştî 70 Salî (Malmîsanij û Lewendî, 415).

4.2.5.4. Nûbihar

Ev kovar hejmara yekem di Çirîya Pêşîn ya sala 1992yan de li Stenbolê derdikeve. Di destpêkê de wekî kovareke mehane derdikeve, paşê hin caran periyodên wê diguherin.

Ev kovar li gorî derhênerê wê yê giştî yê weşanan, Silêman Çevik, piştî avakirina weşanxaneyê Nûbiharê ji aliyê weşanxaneyê ve tê derxistin (Çevik, www.timeturk.com).

Her wisa ji hin agihîyên di heqê kovarê de dîyar dibe ku têkilîya kovarê bi weqfa “Med-Zehra”yê re jî heye (Kaya, (2010). İstanbul: 215). Di detpêkê de dema

ku kovar derdikeve Xwedîyê îmtîyazan ê kovarê Mahmut Yarlug e. Berpirsyarê karê weşanan, Sabah Kara ye û gerîndeyê karên nivîsan, Süleyman Çevik e.

Ev kovar ji naveroka wê jî wisa dîyar dibe ku mirov dikare bibêje ji aliyê dîndarên Îslamî yên Kurd yên li ser şopa fikrî ya Seîdê Kurdî ve hatîye derxistin û weşana xwe her bi wî rengî domandî ye. Di qonaxa piştî salên 1960an de kovara pêşîn e ku ji aliyê Kurdên Îslamî ve tê derxistin.

Ev kovar jî hêjayê gotinê ye ku mirov hinek li ser raweste. Ji ber ku yek ji wan kovaran e ku heta roja me ya îro her çend ne bi rêk û pêk û ne bi heman perîyodê be jî ev nêzikê 25 salan e bi heman navî weşana xwe bi zimanê Kurdî didomîne. Ev kovar jî li gorî xeta xwe dibe wek bingeha kevneşopîyekê di nivîsa zimanê Kurdî de û li dorê xwe gelek nivîskaran digihîne.

Di naveroka hejmara 2. ya *Nûbiharê* de nivêsar û nivîskar wiha hatine rêzkirin:

Sernivîsar 1 5

Nezanî bindestî ye, zanîn rizgarî ye! / Sabah Kara

Ayetname /8

Çend ayetin ji Quran a Med' d/ Azad

Hedîsname/ 10

Xutbeya xatirxwestiniya Pexemberê Ekrem / Süleyman Çevik

Helbest/ 12

Ismê te ye nektûbi di dîwanî qîdem da / Mela Ehmedê Cizîrî

Nivîsar /13

Nivîskaran û Seîdê Kurdî / Xwedeperest

Helbest / 14

Wer bibîn eşq bi mi çi kir / Yunis Emre- Hozan

Nivîsar /15

Korekor bûn, ya nebûn; eve hernû pirsgirêk! / Sabah Kara

Nivîsar /19

Nezani bes e! / Süleyman Çevik

Qise /20

Îdo / Bager

Weşanname / 21
 Ri'saleya Biratîyê / Naci Abdullah
 Helbest /22
 Nameyên bê cewab/ 1, 30 Îlon 1990/ Sabah Kara
 Berhevok/ 23
 Peyivên ristan
 Zarokname/24
 Ko zivistan çu, bihar tê/Siyaweş Kisrayi/Sabah Kara
 Karpeke şandi
 Bi Navê Yezdan/Heqperest/26
 Daxwaz /Ebdillah Amed/26
 Kovara Nûbihar/M. Şakir e Koçer 26
 Ri'de tod, vill abyene 1 Muhammed Paşa / 27
 Hey Melekent 1 Necip Yüce/ 27
 Raya me/ Muhammed Paşa/28
 Rêziman/29
 Elfabeya Kurdî
 Ferhangok/31 (*Nûbihar*, [AWİB]).

4.2.5.5 Tewlo

Ev kovar di sala 1992yan de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Tewlo, kovara mîzahê ye. Bi Kurdî û Tirkî ye. Li ser berga pêşîn ya kovarê bi Tirkî ev îbare heye: “*Yazi ve çizim ürünleri dergisi*”(Kovara nivîs û xêzan) Li ser kovarê (di hejmarê 5. û 6. de). bi Kurdî ev îbare hene: “*kovara bi esil*”, “*kovara pêkenîn a hefteyî*”.

Xwedî: L1 ser navê Ülkem Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. Serhat Bucak

Berpirsiyarê Mîzahî: Xelîl Ziravav

Berpirsiyarê Nivîsaran : Tarik Tolunay

Ev kovar girîngiya wê ev e ku kovara pêşîn ya mîzahî ye ku ji aliyê Kurdên bakur ve li Tirkîyeyê bi aweyekî legal tê derxistin. Nivîsên kesayetên wekî Musa Anter û İsmail Beşikçi jî di kovarê de derketine (Malmîsanij û Lewendî, 427)

4.2.5.6. *Zend*

Ev kovar di sala 1996an de li Stenbolê dest bi weşanê dike.

Zend kovara Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ya zanistî û lêkolînî ye. *Zend* bi temamî bi zimanê Kurdî derketîye. *Zend* kovara pêşîn ya zanistî û lêkolînî ye ku li bakur û Tirkîyeyê hatiye derxistin.

Hejmara pêşîn ya *Zendê* di 21 Adar 1994an de derdikeve. Di nav nivîsarên *Zendê* de di serî de li ser ziman û çanda Kurdî, li ser gelek babetan gotarên zanistî hatine weşandin. Ev kovar jî di nav weşanên Kurdî yê vê serdemê de cîyekî xweser û girîng digire. *Zend* serê pêşîn di sala 1994an de wekî prova 2 hejmar tê derxistin. Paşê ji sala 1996an pê ve bi formateke nû heta niha jî weşana *Zendê* di gel hinek navber û astengîyan dewam dike.

Di naveroka hejmara 1'em ya *Zendê* (ya prova) de ev nivîsarên jêr derketine:

Naverok-3

Pêşgotin/*Zend*-4

Enstîtuya Kurdî û Kovara Wê/F. Huseyin Sağnıç-7

Di Sedemîn a Hatina Wî ya Dinê De, Celadet Alî Bedirxan/Felat Dilgeş-11

Em Bi Van Destên Bi Xwîn nakevin Sedsala Bîst û Yekemîn/Yaşar Kemal-31

Mirin Bê Wext Mirin Bêbext Bû/Yılmaz Güney-37

Destûr û Bernama Enstîtuya Kurdî/Stenbol *Zend*-41

Alfabeya Kurdî/Jamal Nebez-47

Di Alfabeya Kurdî de Babeta Minaqêşên Kronîk/Baran Rizgar-51

Ji Bo Forma alfaba Kurdî Ya Latînî, Ramanên li Ser Pêşeroja Zimanê Me/İsmet Chérif Vanly-59

Rastnivîs/F. Huseyin Sağnıç-63

Pirsgirêkek û Pêşniyarek/Malmîsanij-67

Bûyera Dengê/Torî-70

Çend Gotin Li Ser Alfabeya Kurdî/Felat Dilgeş-75

Çareserkirina Pirsgirêkên Alfabe û Rastnivîsa Kurdî/Rojhat Azadî-82

Çend Gotin Li Ser Zimanê Kurdî/Firat Cewerî-86 (*Zend*, [AZF]).

4.2.5.7. *Pelîn*

Ev kovar di sala 1998an de li Stenbolê derdikeve.

Kovara *Pelînê* di sala 1998an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Xwediyê wê li ser navê weşanxaneyê Dozê Ahmet Zekî Okçuoğlu ye. Ev kovar jî wek naverok di warê ziman û çanda Kurdî de gaveke girîng tavêjê lê zêde dom nake. Kovareke xwerû bi Kurdî ye heta du-sê salan bi awayekê derdikeve û weşana wê radiweste.

Naveroka hejmeta 2'emîn ya kovara *Pelîn* wiha ye:

Pewistiya lêbixwedderketinê/Îbrahim Seydo Aydoğan	2
Edebiyata Welatî/Kamuran Ali Bedirxan	10
Maxolan/Lal Laleş	12
Zilamek û Zimanek/Celadet Ali Bedirxan	14
Du Helbest ji Arjen Ari	17
Elyezerê Kurd/Mustafa Aydoğan	18
Dîsa got şane wî pîroz be/Melaye Cizîrî	26
Hawara Dicleyê-(roman. beş.1)/Mehmed Uzun	34
Şîrên Haware/Kamuran Alî Bedirxan	51
Pangin/Mehmet Saim	53
Rêzikên Dawiyê ên Helbesteke dirêj/Ahmet Erhan	56
Semîramîs/Renas Jiyan	57
Rojal Emin Bozan	64
Hevpeyvîn/Maykil Çayit-Mustafa Aydoğan	66
Qirdên Zare/Rojin Tibyati	84
Tu kî yî ... ?/Îbrahim Seydo Aydoğan	85
Reqsoreqso/E. Miran Janbar	90
Do Evarê/Şahinê Bekirê Soreklî	91
Guldesteyêke helbestan ji Barana Beravî	93
Sînor/Behram Dara	94
Xemgîniya Heyvê/Charles Baudelaire	95
Nave Mirine Tune/Zerdeşt Nînowa	96
Demên Bihurî/Suut Kılıç	98

Bajar/Kostantînos Kawafis/Renas Jiyan	102
Cihê Zarokên Cinna/Ciwanê Abdal	104
Di Berfê De Şop/ Ahmet T elli	110
Bextewariya Îdeolojik/Remezhan Alan	111
Kemîn/Serkeft Botan	119
Pel! Yaqub Tilermenî	120
Apê Reşo/ Pêkenok/ Berhevkar: Selahattin Bulut	123
Pirtûkxaneyê Pelinê	124
Qutîka Posteyê	126 (<i>Pelîn</i> , [AWÎB]).

4.2.5.8. *Pîne*

Ev kovar di sala 1999an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Ev kovar jî kovara pêşîn ya mîzahî ya xwerû bi Kurdî ye ku li bekur û Tirkîyeyê bi awayekî legal hatîye derxistin. Ji ber vê yekê Ev kovar jî din av xebatên Kurdî yên çandî yên Kurdên bakur de ciheke girîng digire.

Nivîsên mîzahî yên kesên wekî Mahmud Lewendî, Mûsa Anter, Karîkatorên kesên vekî Doğan Güzel û hwd.. di hejmarê kovarê ya pêşîn de hene.

Di beşa nasnameya kovarê de wiha dinivîse:

Kovara Panzderojî

- Xwedî : M. Nuri Karakoyun
- Gerîndeyê Giştî Mazlum Doğan
- Berpirsyarê Karên Nivîsaran: Abdurrahman Pekedis
- Kargerê Giştî (Gerîndeyê Giştî): Seyit Karabaş
- Rûpelsazî: A. Rahman Çelik (*Pîne*, [AWÎB]).

Ev kovar û rojnameyên ku me li jor dîyar kirin ên sereke yan jî wekî destpêk ên girîng ên wê serdemê ne. Ji xeynî van kovar û rojnameyan, di salên 1990an de piştî ku li Tirkîyeyê qedexeya li ser Kurdî radibe heta salên 2000an êdî pey der pey gelek weşanên Kurdan ên bi Kurdî yan jî Kurdî-Tirkî ji aliyê komên sîyasî yan jî sazî û dezgeyên sîyasî û çandî yên Kurdan ve tên derxistin. Lê gelek ji wan weşanan zêde dewam nakin û tên girtin.

4.2.6. Hin Kovar û Rojnameyên Din Ên Wê Serdemê Ku Cih Dane Kurdî.

Di vê serdemê de hin kovarên di jî hene ku ji aliyê sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurdan ve hatine weşandin. Ev kovar di gel ku navên hinek ji wan Kurdî bûne jî lê naverokên wan bi giştî sîyasî û Tirkî bûne. Hinek ji van kovaran cih dane nivîsên Kurdî jî. Hin ji wan kovarên wê serdemê emê kurteaghîyek li ser bidin.

4.2.6.1. *Newroz Ateşi*

Ev kovara bi navê *Newroz Ateşi* (Agirê Newrozê) di sala 1992yan de li Stenbolê derdikeve. Ev kovar bi Tirkî û Kurdî (Kurmancî û Dimilî) ye. Li ser navê kovarê bi Kurdî ev ibare heye: "*Karkerên hemû welatan û gelên bindest yek bin!*" Li bin navê kovarê jî bi Tirkî weha hatiye nivîsîn: "*Aylık teorik haber yorum dergisi*" (Kovara mehane ya teorik a nûçe û reveyî). Xwedî û gerîndeyê karûbarên nivîsan, (li ser navê, Med İletişim. Yayın. Tanıtım Sanayi ve Ticaret Ltd.) : Hüseyin Cici ye.

Ev kovar, nivîsên wê bi giştî Tirkî û li ser mijarên sîyasî ne. Lê hin nivîsên bi Kurdî jî tê de hatine weşandin (Malmîsanij û Lewendî, 412).

4.2.6.2. *Azadî*

Ev rojname di sala 1992yan de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Rojnameyeke polîtîk e. Di rojnameyê de di gel zimanê Tirkî nivîsên Kurdî jî hatine weşandin. Ev rojname jî di gel gelek zextan demeke dirêj weşana xwe didomîne. Ji 104 hejmarên wê 66 hejmar çawa ku derdikeve tê berhevkirin. Heta sala 1994an derdikeve û paşê ji aliyê dewletê ve tê girtin.

Xwedîyê rojnameyê, di destpêkê de li ser navê, Süreç Limited, Şirketi'yê Hikmet Çetin e. Gerîndeyê karên weşanan, İkramettin Oğuz e (Kaya, 203-204).

4.2.6.3. *Dengê Azadî*

Ev rojname di sala 1994an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Bi temamî 26 hejmar derdikeve. Xwedî, Müslüm Yucel e (Kaya, h.b.).

4.2.6.4. Ronahî

Ev rojname di sala 1995an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Berê vê bi vê navê li cîyên cihê çend kovar û rojname derketine. Ev rojnameya hefteyî jî bi giştî Tirkî ye lê di her hejmarê de nivîsên bi Kurdî jî tên weşandin. Bi temamî 72 hejmar derketiye û hatiye girtin (Kaya, h.b.).

4.2.6.5. Roj

Ev rojname di sala 1995an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Ev rojname hefteyî tê weşandin. Bi giranî çandî û edebî ye. Di her hejmarê de cî dide Kurdî jî. Bi temamî 26 hejmar tê derxistin û ji ber zexta dewletê tê girtin (Kaya, h.b.).

4.2.6.6. Hêvî

Ev rojname di sala 1996an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Ev rojnameya hefteyî di gel Tirkî cî dide nivîsên Kurdî jî. Li Stenbolê heta sala 1999an bi temamî 121 hejmar derdikeve. Paşê ji ber zextên dewletê çend hejmar jî li dervayê welat tê çapkirin (Kaya, h.b.)

4.2.6.7. Roja Teze

Ev rojname di sala 1999an de li Stenbolê dest bi weşanê dike. Ev rojname bi temamî 74 hejmar derdikeve û tê girtin (Kaya, 199-207).

4.2.7. Sazî û Navendên Çandî û Hunerî Ên Vê Serdemê

Eger ku mirov behsa pêvajoya sazî û dezgeyên çandî yên li bakur û li Tirkîyeyê bike, çend sazî hene ku di warê ziman, çand, huner û folklorê Kurdî de bûne serkanî û bingeha ji nû ve hişînbûna lixwevegerîna ziman û çanda Kurdî û mora xwe li vê pêvajoyê dane.

Bi saya van sazî dezgehan careke din Kurd wêrîne ku bi reng û dengê xwe li ziman û çanda xwe veşerîn û xwe ji tirsra xwebûnê rizgar bikin. Bi rêya van sazîyan gelek xebat û berhemên çand, huner û zimanê Kurdî hatine pêkanîn.

4.2.7.1. Navenda Çanda Mezopotamya

Navenda Çanda Mezopotamya (Mezopotamya Kûltûr Merkezi) di sala 1991yan de li Stenbolê tê avakirin. Ev sazî bi armanca ku di warê ziman, çand, huner û folklorê Kurdî de xebatan bike û di vî warî de perwerdehiyê bide ji aliyê komek biçûk ya rewşenbîrên Kurd ve tê avakirin.

Ji ber ku di warê fermî de qanûnên Tirkîyeyê rê nadin, sazî li ser bingeha şirketeke bazirganîyê tê avakirin. Şirket di bin navê “Yukarı Mezopotamya Kûltûr Merkezi Limited Şirketi” (Şirketa Lîmîted Ya Navenda Çanda Mezopotamyaya Jorîn) tê avakirin. Lê di rastîyê de sazî ne bi armanca bazirganîyê, bi temamî bi armanca kar û xebatên Kurdî yên çandî û hunerî tê avakirin.

Di demeke kurt de dengê mezîna dide û li gelek bajarên din şaxên xwe vedike.

Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM), di vî qonaxê de di werên xebat û çalakîyên çand û hunera Kurdî de yek ji sazîyên herî sereke ye. NÇM'yê di vî qonaxê de di gelek warên çand û hunera Kurdî de pêşengîyê kirî ye û gelek berhemên hunerî û folklorî yên Kurdî hilberandiye û hejmareke mezîna ji ciwanên Kurd li ser gelek babetên çand û hunera Kurdî perwerde kirî ye.

Ev sazî jî dema ku mirov bala xwe dide pêvajoy avakirina wê, wisa diyar dibe ku di vî qonaxê de di gel ku bi temamî di warê çand û huner de kar dike jî, wekî gelek xebatên çandî û rewşenbîrî yên Kurdan bi helwestên doza neteweyî ya sîyasî hatîye ava kirin.

Yek ji avakarê NÇM'yê, yê sereke İbrahim Gürbüz, di derbarê avakirina wê de wiha dibêje:

“Kurdan di têkoşîna azadbûn û neteweyîyê de di warê sîyasî û leşgerî de gelek pêşketin bi dest xistibûn, lê belê di warê huner, çand, zanistî û dîrokê de valahîyeke mezîna hebû. Ji bo ku ev valahî bê dagirtin pêwîstî bi sazîyek

hebû. Pêwîst bû ku ev sazî sazîyeke neteweyî bûya, sazîyeke çandî bûya, pêwîst bû hemû ezayên neteweyî di hundurê xwe de bihewandina û huner hilberanda, zanistî hilberanda, çand hilberanda. Li ser vê fikrê ev sazî hat avakirin. Ji xwe çawa ku Ehmedê Xanî gotîye, divê şûr û qelem li gel hev bin.”

Her wisa Filiz Oğuz jî ku yek ji damezrînerên NÇM'yê ye wiha dibêje:

“Di wê heyamê de hafizeya nivîskî ya gelê Kurd zeyîf bû. Bi armanca ku em di vê pêvajoya ku têkoşînê potansîyelek derxistibû meydanê de rê li pêşîya vê hafizeyê vekin û hafizeyeke nivîskî pêk bînin ev xebat hate kirin.” (Tekoğlu, Şûr û Qelem).

Di bin banê NÇM'yê de gelek beşên çandî û hunerî tên vekirin. Beşa şanoyê tê vekirin û li bakur û Tirkîyeyê cara pêşîn bi regekî profesyonel Şanoya Jîyana Nû tê avakirin û gelek listikên Kurdî tên nivîsîn û tên pêşkêşkirin. Xebatên perwerdehiya muzîkê tên destpêkirin û gelek komên muzîkê wekî “Koma Çîya”, “Koma Amed” Koma Agirê Jîyan”tên avakirin û gelek hunermend tên perwerdekirin. Cara pêşîn koroyeke zarokan ya bi navê “Kulîlkên Mezra Botan”tê avakirin. Paşê her ku diçe xebatên NÇM'yê dewlemendtir dibin ku koma muzîkê ya ku hemû endamên wê ji jinan pêk dihat bi navê “Koma Esmîn” di formata koroyek de tê avakirin ku ev jî di vî warî de gaveke nû bû ji aliyê xebatên hunerî de.

Di bin beşa xebatên folklorê de gelek komên govendê tên avakirin. Her wisa li ser gelek babetên çandî û hunerî yên wekî ziman û sînemayê jî gelek xebat tên kirin (Tekoğlu, *Şûr û Qelem*).

Ev sazîya ku yek ji saziyên herî sereke ya serdemê ye, di demeke kurt de li hin bajarên din jî bi heman armancê şaxên wê tên avakirin û li wan bajaran jî ev xebatên çandî û hunerî tên birêvebirin. Di sala 1993yan de li Îzmîrê şaxa NÇM'yê tê vekirin paşê li Edene, Dîyarbekir, Mersînê û Rihayê jî şaxên wê tên avakirin. Ev sazi di gel gelek zext û zordariya dewletê jî hê jî xebatên xwe didomîne.

4.2.7.2. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê

Piştî ku NÇM tê avakirin, di bingeha wê de gelek xebatên çandî, hunerî û lêkolînî jî wekî armanc tî destnîşankirin. Beşên çand, huner û zanistî tî avakirin. Li ser babetên wekî zimanê Kurdî, wêjeya Kurdî û dîroka Kurdî jî xebat tî destpêkirin. Piştî demeke kurt pêwîstiya birêxistinkirina beşeke xweser ya di van waran de derdikeve meydanê. Li ser vê bi pêşniyara Îbrahîm Gürbüz fikra avakirina enstîtuyeye Kurdî di lijneya rayedar ya NÇM'yê de tê guftûgo kirin û tê pejirandin. Li ser vê xebatên birêxistinkirina Enstîtuya Kurdî tî destpêkirin, piştî gelek xebatên avakirinê, wekî desteya damezrîner Musa Anter, Îsmail Beşikçi, Feqî Huseyn Sağrıç, Yaşar Kaya, Abdurrahman Durre, Cemşîd Bender û Suleyman İmamoğlu tî hilbijartin û di 18 Nîsan 1992yan de bi merasimek damezrandina Enstîtuya Kurdî tî pêkanîn. Lê di heman rojê de ji aliyê polîsan ve lewheya Enstîtuyê ku li ser “Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê” nivîsandîye tî daxistin. Lê Enstîtu heta roja îro jî xebatên xwe didomîne.

Enstîtuya Kurdî jî helbet wekî gelek sazîyên din ji ber astengîyên qanûnî wekî fermî li ser bingeha şiketeke limited ya bi navê “Zend Bilim Kültür Eğitim Limited Şirketi” de tê avakirin. Lê di rastîya xwe de Enstîtuya Kurdî wekî enstîtu tî birêxistin (*Kurtedîroka Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, (2002). Stenbol, 11-13).

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî vekî gelek sazî û dezgehên vê serdemê bi armanca xurtkirina têkoşîna mafên neteweyî ya gelê Kurd tî avakirin.

Yek ji damezrînerê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê yê sereke Îbrahîm Gürbüz e. Gürbüz di derbarê fikra avakirina Enstîtuya Kurdî de wiha dibêje:

“Di demên berê de ew tevgera sîyasî ya Kurd ku ez di doza wê de hatim darizandin di dereceya yekem de girîngî bi fikrên Mao Zedong dida. Mao Zedong di kitêba xwe ya bi navê “Kitêba Sor” de, û di gelek berhemên xwe yê din de dibêje ku ji bo gelên têkoşîna rizgarîya neteweyî didin pêwîstî bi du artêşan heye. Yek artêşa gel ya çekdarî, yek jî artêşa huner û çandê. Ev fikra Mao Zedong di hişmendîya min de cîyekî wê yê gelek girîng hebû. Ji ber vê yekê jî ji bo ku gelê Kurd karibe mafên xwe yê neteweyî bi dest bixwe min

gelek pêwîstî pê didît ku di vî warî de ev xebatên çandî bîn kirin. Bi vê ramanê me xwest ku digel sazîyên din di werê zanistî de enstîtuyeye Kurdî jî bê avakirin.” (Tekolu, *Şûr û Qelem*).

Hewldana Enstîtuyê Ya ji Bo Avakirina Weqfa Çanda Kurdî :

Di bin banê Enstîtuya Kurdî de xebatên weqfek jî tîn kirin. Piştî pêvajoyeke dirêj ya amadekarîyan ji aliyê endamên enstîtuyê û di gel hin rewşenbîr û sîyasetmedaran ve biryara avakirina weqfê tê dayîn. Bi navê “Weqfa Çanda Kurdî” rêzîknameya weqfê tê amadekirin û wekî damezrîner kesên wekî Musa Anter, İsmail Beşikçi, Melik Fırat, Hatip Dicle, İbrahim Gürbüz, Eşber Yağmurdereli, Ahmet Türk, Feqî Huseyn Sağnıç, Münir Ceylan, Faik Bulut, û Filiz Oğuz tîn dest nîşankirin û di 22 Pûşper 1994an de serlêdana fermî ya “Weqfa Çanda Kurdî” tê kirin. Lê belê piştî gelek hewldanan jî weqf ji aliyê sazîyên fermî ve nayê pejirandin û ev hewldan di dawîyê de nagihîje armanca xwe. Sazî her bi navê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê dimîne û xebatên xwe didomîne (*Kurteîroka Enstîtuya Kurdî*, 29).

Xebatên Enstîtuyê :

Di nav xebatên enstîtuyê de, bi taybetî xebatên amadekirina ferheng û materyalên perwerdehîya zimanê Kurdî cîyekî girîng digire. Xebatên tomarkirin û çapkirina berhemên zargotina Kurdî û xebatên li ser edebîyata klasîka Kurdî jî cîyekî girîng girtîye. Di gel van xebatên nivîskî di bin banê enstîtuyê de bi berdehamî qurs û perwerdehîya zimanê Kurdî tê domandin û gelek xwendevan, mamoste û nivîskar di encama van xebatên enstîtuyê de giheştine.

Her wisa di pêvajoya domdarîya enstîtuyê de gelek panel û konferans ji aliyê enstîtuyê de li ser babetên Kurdî hatine birêvebirin û beşdarî li gelek sempozyûman hatiye kirin (*Kurteîroka Enstîtuya Kurdî*, 130).

Wekî endamek Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ku min bi xwe jî din av gelek xebatan de cih girtîye ez dikarim bibêjim ku heta niha di nav xebatên enstîtuyê de bi taybetî ferhengên zimanê Kurdî, ferhengên biwêj û gotinên pêşîyan ên Kurdî û pirtûkên fêrkirina Kurdî, bi dehan kitêbên edebîyata klasîka Kurdî û berhevokên zargotina

Kurdî hatine çapkirin û kovara Zend'ê ya lêkolînî jî ev zêdetirê 20 salan e tê weşandin.

Her wisan di çarçoveya xebat û qursên perwerdehîya Kurdî de jî her demsal bi sedan kes hatine perwerdekirin û gelek mamosteyên zimanê Kurdî hatine gihandin.

Berhemên Sereke yên ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve hatine amade kirin û çapkirin ev in:

1. *Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük*(Ferhenga Mezin ya Tirkî-Kurdî)/Amadekar: Zana Farqînî.
2. *Ferhenga Kurdî-Tirkî*/Amadekar: Zana Farqînî
3. *Ferheng/Sözlük Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe*/Amadekar: Zana Farqînî
4. *Ferhenga Biwêjan*/Mustafa Boraq
5. *Deyimler Sözlüğü, Ferhenga Biwêjan*/Dilawer Zeraq
6. *Hîsker*(Asta Yekem/Asta Duwem/Asta Sêyem)
7. *Dîroka Wêjeya Kurdî*/Feqî Huseyn Sağniç
8. *Rojî Kurd*(Transkrîbe û Werger)
9. *Kovara Zend* û gelek berhemên li ser çand û wêjeya Kurdî.

4.2.7.3. Kürt Kültür ve Araştırma Vakfı/Kürt-Kav

Bingeha avakirina weqfa Kürt Kültür ve Araştırma Vakfı/Kürt Kav(Weqfa Çandî û Lêkolînî Ya Kurdî)ê bi lêgerîna komek sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd ya derbarî helwesta pêşlêgirtina zext û zilma li ser Kurdan dest pê dike. Ev koma ku bi giştî li Stenbolê niştecî bibûn li dû qetlîama Helebçeyê dikevin nav hewldanekê û di bihara 1991an de bi navê “Kürt Soykırımını Önleme Komitesi”(Komîteya Pêşlêgirtina Kokbirîya Kurdan) însiyatîfek avadikin û belavokek belav dikan. Paşê ji aliyê van kesan ve di gel beşdarîya hin kesên din ve di heman salê de bi 130 kesan civînekê tê lidarxistin û di encamê de bi navê “Kürt Hak ve Özgürlükler Girişim Komitesi”(Komîteya Teşebûsa Heq û Azadîyên Kurdan) însiyatîfek ji 20 kesan pêkhatî tê avakirin. Bi demên pêş re di rêzê civînên vê komîteyê de hin cudatîyên fikrî û helwestî derdikevin pêş.

Li ser pêşketina mînaqêşeyan sê helwest derdikevin:

1. Hinek ji endamên komîteyê dixwezin ku sazî wekî sazîyeke sîyasî bê sazîkirin û bi tevgera sîyasî ya radîkal re tev bigere.
2. Hinek ji endamên din jî dixwestin wekî sazîyek sîyasî ya xweser bê sazîkirin.
3. Beşek mezin ên endaman jî dixwestin ku ji hemû tevgerên sîyasî re di heman mesafeyê de sazîyeke pirreng, demokratîk û sazîyeke xebatên zanistî û akademîkî be.

Li ser van nîqaşan hin kom ji komîteyê vediqetin rêya xwe cuda dikin. Beşa mezin ku dimîne xebatên xwe didomîne. Di encama nîqaşan de biryar didin ku bi navê “Kürt Hak ve Özgürlükler Vakfı”(Weqfa Heq û Azadîyên Kurdan) weqfek ava bikin.

Li ser vê di encama gelek xebatan de rêzîknameya weqfê tê amadekirin û di 07.09.1992yan de avakirina weqfê tê îlan kirin û serlêdana fermî tê kirin. Lê serlêdan ji aliyê dezgeyên resmî ve nayê pejirandin û pêvajoya qanûnî bi salan didome. Paşê li ser hin ihtîmalên ku dikare ji aliyê qanûnî ve neyê pejirandin navê weqfê wekî “Kürt Kültür ve Araştırma Vakfı/Kürt-Kav”(Weqfa Çandî û Lêkolînî ya Kurdî) tê guherandin û di encama gelek hewldanan de di roja 16.01.1996an de weqif tê tescîl kirin. Wekî damezrîner hin kesayetên wekî Şerafettin Elçi, Nazif Kaleli, Medet Serhat, Yılmaz Çamlıbel, 98 kesên sîyasetmedar, rewşenbîr û aktîvîst di avakirina weqfê de cih digirin.

Di destpêkê de wekî rêveberîya demkî 12 kes tî wezîfedarkirin:

Seerokê demî yê weqfê: Şerafettin Elçi, Rêveberên Demî: M. Ali Eren, Hasan Deniz, Yılmaz Çamlıbel, Refîk Karakoç, İbrahim Aksoy, Cemal Özçelik, M. Emin Kardeş, Remzi Çakın, Mehmet Parlak, Ali Beyköylü

Paşê di kongreya yekemîn ya asayî de rêveberîya weqfê wiha ye:

Serokê weqfê: Yılmaz Çamlıbel,

Rêveberî: M. Celal Baykara, Bahattin Ayaz, Ali Beyköylü, M. Emin Kardeş, Cemal Özçelik, Latif Epözdemir, Nurettin Basut, Zeynep Baran, Hatip Mercan, Mehmet Parlak.

Armanc û xebatên weqfê wiha tî destnîşankirin: *“Lêkolîna li ser ziman, çand, edebîyat, dîrok, hunera Kurdî, lêkolîna li ser zanistî, aborî, tendurustî, spor û*

maf û azadiyan û pêkanîna çalakîyan û biştevanîya ji bo pêşketina gelê Kurd ya di warê ferdî û civakî de.”

Navenda weqfê li Tarlabaşîya navçeya Beyoğlu ya Stenbolê ye. Teybetîya vê weqfê ya herî girîng di dîroka Tirkîyeyê de cara pêşîn ev sazî ye ku bi navê Kurd wekî fermî hatîye qebûlkirin û tescîlkirin.

Kurd-Kav di nav vê pêvajoyê de li ser ziman, çand, û li ser meseleyên sîyasî yên Kurdan, gerek li navenda sazîyê, gerek li deverên din û li dervayê Tirkîyayê gelek xebat û çalakîyan pêk anîye. Gelek caran qursên zimanê Kurdî pêk anîye. Gelek panel û konferansan pêk anîye. Gelek caran ji bo bidestxistina mafê perwerdehiya Kurdî serî li sazîyên fermî daye. Gelek çalakîyên çandî û hunerî di bin xebatên weqfê de hatine birêxistin û pêkanîn (Çamlıbel, (2005). İstanbul).

Heta niha di gel ku gelek sazî û dezgeyên çandî yên Kurdî yan ji aliyê dewletê ve yan jî ji ber sedemên cuda hatine girtin jî lê Kurd-Kav hêj dimîne.

Helbet di vê pêvajoyê de hin sazî û dezgeyên Kurdan yên çandî û hunerî yên din jî hene ku hatine vekirin û piştî demek hatine girtin. Pêwîst e ku qala wan jî bê kirin. Ên ku tên zanîn ev in:

4.2.7.4. Halk Kültürü Araştırma Derneği

Ev komeleya bi navê Halk Kültürü Araştırma Derneği(Komeleya Lêkolîna Çanda Gel) ji aliyê komeke sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd ve di sala 1989an de li devera Aksaraya Stenbolê tê avakirin.

Wekî fermî avakar û rêveberên vê komeleyê ev kes in: Üzeyir Avcı, Nezir Çetinkaya, Behçet Epözdemir, Serhat Karataş, Ali Çelik, Reşit Güteryüz.

Taybetîya herî girîng ya vê komeleyê ev e ku piştî derbeya 12 Êlûnê komeleya pêşîn ya ku ji bo çanda Kurdî vebûye ev komele ye.

Komele li ser çand û pirsgerêka Kurdî hin aktîvîteyan pêk tîne. Çalakîyên wekî panel û guft û go pêk tîne. Li ser govenda Kurdî xebatên perwerdehiyê pêk tîne, Di nav aktîvîteyên komeleyê de li ser şanoyê hin xebat tên kirin û lîstika bi navê “*Dawîya Dehaq*” û hin mîzansenên din tên pêşkêşkirin. Lê temenê komeleyê zêde

berdewam nake û derdorê salek û sal û nîvek xebata komeleyê didome û komele ji alîyê dewletê ve di sala 1991'ê de tê girtin (Epözdemir B.).

4.2.7.5. Halk Kültür Derneği

Piştî ku ev komeleya bi navê Halk Kültürü Araştırma Derneği(Komeleya Lêkolîna Çanda Gel) tê girtin bi demekê dîsa ji alî van heman kesên derdora komeleya navborî ve di sala 1992yan de Halk Kültür Derneği(Komeleya Çandî Ya Gel) tê avakirin. Ev komele jî hewl dide ku li ser çand û folklorê Kurdî hin xebatan bi pêş bixe, lê piştî demeke kurt di heman salê de ji alîyê dewletê ve rastî zextan tê û komele tê girtin (Epözdemir B.)

4.2.7.6. Stran Kültür Merkezi

Piştî ku Halk Kültür Derneği(Komeleya Çandî Ya Gel) tê girtin ji alî wê koma derdorê vê komeleyê ve dîsa di sala 1992yan de bi navê Stran Kültür Merkezi(Navenda Çanda Stran) li devera Aksaraya Stenbolê sazîyek tê avakirin. Ev sazî li ser bingeha şirketeke bazirganî tê avakirin. Di bin banê vê sazîyê de jî li ser ziman, çand û folklorê Kurdî xebatên kirin û hin aktîvîteyên çandî û hunerî tîn birêxistin.

Li ser şanoya Kurdî, govenda Kurdî, muzîka Kurdî hin komên xebatê tîn birêxistin û hin deman dersên zimanê Kurdî jî tîn pêkanîn. Koma muzîkê ya bi navê “Koma Dengê Azadî” tê avakirin û bi salan stranên Kurdî ji alî komê ve tîn pêşkêşkirin. Ev sazî jî di sala 1999an de tê girtin (Epözdemir B.).

4.2.7.7. Med Kom

Med-Kom ji alîyê komek sîyasetmedar û rewşenbîrên Kurd ve di sala 1996an de li navçeya Beyoğlu ya Stenbolê tê avakirin. Hin kesên wekî Hakim Daş û li gel çend hevalên vê sazîyê avadikin.

Ji ber astengîyên qanûnî ev sazî jî wekî gelek sazîyên Kurdan ji alîyê fermî ve li ser şirketeke lîmîted ya bazirganî tê avakirin. Ev sazî jî bi armanca ku li ser çand,

huner û zimanê Kurdî xebatan bike û her wisa piştgirîya çareserîya meseleya Kurdî bike tê vekirin. Di sala 1999an de tê girtin (Daş, H.).

4.2.7.8. Çapxane û Weşanxaneyên Kurdî

Li bekur û Tirkîyeyê tê zanîn ku hê di serê sedsala 20an, ji dema Osmanîyan de teşebus û hewldanên çapxane û avakirina weşanxaneyên Kurdî hene. Lê belê heta ku tê salên 1970yan mirov rastê tu weşanxaneyê Kurdî ku karibe di nav demekê de wekî weşanxaneyek bi rêk û pêk hinek berhemana çap kiribe nayê. Di salên 70yan de çend weşanxaneyên Kurdî tînin avakirin ev jî bi piranî kitêbên bi zimanê Tirkî çap dikin.

Di serê sedsala 20an de çend hewldan û destpêk hene. Dema ku rojnameya pêşîn ya Kurdî li Qahîreyê tê derxistin, di Çapxaneyê Rojnameya *Kurdistan* de tê çapkirin.

Tê zanîn ku di sala 1911an de li Qahîreyê çapxaneyek Ferecullah Zekî El Kurdî ya bi navê ‘Metbea Kurdistan Îlmîye(Çapxaneyê Kurdistan ya Zanistî) heye. Her wisa tê zanîn ku Ehmed Remîzê Licîyî û Xelîl Xeyalîyê Motkî di gel hevalên xwe li Stenbolê di sala 1908an de “Weşanxaneyê Kurdî” saz kirine. Dîsa tê zanîn ku di sala 1910an de li Stenbolê çapxaneyê Kurdek Dîyarbekirî bi navê Matbaayî Amedî(Çapxaneyê Amedê) hebûye û kitêbên Kurdî çapkirine (Malmîsanîj, (2006). İstanbul: 33-34).

Piştî Meşrûtiyeta IIyan li gel komele û weşanên Kurdî 1-2 weşanxane jî tînin avakirin.

Di sala 1912an de piştî ku komeleya Hêvî tê avakirin ji aliyê rêveberên Hêvîyê ve bi navê “Kurd Taamîm-i Ma’arif ve Neşrîyat Cem’iyetî(Komeleya Belavkirina Zanîna û Weşanê ya Kurdan)” tê avakirin. Her wisa di bin banê Kurdistan Tealî Cemîyetî(Komeleya Bilindkirina Kurdistanê) de jî di heman wextan de “Kurd Asari Tedkîk Cem’iyetî(Komeleya Lêkolînên Berhemên Kurdî) hatîye avakirin. Û tê zanîn ku *Mem û Zîn*’a Ehmedê Xanî û hinek kitêbên din bi hevkarîya van herdu komeleyan ango weşanxaneyan hatine çapkirin. Tê zanîn ku Ekrem Cemîl Paşa li Dîyarbekirê çapxaneyek avakirîye û di sala 1918an de rojnameya *Gazî*’yê çapkirîye (Serfiraz, 65-67).

Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê heta salên piştî 1975an tu bingeh yan jî sazîyek weşanên Kurdî tune ye û heta sala 1965an jî ji xwe tu weşan an jî kitêbek bi Kurdî li bakur û Tirkîyeyê nayê çapkirin. Li ser hinek wegûherînên li Tirkîyeyê hin hewldanên çandî pêk tên. Di sala 1965an de cara pêşîn kitêbeke pîyesê *Birîna Reş* ji aliyê Musa Anter ve tê çapkirin. Çend kitêbên din jî tên çapkirin û bi derbeya 1971an re cereke din zexta li ser Kurdî zêde dibe, heta sala 1975an tu kitêbeke Kurdî dernakeve. Piştî 1975an heta 1980 bi temamî 9 kitêbên Kurdî tên çapkirin.

Piştî ku tevgerên Kurd yê sîyasî derdikevin meydanê her tevger organa xwe ya sîyasî jî derdixe. Hin tevger weşnaxaneyên xwe jî ava dikin û kitêban çap dikin (Malmîsanij, 47-48).

Di salên 1974an de ji aliyê tevgera Rizgarîyê ve weşnaxaneya Komal tê avakirin. Cara pêşîn weşnaxaneya ku bi rêk û pêk wekî weşnaxaneyeke Kurdî bi karê çapkirina pirtûkan radibe ev weşnaxane ye. Pişt re di nav weşanên tevgera Özgürlük Yolu (Rêya Azadî) û hin tevgerên din de jî hin kitêbên tên çapkirin, lê bi giştî kitêbên bi zimanê Tirkî tên çapkirin.

Paşê di sala 1989an pê ve û bi taybetî piştî ku qedexeya li ser zimanê Kurdî rabû hêdî hêdî weşnaxaneyên Kurdî hatine avakirin. Hin weşnaxane heta îro jî hê karê xwe didomînin, lê gelek weşnaxane jî piştî demeke kurt hatine girtin.

Weşnaxaneyên Kurdî yê ku li vê qonaxa dawî ya heta sala 2000an hatine avakirin ên sereke ev in:

Deng : Stenbol, Avabûn, 1989

Doz : Stenbol, Avabûn, 1990

Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê : Avabûn, Stenbol, 1992

Nûbihar : Stenbol, Avabûn, 1992

Avesta : Stenbol, Avabûn, 1995

Pêrî : Stenbol, Avabûn, 1997

Aram : Stenbol, Avabûn, 1997

Helbet em dizanin ku ji xeynê van hinek weşnaxaneyên din jî hatine avakirin û her wisa hinek weşnaxaneyên Tirkî jî hin kitêbên Kurdî çap kirine. Bi taybetî piştî

salên 2000an li hin bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkîyê gelek weşanxaneyên din jî vebûne. Lê qesta me bêtir weşanxaneyên Kurdî yê berî salên 2000'î ne.

Piştî salên 2000an pê ve û van salên dawîyê çand weşanxaneyên wekî Belkî, Lîs û J&J li Dîyarbekirê weşangerîya Kurdî dikin û herwisa van salên dawîyê li Wanê jî weşanxaneya Sîtav weşangerîya Kurdî dike.

Di vî derbarî de M. Malmîsanij dibêje ku di vê serdemê de heta salên 2006an nazîkî 40 weşanxaneyên Kurdî vebûne, lê piraniya wan piştî çapkirina çend kitêban jî ber sedemên aborî yan jî qanûnî hatine girtin Piştî salên 2000an pê ve hin weşanxane navendê xwe li Dîyarbekirê ava dikin (Malmîsanij, 59-61).

Di vê serdemê de di gel van weşanxaneyên Kurdî hin weşanxaneyên din ên Tirkî jî hene ku kitêbên Kurdî çapkirine. Ev weşanxane jî ber ku di nav bergeha vê xebatê de nîn in emê li ser van ranewestin.

Di gel vê qasê bi taybetî piştî salên 2000an pê ve bi pêşketina înternetê re weşanên Kurdî yê dijîtal jî dest pê dikin. Niha li ser gelek malperan gelek berhemên Kurdî tên weşandin.

4.2.8. Li Bakur Huner û Edebîyata Kurdî Ya Nûjen

Edebîyata Kurdî di qonaxên dûr û dirêj re derbas bûye û heta roja me ya îro hatîye. Di sedsalên borî de edebîta Kurdî jî mîna edebîyata gelek gelên din di qonaxa xwe ya klasîk de heta astek bi pêş ketîye û gelek berhem afirandine.

Hin lêkolîner dîroka destpêka edebîyata Kurdî ya nivîskî heta 330 sal berê zayînê dibin. Di vî derbarî de hin çavkanî destnîşan dikin ku helbesteke Kurdî ya ku li ser kevirek bi herfên mîxî hatîye nivîsîn li devera Hewreman hatîye dîtin, berî zayînê di sala 330yan de jî alîyê kesekî bi navê Boraboz yan jî Porapoj ve hatîye nivîsîn. Û didin zanîn ku ev berhema dîrokî niha di Muzeya Londonê de tê parastin. Herwisa behsa çend helbestên kesên din ên Kurdî ku ji salên berîya zayînê û ji berîya Îslamê mane jî tê kirin (Temo, (2007), İstanbul: XLV-LI). Lê zêde agahîyên zelalên berbiçav di derbarî van çavkanîyan de tunene.

Di serdema edebîyata klasîka Kurdî de wekî berhemên pêşîn helbestên şairên ku bi zaravayên Goranî û Loranî nivîsîne tên destnîşankirin. Helbestên bi zaravayê

Goranî yê Baba Serhengê Dewdanî (mrn. 1007) û bi zaravayê Lorî yê Baba Tahirê Uryan (mrn.1010), (Adak, (2013), Stenbol, 30).

Bi zaravayê Kurmancî û Soranî paşê nivîsên edebî tînan nivîsîn. Bi zaravayê kurmancî gelek beyt û qewlên dîne êzdîtiyê hene ku ji sedsalên 11 û 12'ê zayînî de hatine ku ev wekî edebîyata êzdîyan tînan nîşandan.

Ji xeynî çend nimûneyan helbesta klasîka kurmancî bi giştî bi Elîyê Herîrî tê destpêkirin. Ji ber ku helbestên wan şairên berî Elîyê Herîrî ji xeynî çend parçenimûneyan li ber dest tune gelek kes Elîyê Herîrî (ss. IX) wekî helbestvanê yekem ên kurmancî qebûl dikin. Di sedsalên XVI û XVIIIan de gelek helbestvanên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Meleyê Bateyî û Ehmedê Xanî derdikevin û helbesta klasîka Kurdî digihîje asteke bilind (Adak, 181-190).

Ji ber ku ev babet mijara vê xebatê nînan e, em ê zêde behsa vê pêvajoyê nekin. Mijara xebata me serdema nûjen û bi taybetî qonaxa dawî ya Kurdên bakur û Tirkîyeyê ye.

Di salên destpêka sedsala 20an de fikr û daxwazên neteweperweriyê di nav rewşenbîrên Kurd de jî pêk tê. Li ser vê xebatê çapemenî û xwe birêxistinî jî di vê qonaxê de dest pê dikin. Edebîyata Kurdî ya nûjen jî bi van hewldanên nûjen re dest pê dike.

Edebîyata Kurdî ya nûjen jî her wekî hemû babetên din ji salên destpêka sedsala 20an pê ve ji ber rewşa siyasî û civakî ya Kurdistan li parçeyên cuda û bi zaravayên cuda bêyî ku zêde têkilîyek di navbera wan de hebe heta salên dawî yê sedsala 20an heta radeyek bi pêş ketîye.

Di serê sedsala 20an de pirranîya rewşenbîrên Kurd li paytexta Osmanî Stenbolê kom bibûn. Li ser pêşketinê li cîhanê û pêşketina fikra neteweyî ya Kurd bingeha xebatê nûjen ên rewşenbîrî li Stenbolê tê avêtin.

Di serê sedsalê de li ser fikra neteweyî gelek komele û gelek kovar û rojname ji aliyê rewşenbîr û siyasîmedarên Kurd ve tînan saz kirin. Bingeha xebatê çandî yê nûjen yê Kurdî jî di van salan de li ser vê zemînê tê danîn.

Nimûneyên pêşîn yê edebîyata Kurdî ya nûjen, li vê zemînê derdikevin. Lê belê hêj ku erdeke saxlem ji bo hişînbûna çand û hunera Kurdî ya nûjen pêk nehatibû, bi tîkçûna dewleta Osmanî re Kurd belav dibin û edebîyata Kurdî li parçeyên cuda cuda bêyî ku peywendî hebin di nav şert û mercên cuda de dewam

dike. Piştî têkçûna dewleta Osmanî heta salên dawî yê sed sala 20'emîn edebîyata Kurdî bi giştî li sê deveran derfeta jiyane dibîne. Li Sûriyeyê û li Ermenistana Sovyetê bi zaravayê kurmancî û li başûr û Iraqê jî bi zaravayê soranî xebatên edebîyata Kurdî pêk tên û gelek berhemên edebî derdikevin.

Li parçeya Îranê û bi taybetî li başûrê Kurdistanê hê di dawîya salên 1920an de xebatên rewşenbîrî û hewldanên edebî dest pê dikin. Piştî dewleta Osamanî gelek ji rewşenbîrên Kurd vedigerin Iraqa di bin hukmê Îngilîzan de, bi taybetî wekî navend li Silêmaniyê û li herêma zaravayê soranî ji aliyê kesên wekî Pîremêrd, Refîk Hilmî, Mihemed Emîn Zekî, Huseyîn Husnî Mukrîyanî, û hwd. ve gelek hewldanên rewşenbîrî, edebî tên kirin û li vir jî bingeha edebîyata nûjena Kurdî tê avêtin. Kovar û rojnameyên wekî *Pêşkewtin*, *Jiyanewe*, *Zarî Kurdistan* û hwd. tên derxistin. Berhemên edebîyata nûjen tên weşandin. Ji aliyê nivîskar û şairên wekî Goran, Dildar, Zêwer, Faîq Bêkes û Îbrahîm Ehmed ve edebîyata Kurdî tê bipêş xistin.

Di serdema Komara Mehabadê û pê re jî li beşa Îranê gelek hewldanên rewşenbîrî çêdibin, kovar û rojnameyên wekî *Kurdistan*, *Niştiman û Hala* tên weşandin û ji aliyê şair û nivîskarên wekî Hejar, Hêmin, Hesên Qizilcî, Rehîmê Qazî û hwd. ve edebîyata Kurdî tê bipêş xistin.

Li Sûriyeyê li Şamê li derdorê kovara *Hawarê* kesên mîna Celadet Elî Bedirxan, Kamuran Bedirxan, Cîgerxwin, Osman Sebrî, Qedrîcan, Nûredîn Zaza û hwd. gelek xebatên edebî pêk tînin. Her wisa li welatên Soveyê, bi taybetî jî li Ermenistanê li derdorê rojnameye *Rêya Teze* gelek xebat li ser Kurdî tên kirin û di qonaxa destpêkê de ji aliyê kesên wekî Casimê Celîl, Emînê Evdal, Qanadê Kurdo, Ere Şemo, Hecîyê Cindî, Xelîl Miradof û hwd. ve gelek xebat li ser edebîyata Kurdî tên kirin û gelek berhem derdikevin. Pişt re di qonaxa piştî salên 1950yan pê ve şair û nivîskarên wekî Şikoyê Hesên, Firîkê Ûsiv, Mikaîlê Reşîd, Karlanê Çaçan, Tosinê Reşîd, Eskerê Boyîk, Elîyê Evdirrehman û her wisa gelek kesên din jî li welatên Sovyetê edebîyata Kurdî bi pêş dixin gelek berhem diafirînin. (Uzun, (2003), Stenbol, 37-49) Her wisa piştî derbeya leşgerî ya 12'yê Êlûnê qonxeke edebîyata Kurdî ya nûjen li welatên Ewropa jî dest pê dike. Bi taybetî ji aliyê Kurdên bakur ve gelek sazî û dezgehên Kurdî tên avakirin û gelek weşan û berhem tên derxistin. Ji aliyê kesên wekî Mehmet Uzun, Mahmud Baksi, Hesên Metê, Zeynelabidin Zinar, Mehmet Emîn Bozarşan û hwd. ve gelek berhemên edebî, kurteçîrok, helbest û roman tên

nivîsîn û çapkirin. Lê ev mijara xebateke xweser e. Li vir em dê zêde behsa vê mijarê nekin.

Li alîyê din eger em bîn ser mijarê heta salên 1990an li bakur û Tirkîyeyê zemîneke ku edebîyata Kurdî li ser hişîn bê pîr kêm e. Ji ber wê yekê jî ji xeynî hin îstîsnayan heta salên 1990an û pê ve tu berhemek edebîyata Kurdî li bakur û Tirkîyeyê dernakeve. Lê piştî salên 1980 û pê ve dema ku hejmareke zêde ji Kurdên bakur ji ber sedemên sîyasî diçin welatên Ewropayê, li wan welatan dîyasporayeke Kurdan pêk tê û xebat û berhemên edebî jî derdikevin.

Berê salên 1990an li bakur û li Tirkîyeyê berhemên edebî yên Kurdî ku derketine pîr kêm in. Piştî ku ji alîyê Kurdan ve ji salên 1960an pê ve hin kovar û rojname tîn weşandin, di wan weşanan de hin berhemên edebî yên Kurdî tîn weşandin.

Ji sala 1923yan heta sala 1980yan li Tirkîyeyê bi temamî 20 kitêbên Kurdî tîn çap kirin. Ev jî hin kitêbên edebîyata Kurdî ne, hin kitêbên li ser ziman in û çend kitêbên helbest û çîrokan in. Di vê qonaxê de cara pêşîn di sala 1965an de pîyesa, Musa Anter, *Birîna Reş* tê çapkirin (Malmîsanij, (2006). Stenbol: 44-48). Paşê heta sala 1980yan çend berhemên Kurdî edebî jî derdikevin. Piştî sala 1980 heta ku di gihê salên 1990an pê ve ku qedexeya li ser Kurdî radibe tu berhemek edebîyata Kurdî li Tirkîyeyê nayê çapkirin.

Di salên 1990an de piştî ku li Tirkîyeyê rewşa sîyasî heta radeyek normal dibe û rola partîyên sîyasî hinek zêde dibe derdorên sîyasî yên Kurd jî dikevin nav lêgerînê. Derdorên wan kom û tevgerên sîyasî, yên berê darbeya 12'ê Êlûnê car din dixwezî xwe ava bikin. Li ser vê armançê her wekî qonaxên berê car din pêşî wekî navend li Stenbolê hin sazî û dezgeyên çandî tîn avakirin û hin kovar û rojname tîn derxistin. Li bakur û Tirkîyeyê berhemên edebîyata Kurdî jî carek din bi van dem û dezgeh û weşanan re derdikevin.

Wekî ku me li jor dîyar kiribû sazîyên wekî, Navenda Çanda Mezopotamya, Navenda Çanda Stran, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Kurd-Kav, Medkom û kovarên wekî *Rewşen*, *Nûbihar*, *Zend* û *Deng* paşê jî *Vate* di geşebûna ziman û edebîyata Kurdî de rolek girîng dileyîzîn.

Di vê qonaxê de her çend ev sazî û dezgeh hemû jî bi helwestên sîyasî hatibin sazîkirin jî lê di encam de bûn bingeha avabûn û geşbûna zimanê Kurdî û gelek şair, çîroknivîs û romannivîs giheştin û berhem dan.

Bi aweyekî giştî dema em li rewşa vê serdemê binêrin û rewşa xebat û berhemên wê serdemê wiha ye. Di nav dehsalên piştî salên 1991-1992an de li bakur û Tirkîyeyê, bi qasî ku min tesbît kirine di derbarê Kurdan de bi qasî 1500 heb kitêb hatine çapkirin. Ji van kitêban 160 heb bi Kurdî ne. Ji van 160 kitêbên Kurdî 90 heb kitêbên dîwan, çîrokên gelêrî, roman yan jî kurteçîrok in. Ji van jî 15 heb romanên Kurdî ne (yek jê wergera kitêba M. Gorkî, *Karkerên Nonê* ya (Dimilî) ye. Kitêbeke piyesê ya Felat Dilgeş jî bi navê *Kula Dêrsimê* hatiye çapkirin (Ronî, (2004). Stenbol: 135-146).

4.2.8.1. Kurteçîroka Kurdî Li Bakur

Piştî salên 1960an heta piştî salên 1990an pê ve ji bilî çend nimûmeyan mirov li bakur û Tirkîyeyê rastî tu berhemek kurteçîrokan nayê. Di salên dawîya 1970yan de çend kurteçîrokên Filît Totanî di kovara *Tîrêj* de tên weşandin. Her wisa kitêbeke kurteçîrokan ya bi navê *Meyro* ya Mehmet Emîn Bozarslan tê çapkirin. Wekî din jî heta salên 1990an tu berhemek dernakeve.

Di van salên mijara gotinê de hê nû çîroknivîsîn dikeve jiyana Kurdan ya edebî. Ew jî bi rêya weşanên wekî kovar û rojnameyan tên belavkirin. Herçî ku kurteçîrokên wekî kitêb hatine çapkirin pirr kêr in. Heta salên 2000an bi temamî 15 kitêbên kurteçîrokan hatine çapkirin. Ji van jî 8 heb bi Kurdî hatine nivîsîn yê din jî ji zimanên din hatine wergerandin bo Kurdîyê. Ji van 8 kitêbên ku bi Kurdî nivîsîne û ew kitêb li Bakur çap bûne ev in: *Qolinc/Torî*, *Bayê Azadiyê/Lokman Polat*, *Girnewas/Hasan Kaya*, *Xezala Min Delala Min/Rahmetullah Karakaya*, *Jinên Qatên Bilind/Helîm Yusiv*, *Mirî Ranazîn/Helîm Yusiv*, *Mêrê Avis/Helîm Yusiv*, *Kelevajî/Kamîran Haco*. Kitêbeke piyesê ya Felat Dilgeş jî bi navê *Kula Dêrsimê* hatiye çapkirin.

Ev kitêbên kurteçîrokan 4 heb jê ji aliyê Kurdên başûrê biçûk ve hatine nivîsîn, 4 jî ji aliyê Kurdên Bakur ve. Helbet nivîskarên ku ji Bakur in, lê li Ewropayê dijîn û

kurteçîrokên xwe li Ewropayê nivîsîne jî hene, wekî Hesenê Metê, Firat Cewerî, Mahmud Baksî, hwd., lê ew jî mijareke din e.

Ew kesên ji Bakur in û berhemên xwe li Bakur nivîsîne û di vê serdemê de wekî kitêb çapkirine ev in:

- 1- Torî/*Qolinc*
- 2- Lokman Polat/Bayê Azadiyê
- 3- Hasan Kaya/*Girnewas*
- 4- Hamdullah Karaya/*Xezala Min Delala Min*

Ji bilî van helbet gelek kesên din jî di wan salan de li Bakur kurteçîrok dinivîsin. Lê berhemên wan di vê qonaxê de wekî kitêb çap nebûne.

Ji bo ku rewşa wê serdemê bê zanîn mirov dikare hin tesbîten din jî bide nîşan. Bi qasî ku me karîye em tesbît bikin nêzîkî 150 kesan kurteçîrok yan jî pexşanên edebî nivîsîne û ev berhemên wan di kovar û rojnameyên wekî *Jiyana Rewşen*, *Azadiya Welat*, *Govend*, *Pelîn*, *Nûbihar* yan jî *Hêviyê* de hatine weşandin.

Lê ji van kesên ku di warê çîroknivîsinê de hindê derketine pêş ev in: Qedrî Dêrsilavî, Çiya Mazî, Dîlawer Zerak, Fatma Savci, H. Kovan Baki, Roşan Lezgîn, Harbî Soylu, Melahat Akay, Demhat Hezexî, Emînê Terzî, Jêhat Gimgim, Mûsa Vazgalî, Yaqup Tilermanî ne. Mirov dikare hêj gelek navên din jî li van zêde bike. Lê heta dawîya vê serdema ku mijara nivîsa me ye çîrokên wan çîroknivîsan wekî kitêb nehatine çapkirin. Pişt re hin ji van kesan çîrokên xwe wekî kitêb çapkirine.

Ji sala 1997an pê ve ji aliyê *Jiyana Rewşenê* ve pêşbaziya çîrok û helbestan tê lidarxistin. Ev pêşbazî çend salan didome paşê êdî nayê pêkanîn. Di wan salan de her sal nêzîkî 30 kesî bi kurteçîrokên xwe tevlê vê pêşbaziye dibin, her wisa kêma zêde pêncî kes jî bi helbestên xwe tevlê dibin (Ronî, (2004). Stenbol: 135-146).

Heke ku mirov bi giştî behsa rewşa kurteçîroknivîsîna wê demê bike, di van salan de hejmara nivîskarên kurteçîrokan her ku çûye zêde bûye. Lê ev nayê maneya ku xwendevanên çîrokan jî pir zêde bûne. Di kurteçîrokên Kurdî li Bakur de hewldaneke ber bi kurteçîroka cîhanê ya modern ve heye. Lê bi giştî gava mirov lê binêre kurteçîroka Kurdî jî her wekî babetên din hê ji bazarek gumreh bêpar e û hê jî negiheştîye armanca xwe.

4.2.8.2. Helbesta Kurdî Ya Nûjen Li Bakur

Bingeha helbesta Kurdî ya nûjen hin kesên heta ba Hacî Qadirê Koyî jî dibin hene. Hin kes jî bi Goran didin destpêkirin. Ev mijar cihê guft û goyek din e. Lê eger em berê xwe bidin helbesta nûjen ya bakur bingeha wê bi xebatên rewşenbîrî yên ku bi kovara “*Hawarê*” berbiçav bûye tê danîn.

Bi derketina kovara *Hawarê* re gelek kes hewl didin ku li gorî pêwîstiyên demê valahiya di warê huner û edebîyata Kurdî de dagirin. Di serdema vê hewldanê de gelek berhemên nûjen hatin afirandin. Gelek rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên wekî Cegerxwîn, Qedrîcan, Osman Sebrî, Reşîdê Kurd û Celadet Elî Bedirxan ve bingeha helbesta nûjen a kurmancî tê avêtin.

Di gel hewldanên şairê helbesta kurmancî yê navdar Cegerxwîn yên ji bo nûjenkirina helbesta Kurdî, gavên pêşîn yên helbesta nûjen a kurmancî ji aliyê kesên wekî Reşîdê Kurd, Qedrîcan û Celadet Elî Bedirxan ve tên avêtin. Li ser vê babetê Arjen Arî di xebata xwe ya li ser helbesta bakur de wiha behsa vê qonaxê dike:

“Cîgerxwîn, -di gel ku kurmê neteweperwerî di xwîna her helbest û helbestkarekî de tev digere- têgeha “Şairê Neteweyî” ev xoş-mirov heq dike. Ji ber du sedeman: yek, piştî mirina wî ne li bakur, ne li başûrê Rojava/Binxetê, kesek nekarî valahiya wî dagire. Ya duduyan; berhemdarîya wî û tevgera wî ya li dû nûjenkirina helbestê! Bi peyva wî, wî çendî helbest “ji esmanan daxistibe erdan”, ev çend bi helbestên wekî “Kî Me Ez”, “Ey Heval Robson” berê helbesta xwe bi xwe daye asoyên peydakirinên nû. Nûjenkirina helbesta kilasîk, ango di helbesta klasîk de destpêkirin û peydakirinên nû bi seydayê evîne Cîgerxwîn, Reşîdê Kurd û Qedrîcan re dikeve rojeva helbesta Bakur û Binxetê, Ji vê hevokê kesek ma’neya xwediyê “Gula Sor”, Qedrîcan û xawên-evîn Osman Sebrî ne helbestkarine hêja ne, ne xwedî kartêkê ne di helbestê de dernexê. Cihê ku navê Reşîdê Kurd lê bêt gotin, bo min helbesta nûjen li wir dest pê dike.” (Arî, (2007). Duhok: 30).

Ev gavên vê qonaxê ji bo helbesta nûjen ya bakur jî dibe gavên pêşîn û bingeha helbesta nûjen ya bakur. Paşê jî helbesta nûjen ya bakur li ser vê bingehê hişîn tê.

Eger em vê qonaxê danin alîyekî helbesta Kurdî ya nûjen li bakur û Tirkîyeyê bi giştî heta salên 1990an sêwî dimîne. Di salên berîya 1980yan de ji xeynê çend mînakên zêde helbestên Kurdî nayên nivîsîn û nayên weşandin. Piştî damezrandina Komara Tirkîyeyê di serdema salên 1960-1980 de di hin kovar û rojnameyan de hin helbestên Kurdî tên weşandin. Di vê serdemê de çend helbestên Abdurrahman Alaca(Edo Dêran), Kemal Badıllı û Paşê jî hin helbestên Rojen Barnas di weşanan de tên belavkirin.

Pêşîya Salên 1990an li bakur û Tirkîyeyê ji xeynê 1-2 mînakên wekî dîwana Rojen Barnas, berhemên helbesta nûjen a Kurdî wekî kitêb nehatine çapkirin. Di vê qonaxê de jî Kurdên ku ji bakur û Tirkîyeyê çûbûn welatên Ewropayê zêdetir bandor li xebatên çandî edebî yên bakur dikin.

Piştî ku careke din li Tirkîyeyê weşana kovar û rojnameyên Kurdî dest pê dike, hêdî hêdî helbesta Kurdî ya nûjen û helbestvanên Kurdî jî derdikevin. Salên pêşîn helbestvan helbestên xwe tenê di van kovar û rojnameyan de diweşînin. Lê piştî re hêdî hêdî helbestvan helbestên xwe wekî kitêb jî çap dikin. Heta sala 2000an bi dehan kitêbên helbestan tên çapkirin. Hin ji wan dîwanên helbesta klasîk a Kurdî ne, hinek kitêbên helbestvanên parçeyên din in yan jî ew kitêbên ku li dîasporayê hatine nivîsîn û çapkirin ew kitêbên in. Lê hinek jî kitêbên helbestvanên ji bakur ên nû ne.

Di van salan de heta sala 2000'ê jî zêde kitêbên helbestan nayên çapkirin. Hin helbestvanên ji bakur ku di qonaxa salên 1990an û heta piştî salên 2000an pêşî berhemên wan wekî kitêb derketine ev in: Arjen Arî, Berken Bereh, Sabah Kara, Rênas Jiyar, Îrfan Amîda, Miraz Ronî, Cîhan Roj, Ramazan Alan, Dost Çiyayî, Serkeft Botan, Şêhmûs Sefer, Kawa Nemir, Îlhamî Sertkaya, Zahir Qayan, Çiya Mazî, Kejo.

Li dû van berhemên hin helbestvanên din jî derdikevin, wekî; Recep Dildar Rehîm Qoserî, Yıldız Çakar, Hesen Qeya, Îlhamî Özer, Cemîl Denlî Mem Bawer. Paşê jî hin helbestvanên din jî didin ser şopa wan. Wekî; Hemîd Dilbihar, Fatma Savci, Ehmed Ronîar, Aydin Orak, Gulîzer. Yeqîn H. Lê gelek kesên din jî helbest nivîsîne lê di vê qonaxa ku mijara gotinê ye de berhemên wan wekî kitêb nehatine çapkirin (Arî, (2007). Duhok: 56).

4.2.8.3. Romana Kurdî Li Bakur

Romana Kurdî ya li bakur jî wekî hemû beşên din ên edebîyata Kurdî li ser bingeha qonaxên li parçeyên din û diasporayê dest pê dike. Wekî ku tê zanîn romana Kurdî ya pêşîn ji aliyê Ereba Şemo ve hatîye nivîsîn û di sala 1935an de li Ermenistana Sovyetê hatîye çapkirin. (Pariltî ve Galip, (2010). İstanbul: 29) Li dû Ereba Şemo li welatên Sovyetê hejmarek kes bi karê edebîyata Kurdî re radibin û bi pêvajoya demê re gelek berhemên Kurdî derdikevin û romanên nivîskarên wekî Elîyê Evdîlrehman û Hecîyê Cindî derdikevin. Her wisa di vê pêvajoyê de pêngava "Hawar"ê jî dibê bingehêke din ji bo edebîyata Kurdî. Paşê jî piştî salên 1950yan û pê de nivîskarên ji başûr û rojhilat, wekî; Rehîmê Qazî, Îbrahîm Ehmed, bi zaravayên soranî roman çap dikin. Her wisa piştî ku diasporaya Kurdan li welatên Ewropayê pêk tê li vir jî berhemên romana Kurdî derdikevin. Di vê qonaxa diasporayê de hin nivîskarên ji bakur, wekî; Mahmut Baksî, Mehmet Uzun, Bavê Nazê, Hesenê Metê, û hwd. bi karê romannivîsînê ve radibin û gelek romanên bi zaravayê kurmançî derdikevin. Piştî ku di salên 1990an de li Tirkîyeyê jî nû ve weşana Kurdî dest pê dike û xebat û berhemên edebîyata Kurdî tîne çapkirin û weşandin, peywendî li gel parçeyên din û berhemên Kurdî ên ku li derva hatine çapkirin jî çêdibin. Hingî lêgerîneke romana Kurdî jî dest pê dike. Lê di gel vê yekê jî li bakur romannivîsîna Kurdî dereng dest pê dike. Her çend ku di vê qonaxa dawîyê de hin kitêbên kurteçîrokan tîne çapkirin jî lê heta salên 2000an mirov li bakur rastê kesên bi karê romannivîsîyê ve radibin nayê. Bi qasî ku min tesbît kirîye di vê qonaxê de romana pêşîn ya Îbrahîm Seydo Aydoğan e, di sala 1999an de hatîye çapkirin. Paşê piştî 2000an pê ve li bakur hêdî hêdî romannivîs derketin. Îro gerek romannivîsê jin gerek jî mêr gelek kes romanên Kurdî çap kirine.

4.2.8.4. Muzîka Kurdî Ya Nûjen Li Bakur

Bingeha Muzîka Kurdî ya nûjen jî li ser muzîka Kurdî ya gelêrî pêk hatîye. Di gel ku muzîka Kurdî xwedîyê dîrok û bingehêke gelek dêrîn e jî lê ji ber rewşa Kurdan ya sîyasî xebatên li ser muzîka Kurdî ya bi terzên nûjen gelek dereng pêk

hatine. Çawa ku babetên din ên çandî edebî bi fikr û bîrên neteweperwerîyê re dest pê kirine her wisa xebatên mûzîka Kurdî ya nûjen jî bi vê pêvajoyê dest pê dike.

Eger mirov berê xwe bide dîroka xebatên muzîka Kurdî mirov dikare heta sedsalên 8-9an jî rastê hin îşaretan bê.

Li gorî hin çavkanîyan hê di sedsala 8an de şagirtê dibistana muzîkê ya Îshaq Misûlî El Kindî ku bi eslê xwe Kurd e li ser noteyan xebat kirî ye û amûra muzîkê ûdê îcat kirî ye. Her wisa dîsa çavkanî behs dikin ku şagirtê heman dibistanê Zêryab jî bi eslê xwe Kurdekî cihû bûye, di dema hukumranîya Endûlûs de derbasî Îspanyayê bûye û li ser muzîkê gelek xebatên girîng kirîne û gîtarê îcat kirîye û avakarê muzîka Flamenko ya Îspanyolî ew e. Her wisa di dema Ebasîyan de muzîknasê Kurd Safiyudin Urmîyewî(1224-1294) bi notaya ebcedê gelek meqamên muzîkê tomar kirine (Kom Müzik, (2007). İstanbul: 10) Her wisa hin çavkanî amace pê dikin ku di serayên mîrekên Kurdan de jî hin komên muzîkê hebûne û li gel gelek enstûrmanan muzîka Kurdî pêşkeş kirine. Ji gelek îşaretan dîyar dibe ku di dema desthilatîya mîrîtîyên Kurdan de hunera muzîkê li nav Kurdan pêşketî bûye. Ehmedê Xanî jî di “*Mem û Zîna*” xwe de behsa 10 meqamên muzîka Kurdî dike û behsa 10 enstûrmanan dike ku li serayên mîrên Kurdan, di şahî û ahengan de hatine bi cih anîn (Kom Müzik; 11-17).

Di warê muzîka Kurdî de xebatên nûjen dereng dest pê kirine. Ev yek jî dîsa bi rewşa sîyasî ya Kurdan ve têkildar e. Di serê sedsala 20an de navgînên nûjen ên mûzîkê jî li cîhanê belav dibin. Ev navgînên teknîkî ên tomarkirina dengên digihîjin Kurdistanê jî. Cara pêşîn stranên Kurdî ji dengê Xosrof Malool -ku bi eslê xwe Suryanîyê Diyarbekirê ye- li Mûsilê di sala 1909an de li ser qewanan(plak) tîtomarkirin. Pişt re Xosrof Malool koçî Emerîka dibe û di sala 1912an de li New Yorkê hinek meqam û stranên Kurdî tomar dike (Yaş, (2015). Diyarbekir: 30-31).

Piştî vê tomarkirinê di salên 1926, 1927, 1928, 1929an de li Bexda û Tehranê stranên Kurdî tîtomarkirin. Di sala 1926an de Elmas Xan li Bexdayê stran tomar dike. Di sala 1929an de hunermendê Kurd ê bi navê Seyîd Elî Esxer Kurdistanî ku xelkê Sineyê ye li Tehranê stranên xwe tomar dike. Her wisa di sala 1927 – 1929an de Mela Kerîm Efendî ku xelkê Mehabadê ye li Bexdayê stranên xwe li ser qewanan tomar dike. Di sala 1930 û pê de hunermendên wekî Kawîs Axa, Meyrem Xan û hinek hunermendên Kurd li Bexdayê stranên xwe tomar dikin. Paşê piştî 1939an ku

Radyoya Bexdayê beşa Kurdî vedibe û her wisa dû re radyoyên din ên Kurdî li Tehran, Rewan û Kirmanşanê vedibin gelek hunermendên Kurd ên wekî Elî Merdan, Şeroyê Biro, Karapêtê Xaço, Mihemed Arif Cizîrî, Hesên Cizîrî, Hesên Zîrek û gelek hunermendên din stranên xwe tomar dikin (Yaş, 30-35).

Li bakur piştî ku Komara Tirkîyeyê tê damezrandin demeke dirêj li ser muzîka Kurdî jî qedexeyê dewam dike. Heta salên 1960an bi tenê li nav gel, li gund û zozanan klam û stranên Kurdî tînin gotin û guhdarîkirin. Di van salan de gelek hunermendên bi eslê xwe Kurd di bin bandora asimilasyonê de yan Tirkî distrên yan jî stranên Kurdî li Tirkî vediguherînin û bi gotinên Tirkî distrên. Di salên 1960an û pê ve hin hunermendên Kurd stranên xwe tomar dikin. Di van salan de çend hunermendên wekî Mahmud Kızıllı, Ayşe Şan li Stenbolê hin stranên xwe li ser plakan tomar dikin û belav dikin.

Paşê piştî ku tevgerên siyasî yên Kurd derdikevin di vê pêvajoyê de hunermendên Kurd jî derdikevin û bi stranên xwe mil didin tevgerên Kurdî. Di vê qonaxê de wekî pêşengên muzîka nûjen a Kurdî hin hunermendên wekî Şivan Perwer, Şîyar Farqînî, û Dilgeş derdikevin pêş.

Paşê li ser derbeya leşgerî ya 1980yan car din dengên Kurdî tînin birrîn heta ku di salên 1991, 1992 û pê ve sazîyên wekî Navenda Çanda Mezopotamya û Navenda Çanda Stran vedibin. Piştî ku ev sazî ava dibin êdî gelek kes bi karê muzîka Kurdî radibin. Di vê serdemê de di muzîka Kurdî de kevneşopîya komên muzîkê jî dest pê dike û hin komên muzîkê wekî, Koma Dengê Azadî, Koma Çiya, Koma Kulîlkên Mezra Botan(Koma Zarokan), Koma Amed û Koma Agirê Jîyan, Koma Rewşen, Koma Agirê Zerdeşt û hwd. di bin banê van sazîyan de xebatên mûzîkê bi pêş dixin. Paşê îdî gelek hunermend derdikevin û firmayên muzîkê tînin avakirin û kaset û CD'yên muzîka Kurdî çap dikin. Heta niha bi sedan hunermendên Kurd albûmên xwe çapkirine (Çelebî, (2009). <http://www.bgst.org/kurtce-muzik>).

4.2.9. Şanoya Kurdî

Destpêka şanoya Kurdî wekî şanoya gelek gelên rojhilat zêde kevn nînin. Hin kesên ku lêkolîn li ser şanoya Kurdî kirine didin kifşê ku Kurdan jî mîna gelek xelkên Rojhilata navîn di serê sedsala 20an de bi forma “Ewropaya Rojava” şanoyê

nas kirine û pêkanîne. Şanoya Kurdî jî di vê serdemê de wekî navgîneke “polîtîk” hatiye dîtin û bi geşbûna têkoşîna neteweperwerîya Kurdî re geş bûye û daketîye.

Şanoya Kurdî bi forma nûjen pêşî di sala 1919an de li Stenbolê dest pê dike. Pîyesa pêşîn ya Kurdî ji aliyê Evdurehîm Rehmî Hekarî ve bi navê *Memê Alan* tê nivîsîn û di sala 1919an de di kovara *Jîn’ê* de tê çapkirin. Paşê piştî ku Komara Tirkîyeyê tê avakirin bêyî ku haya wan ji hev hebe, bi rengekî cuda li başûrê Kurdistanê(Silêmanî), li Tiflîs-Gurcistanê û li Elegezê-Ermenistanê bi pêş dikeve (Zedo û Akkuzu, (2016). İstanbul: 12)

4.2.9.1. Şanoya Kurdî Li Başûr

Li herêma başûrê Kurdistan, ji avabûna dewleta Iraqê heta salên 1970 ji xeynî hin xebatên bi rengê îlegal tu zemîn û xebatek tune. Li vê serdemê bi hewldanên rewşenbîrên wekî Pîremerd û Ebûbekir Hewerî û hwd. hin xebatên şanoyî tînin nivîsîn û birêxistin. Lê zêde derfetên pêşketinê tune (Zedo û Akkuzu, (2016). İstanbul: 37-41)

Piştî peymanê 1970 ya rêveberîya Iraqê li gel Kurdan Kurd gelek mafên sîyasî û çandî bi dest dixin. Li ser vê di demeke kurt de gelek xebatên çandî tînin kirin. Bi taybetî li Silêmanî û li hin deverên din gelek navendên şanoyê tînin avakirin û xebatên şanoyê tînin kirin û gelek lîstikên şanoyê tînin lîstin. Di vê serdemê de heta radeyek tîyaroya Kurdî ber bi profesyonelîyê ve diçe. Lê piştî 1975an li ser peymanê li dijî Kurdan ya di navbera Îran û Iraqê de hemû destkeftiyên Kurdan ji destê wan diçin. Li ser vê yekê şanoya Kurdî jî êdî di bin zextan de bi aweyekî îlegal ji aliyê hin komikan ve tê domandin. Ev rewş her ku diçe aloztir dibe heta salên 1990an. Piştî ku di sala 1991an de mudaxele li Iraqê tê kirin û Kurd carek din dibin xwedî mafên sîyasî û çandî hingê car din li hin navendên başûr şanoya Kurdî bi rê dikeve. Roja me ye îro êdî li gel rewşa sîyasî û çandî ya Kurdan li başûr şanoya Kurdî jî li gel guherînên nûjen di qonaxek din de ye (Zedo û Akkuzu, (2016). İstanbul: 82).

4.2.9.2. Şanoya Kurdî Li Rojhilat

Li herêma rojhilat jî wekî herêmên din tu zemîneke ku şano li ser bi pêş bikeve tune. Tenê di nav gel de hin lîstikên tyatral yê wekî “Mîr Mîran” tîn lîstin. Di serdema avabûna Komara Mehabadê di salên 1945-46 de hin xebatên şanoyê tîn pêşkêş kirin. Bi taybetî lîstika bi navê *Dayikî Niştiman* dengêkî pir mezin vedide. Lê piştî demeke kurt dema ku komara Mehabadê tîkê diçe car din li rojhilat tu zemînek jî bo şanoya Kurdî namîne. Paşê piştî salên 1950-60an pê ve rejima şah ku destûra radyoyên Kurdî dide, di radyoyên Kurdî yê Sinê û Kirmanşa de hin pîyesên Kurdî tîn weşandin. Piştî tîkêçûna rejima Şah ya sala 1979an, di serdema Komara Îslamî ya Îranê de jî heta îro zêde zemînek ku şanoya Kurdî li ser pêş bikeve nîn e. Tenê li hin navendên çandî hin hewldanên şanoyê hene (Zedo û Akkuzu, 152-158).

4.2.9.3. Şanoya Kurdî Li Rojava

Li rojava heta piştî salên 2000an jî xeynî hin hewldanên takekesî mirov rastê tu xebateke şanoyî nayê. Ji xwe zemîneke ku şanê lê bi pêş bikeve jî nîn e. Di salên 1933yan de pîyesek kurt bi navê *Hevînd* ji aliyê Celadet Elî Bedirxan ve tîn weşandin. Lê ev pîyes li tu deverê nayê pêşkêşkirin. Tenê lîstika şanoyî ya bi navê *Kawayê Hesinkar* di pîrozbahîyên Newrozê de ji aliyê komên amator ve tîn pêşkêşkirin. Her çend di warê edebîyata Kurdî de li rojava her xebat û berhem hatibin pêkanîn jî lê li ser şanoyê xebateke berbiçav heta van salên dawîyê nayê dîtin (Zedo û Akkuzu, 147-148).

4.2.9.4. Şanoya Kurdî Li Ermenistan û Gurcistanê

Belkî jî ji aliyê xebatên şanoyê ve beşa herî bisiûd beşa Kurdên Sovyetê ye. Piştî ku Yekîtiya Sovyetan tîn avakirin, pîrranîya Kurdên Sovyetê li Ermenistan û Gurcistanê dijîn. Li nav Kurdên van deveran hê di salên 1920an de xebatên şanoyê dest pê dikin. Bi taybetî lîstika Ehmedê Mirazî ya bi navê *Zemanê Çûyî*, lîstika Wezîrê Nadirî, *Reva Jînê* hê di wan salên 1920-30yan de li nav Kurdên Gurcistan û Ermenistanê tîn pêşkêşkirin û gelek balê dikişînin. Paşê di sala 1937an de Şanoya

Kurdî li Elegeza Ermenistanê tê avakirin û di nav xebatên wê de gelek listikên şanoyê tîn nivîsîn û pêşkêşkirin.

Paşê piştî salên 1950-60 ku radyoya Kurdî ya Rewanê tê avakirin êdî di nav weşanên radyoyê de şanoyên radyoyê tîn weşandin. Ev aktivîteyên şanoyî û hewldanên şanoyê heta salên 1988an tîkçûna Sovyetê kêr zêde bi rengekî berdewam dikin.

Piştî ku Yekîtîya Sovyetan hildiweşe êdî rewşa Kurdên wan deveran jî ser û bin dibe û heta roja îro jî bi awayeke belawela li nav welatên Sovyeta berê hin xebatên şanoyî berdewam in. Bi taybetî li Tiflîsê xebatên şanoya Kurdî heta salên 2000an jî berdewam dike (Zedo û Akkuzu, 117-128).

4.2.9.5. Şanoya Kurdî Li Bakur û Tirkîyeyê

Li bakur di dewra dewleta Osmanî de wekî gelek xebatên Kurdî xebata şanoya Kurdî jî li Stenbolê derdikeve. Listika Şonoyê ya bi navê *Memê Alan* ji aliyê Evdîrehîm Rehmî Hekarî ve tê nivîsîn û di sala 1919an de di kovara *Jîn*'ê de tê weşandin. Ev berhem wekî berhema şanoya Kurdî ya pêşîn tê qebûlkirin.

Piştî ku dewleta Osmanî belav dibe û Komara Tirkîyayê tê damezrandin pê ve êdî her tiştên Kurdî tîn qedexekirin û tu zemînek jî Kurdî re namîne. Heta salên 1960an tu xebateke Kurdî li nav sînorên Tirkîyeyê çênabe. Di salên 1960an de bi hewladana hin sîyasetmedear û rewşenbîrên wekî Musa Anter hin hewldanên Kurdî çêdibin. Di vê qonaxê de pîyesa bi navê *Birîna Reş* ji aliyê Mûsa Anter ve tê nivîsîn û di sala 1965an de tê çapkirin. Lê ev pîyese heta îro jî li ser dikê nehatîye pêşkêşkirin (Zedo û Akkuzu, 148-149).

Paşê şanoya bi navê *Dawîya Dehaq* ji aliyê Kemal Burkay ve tê nivîsîn û di sala 1978an de tê weşandin. Ev listik li hin cîyan bi komên amator tê pêşkêşkirin. Di sala 1989an de komeleyek bi navê “Halk Kültürü Araştırma ve Yaygınlaştırma Derneği” (Komeleya Lêkolîn û Geşkirina Çanda Gel) ji aliyê komek Kurd ve li Stenbolê tê avakirin û di nav xebatên wê de çend caran listika *Dawîya Dehaq* û çend

mîzansen bi aweyêke amatorî tê pêşkêş kirin. Piştî van heta sala 1991'e mirov li bakur û Tirkîyeyê rastê tu xebateke şanoyê nayê.

Di sala 1991an de dema ku NÇM tê ava kirin komên şanoyê jî tî avakirin û cara ewil lîstika *Mişko* ji aliyê koma "Şanoya Roja Azadî" ve tê lîstin. Paşê di sala 1992yan de "Teatra Jiyana Nû" tê avakirin û bi aweyekî bi rêk û pêk dest bi xebatên şanoya Kurdî tê kirin.

Piştî navenda xwe ya Stenbolê NÇM şaxên xwe li gelek bajarên vedike û di bingeha wan de şano jî tî avakirin. Di sala 1994an de li şaxa NÇM'yê ya Îzmîrê "Şanoya Hêvî" di sala 1995an de li şaxa NÇM'ya Edeneyê "Şanoya Yekbûn", di sala 1996an de li şaxa NÇM'ya Mersînê "Teatra Arzeba" tê vekirin. Û her wisa li Dîyarbekirê û li Batmanê jî şaxên NÇM'yê vedibin û di bingeha wan de beşên şanoyê tî avakirin. Paşê piştî salên 2000an ku şarederîyên bajarê Kurdan kete destê partîyên Kurdan di bingeha şaredarîyan de gelek beşên tiyatroyê hatin vekirin, Ev lîstikvanên ku li van şanoyên NÇM'yê giheştibûn gelek ji wan çûn di bingeha van şanoyên şaredarîyan de cih girtin û gelek lîstikên Kurdî derdixistin ser dikê. Bi taybetî "Teatra Jiyana Nû" serkeftineke baş bidest dixê û di nav xebatên wê de gelek lîstik tî pêşkêşkirin.

Piştê salên 2000an êdî di serî de li Stenbolê û li hin bajarên din şanoyên Kurdî yê serbixwe tî avakirin û bi şeweyekî profesyonel xebatên şanoyê dikin (Zedo û Akkuzu, 13-15). Di van salan de gelek mîzansen û lîstikên şanoyê jî tî nivîsîn lê wekî kitêb nayên çapkirin. Bi qasî ku ez pê agahdar im kitêbeke şanoyê ya Felat Dilgeş, bi navê *Kula Dêrsimê* hatîye çapkirin. Wekî din mirov rastê kitêbên şano yan jî pîyesên Kurdî nayê (Ronî, (2004). Stenbol: 135-146).

Niha car din li bakur û li Tirkîyeyê ji ber sedemên sîyasî û guherînên civakî rewşa şanoya Kurdî zêde baş nîne û bi xebatên sînema û televizyonan re jî êdî ketîye qonaxeke din. Ev yek mijara xebateke xweser e.

ENCAM

Wekî encam mirov dibîne ku heta serê sedsala 20an tevger û xebatên Kurdan bi giştî bêyî ku ji pêşketinên li dinê zêde haydar bin bi aweyekî kevneşopî li ser bingeha rê û rêzikên berê bi rê ve çûne. Tevgera nûjen ya Kurdan di serê sedsala 20an de derketîye meydana. Ev tevger bi fikir, şikil û şeweyên xwe li ser hemû babetên edebî û hunerî xwe daye der. Di gel ku di pêvajoya pêşketina tevgera Kurd de gavên nûjen di hemû warî de hêj ji serê sedsalê pê ve hatibin avêtin jî lê wekî çarçoveya giştî di tevahîya sedsalê de tevgera Kurd li gel pêşketinên nûjen, ji aliyek ve jî fikr û rengên kevneşopî ên civaka Kurd jî di xwe de hewandine û wisa hatîye heta roja îro. Gelek sedemên sîyasî, civakî, cografî û aborî li ser vê encamê bandor kirine.

Dahûrandina mijara civakî û sîyasî ya Kurdan mijareke gelek dorfireh, pirrfaktor û piralî ye. Di gel ku têkilîya van babetan bi mijara me re heye jî lê çarçoveya vê xebatê bi giştî kar xebatên Kurdî yên rewşenbîrî ne, wekî xebatên ziman, çand û edebîyat û çapemenî û hwd. Ji ber ku di çarçoveya fireh û Kurdistanî de pêwîstî bi xebateke pirr dûr û dirêj û pirralî hebû me çarçoveya xebata xwe bi beşa bakur û Tirkîyeyê, bisînor kir. Her wisa ji xebatên vê beşê jî me bi giştî xebatên nûjen ên Sedsala 20an û bi taybetî jî xebatên serdema 1980-2000 ku li bakur û Tirkîyeyê hatine kirin esas girt. Helbet ji ber rewşa Kurdan ya awarte û ji ber ku di vê serdemê de hemû kar û xebatên rewşenbîrî û hunerî rasterast bi liv û helwestên sîyasî pêk hatine me peywendîya wan xebatan li gel rewş û tevgera sîyasî ya Kurd kir çarçoveya mijarê.

Helbet li her welatî têkilîya xebatên çandî, hunerî û edebî bi tevger û daxwazên sîyasî re çêbûye. Lê belê ji ber rewşa Kurdan ya awarte ev yek li nav Kurdan ji gelek alîyan ve hindêk cihêreng û resen pêk hatîye. Di vê pêvajoya mijara gotinê de eger ku xebatek Kurdî ya çandî, hunerî yan jî edebî hatibe kirin, hema bigir bi tevahî yekser bi xebateke sîyasî re yan jî di nav xebatên sîyasî de û helwestên sîyasî hatine kirin. Belkî jî rewşeke bi vî rengî li nav gelekî din ê cîhanê çênebûbe. Hemine ku sedemên vê yekê hene. Berê her tiştî zext û qedexeya ku li ser ziman û çanda Kurdî ewqas demeke dirêj hatiye meşandin mirov li cîhanê nikare li devereke din bibîne. Li demek qedexeya li ser Kurdî ewqas dijwar bûye ku axaftina Kurdî li sûk û bazaran jî

hatîye qedexekirin û ceza lê hatîye birrîn. Vê qedexeyê bi hin şêwazan hê ji dema dewleta Osmanî de dest pê kirîye û di serdema Komara Tirkîyeyê de gelek girantir û diwartir bûye. Vê yekê jî hiştîye ku her çi xebatek an jî çalakîyek peywendîya wê bi ziman û çanda Kurdî ve hebe polîtîze bibe. Ji ber vê yekê jî li dervayê helwest û hewldanên sîyasî ne zemînek hebûye ku xebatên xweser ên edebî û çandê çêbin û ne jî çêbûne.

Ji serê sedsala 20an heta salên 2000an li bakur û li Tirkîyeyê ji xeynî 1-2 navberên kurt kêm zêde rewşa ziman û edebîyata Kurdan bi vî rengî hatîye. Piştî dema Osmanîyan di serdema Komarê de di salên 1960an de çend sal û di salên 1970yan de çend sal hin helwestên demokratîkî pêk tên û di van salan de hin liv û tevgerên sîyasî derdikevin û di gel van liv û tevgeran hindêk xebat û berhemên ziman û çanda Kurdî derdikevin. Lê ev dem demên pir kurt in û pirr kêm xebatên rewşenbîrîya Kurdî dikare bên kirin û pirr kêm berhem derdikevin. Lê hercar jî ev xebat û berhem rastî cezayan tên. Di van serdeman de hin gav tên avêtin, hin sazî û dezgehên Kurdî tên vekirin, lê temenê wan pirr kurt in û bêyî ku her xebatek têkeve ser rêgeha xwe ya esasî hatine rawestandî.

Wê rewşê jî hiştîye ku xebat û berhemên ziman û çanda Kurdî li ser zemîna xwe ya eslî hişîn nebin. Xebatên ku hatine kirin bi giştî li penaberîyê, li zemînen ku çanda Kurdî û gelê Kurd lê najî pêk hatine. Di vê serdema dûr û dirêj de têkilîya gel û xebatên rewşenbîrî zêde bi hev re çênebûne. Ev jî bûye sedem ku xebatên çand û hunera Kurdî rola xwe ya esasî neleyîztine û ji ber wê jî ji esasê xwe dûr û lawaz mane.

Ji salên 2000an pê ve ev xebat û berhemên Kurdan ên mijara gotinê dikevin qonaxeke din. Hem naveroka xebatan hem jî bergeha wan hêdî hêdî ji bin sîya hewldanên sîyasî derdikevin û berê xwe didin ser rêgeha xwe ya xweser. Di vê serdemê de êdî hêdî hêdî di warê huner de, di warê edebîyat de, di warê xebatên ziman de hin xebatên xweser tên kirin. Nivîskar û şairên ku ne bi tevgereke sîyasî re ne û komên muzîkê ku ne di nav sazîyeke de ne derdikevin. Hin weşanxaneyên Kurdî tên avakirin, hin kovar tên weşandin. Hin komên şanoyê derdikevin, sazîyên xweser ên şanoyê vedikin û hin xebatên şanoyê bi pêş dixin. Heta hin komên

birêxistina xebatên hişmendîya ziman wekî “Koma Hawara Kurdî”¹³ derdikevin û dikin ku bi însiyatîva xwe xebatên zimanê Kurdî pêş bixin. Paşê îştî salen 2006-2007an pê va disa di bin sîwana hin zazyên çandî û siyasî yên Kurdî de Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî/TZP-Kurdî tê avakirin û li gelek bajarên ku Kurd lê dijîn wekî însiyatifeke sivîl li ser perwerdehiya Kurdî xebatan dike û paşê ev însîf di bin banê komeleyên bi navê Kurdî-Der de bi aweyeke fermî tê birêxistin û li gelek bajaran şaxên wê tên vekirin. Di salên 2000an de piştî ku gelek şaredariyên bajarên Kurdan ketin destê partîyên Kurdan, li gelek cîyan xebatên zimanê Kurdî ji aliyê hinek ji van şaredariyan ve hatin destekkirin. Di vê pêvajoyê de hêdî hêdî bazareke Kurdî jî çêdibe. Piştî zêdebûna televîzyonên Kurdî, vebûna TRT Kurdî û zêdebûna têkilîyên bi herêma başûrê Kurdistanê re, vebûna ajansên Kurdî heta radeyek bazara zimanê Kurdî geş bû û gelek kes di van kar û barên Kurdî de xebitîn û karîn ku bi van karan debara xwe bikin. Êdî hêdî hêdî filmên Kurdî, belgeselên Kurdî hatin kişandin û dezgehên dublaja Kurdî hatin sazîkirin, gelek berhemên sînemayê bi Kurdî hatin dublajkirin. Her çend navenda van kar û xebatan bi giranî Stenbol be jî lê zêdetir li Dîyarbekirê li gelek bajarên din ên Tirkîye û bajarên Kurdan jî ev reng xebat hatine bipêşxistin. Piştî ku di hin sazîyên dewletê de wergerîya Kurdî hat qebûlîkirin, li dibistanên dewletê dersên hîlbijarî hatin qebûlîkirin û di hin zanîngehên dewletê de jî enstîtu û beşên Kurdî hatin vekirin êdî li bakur û Tirkîyeyê kar û xebatên Kurdî ket qonaxeke din.

Niha li bakur û li Tirkîyeyê her çend rewşa Kurdî ji demên berê gelek cudatir be jî lê hêj jî statûyeke qanûnî û zemîneke normalbûyî ji bo kar û xebatên ziman û çanda Kurdî tune. Di jiyana asayî ya Kurdan de, di kar û barên, perwerdehî, bazirganî, têkilîyên fermî û hwd. de hê jî tu statûyeke Kurdî tune. Hê jî di gelek warên jiyaniyê de gelek tiştên Kurdî ji aliyê bereya dewletê ve dikare wekî argûmaneke sîyasî bê dîtin û rastê hin lêpîrsînan bê. Hê jî sîyaseta pişafînê li ser ziman û çanda Kurdî bi gelek rengên xwe berdewam e. Gelek nav û nîşanên çanda Kurdî rastî qedexeyan tê û herf û sembolên Kurdî wekî sîyaseta li dij dewletê tên dîtin û ji ser lewhe û dîwaran tên rakirin. Lê ji aliyê din ve jî gelek kar û xebatên Kurdî di nav şert û mercên xwe de tên kirin.

¹³ Koma Hawara Kurdî di sala 2005an de ji aliyê komek ciwanên Kurd ve li Stenbolê tê organîzekirin. Li ser hişmendîya ziman hin xebatan dide pêş xwe û hin hewldanan dike, paşê zêde dom nake.

Ev hemû tiştên ku me li jor dîyar kirin helbet bi helwest û nêrîna sîyasî ya dewletê ve girêdayî ye. Heta ku çaresîyek bingehîn ji bo pirsgerêka Kurdan li Tirkîyeyê pêk neyê û li ser destûra bingehîn statûyeke Kurdî çênebe wisan dîyar e ku dê rewşa kar û xebatên rewşenbîrî yên ziman û çanda Kurdî her di nav gîr û giriftên, kem û kurrîyên sîyasî de bêpergal û bêserûber bimîne û li ser zemîna xwe ya esasî, li gorî, reng û pêwîstîyên dema xwe hişîn nebe.

Wekî encam ku mirov bibêje, bi vê xebatê me xwest ku di çarçoveya rêgezên lêkolîna zanistî de serdemek ji dîroka çand û zimanê Kurdî ronî bikin. Bi vê xebatê me xwest ku em bidin nîşan ku çawa her darek li ser zemîna siruştî xwe dikare baş hişîn bê, çawa her fêkîyek li ser zemîna siruştî xwe dikare baş ber bide, her wisan her edebîyat û hunerek jî li ser zemîna xwe ya esasî dikare baş berhem bide. Bi vê jî me xwest ku sûtê bidin nîşan li dû me da ku her kar li ser zemîna xwe ya esasî bê kirin da ku berhemên baştir derkevin.

Di vî warî de heta niha di vê çarçoveyê de dibe ku hin xebat hatibin kirin. Û helbet hin lêkolîn û xebatên cihê cihê yên ku mijarên di vê xebatê de dihewînin hene. Lê bi giştî armanc û bergeha van xebatan ne yek in û her xebatek di cîyê xwe de dewlemendîyek pêk tîne. Em hêvîdar in ev xebata me jî di warê xwe de bibe gavek ber bi pêşveçûnê ve û hê gelek xebatên zengîntir jî di vî warî de bên kirin.

KURTEJİYAN

Agahîyên Kesane:

Nav û Paşnav : Mulazım Özcan
Rajerî : K.T.(T. C.)
Cihê Jidayîkbûnê-Mêjû : Bitlis-01.02.1966
Telefon : 0532 409 88 57
E-mail : mirazroni@hotmail.com

Perwerdehî Zanîngeha Eskîşehir ya Anadoluyê, Beşa Aborîyê./Zanîngeha
Uppsala/Swêd, Beşa Perwerdehiya Mamostetîya Kurdî

Derece **Beşa Perwerdehîyê** **Mezûbûn**

Lîsans Beşa Aborîyê 1989
Mamostetîya Kurdî 2000

Tecrubdyên Kar:

Sal	Cih	Peywîr
1992-1993	Bitlis-Göroymak-Yazıkonak	Mamostetî
1993-1994	Bitlis-Göroymak-yazıkonak	Jimaryarî
1996-1998	Mersin	Jimaryarî
1998-2006	Stenbol-Enstîtuya Kurdî	Rêveberî-Mamostetî
2006-2017	Stenbol	Jimaryarî

Zimanê Biyanî

Pirtûkêk Ku Hatine Çapkirin:

- 1-Dîwan, *Di Sîya Dara Xaçê de Serhildan*, (1999), Stenbol, Pêrî Yay.
- 2- *Kolay Kürtçe Konuşma Klavuzu*, (2002). Stenbol, Gün Yay.
- 3- *Keça Ardil* (Ji Tirkî Werger) M. Yay.
- 4- *Tesawira Xaniyê Filozof* (Ji Tirkî Werger) Weş. Enstîtuya Kurdî

Hobî

Edebîyata Kurdî

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol. Weş. Nûbihar.
- Akkaya, A. H. (2013). Kürt Hareketlerînîn Örgütlenme Süreci Olarak 1970'ler. *Toplum ve Bilim*, (127).
- Aksan, D. (2007). *Her Yönüyle Dil*, (4). Ankara, Türk Dil Kurumu Yay.
- Anter M. (1991). *Hatiratim*, Stockholm, Weş. Welat.
- Anter, M. (1991). *Hatiratim*, Stockholm, Weş. Welat,
- Arî, A. (2007). *Bakûrê Helbestê (Antolojîya Helbesta Bakûr*, Duhok, Weş. Êkîtîya Nivîskarên Kurd-Duhok,
- Barnas, R. (1979). *Li Bandeva Spêde*, İzmir, Weş. Tîrêj.
- Çamlıbel, Y. (2005). *Kürt-Kav*, İstanbul, Deng Yay.
- Çelebi, Nazan N. (2009). *Cumhuriyetten Günümüze Kürt Müziği -2 Genel Bakış*, <http://www.bgst.org/kurtce-muzik>, Ragihan.10.11.2017).
- Çevik S. (2010, 19-21 Sibat). <http://www.ilkehaber.com/haber/suleyman-cevikle-soylesi>. Ragihan. 10.09. 2017
- Daş, H. (2017, 25 Cotmeh). Taksîm, İstanbul.
- Epözdemir, B. (2017, 10 Cotmeh) Taksîm, Stenbol.
- Hassanpour, A. (2005). *Kurdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, İstanbul, Avesta, Yay.
- Hawar*, (1998). Stockholm, Weş. Nûdem.
- Izady M. R. (2004). *Bir El Kitabı Kürtler*, İstanbul, Doz Yay.
- Jîn*, (1988). Uppsala (Amadekar: M. Emin Bozarslan), Weş. Deng, (15-16).
- Kaya, F. (2010), *Kürt Basını*, İstanbul, Weş. Hîvda.
- Kurtedîroka Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, (2002). Stenbol, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Makximilian, B. (1923). *VI. Die Heiligen Bücher Der Jeziden Oder Teufelsanbeter* Wien, K.U.K., Und Universtats-Buchandler.

Malmîsanij û Lewendî M. (1992). *Li Kurdistanê Bakur û Li Tirkîyê Rojnamegerîya Kurdî*, Ankara, Öz-Ge Yay.

Malmîsanij, M. (2006). *Türkiye ve Suriye’de Kürtçe Kitap Yayıncılığının Dünü ve Bugünü*, İstanbul, Weş. Vate.

Minorsky V., Bois Th., Mac Kenzie D. N. (1996). *Kurd ve Kurdistan*, İstanbul, Doz Yay.

Muzîka Serayê Ya Kurdî, (2007). İstanbul, Weş. Kom Muzîk.

Nûbihar, (1992) Stenbol, Arşiva Weqfa İsmail Beşikçi [AWÎB].

Pariltı A. û Galîp Ö. (2010). *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*, İstanbul, Sel Yay.

Pîne, (1999). Stenbol, [AWÎB]

Rewşen, (1992). Stenbol, [AWÎB].

Roja Nû, (1942-1946). Beyrût, [AWÎB].

Roja Welat, (1977), Stenbol, [AWÎB]

Rojê Kurd 1913, (2013). Stenbol Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Ronahî, (1942-1945). Şam, [AWÎB].

Ronahî, 1942-1945, Şam (AWÎB).

Ronî M. (2004). Di Heyama Nû de Çîroknûsîya Kurdî, *Yekemîn Rojên Edebîyatê Li Diyarbekirê*, Weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol,

Sağniç, F. H. (2002), *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol, Weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol.

Sasuni, G. (1992). *Kürt Ulusal Hareketleri, ve . YY’dan Günümüze Ermenî Kürt İlişkileri*, İstanbul, Med. Yay.

Serfiraz, M. (2015). *Kurd, Kitêb Çapxane*, Stenbol, Weş. Peywend,.

Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmancî*, Stenbol, Weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.

Tekoğlu K. (2017). *Şûr û Qelem*, Stenbol, (Belgefilma Avakirina Navenda Çanda Mezopotamya).

Temel, C. (2015). *1984’ten Önceki 25 Yılda Kürtlerin Silahsız Mücadelesi*, İstanbul, İsmail Beşikçi Vakfı, Yay.

Temo, S.(2007). *Kürt Şiiri Antolojisi*, İstanbul, Agora Kitaplığı Yay.

Tîrêj, (1979), İzmir, (1). [AWİB]

Uçar D. (2017, 15 Êlûn), Taksîm, İstanbul.

Uzun, M. (2003). *Antolojiya Edebîyata Kurdî*, Stenbol, Weş. Aram.

www.psk-reyaazadi.org. Ragihan. 10.10. 2017

Xanî, E.(1995). *Mem û Zîn*, Uppsala, Weş. Deng,

Yaş, Z. (2015). *Şakarên Muzîka Kurdî*, Dîyarbekir, Weş. Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê.

Zêdo Ç. û Yavuz A. (2016). *Kürt Tiyatro Tarih*, İstanbul, Evrensel Basın Yay.

Zend, (1994) StenbolStenbol, (1). [Arşîva Zana Farqînî].

**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**DI SALÊN 1980-2000AN DE LI TIRKÎYEEYÊ REWŞA ZIMAN Û
EDEBÎYATA KURDÎ Û TÊKILÎYA WAN LI GEL TEVGERÊN
CIVAKÎ YÊN KURDAN**

TEZA LÎSANSÂ BILIND

Mulazim ÖZCAN

14950001058

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Kemal EROL

WAN-2018